

ÇARÇIRA

Kovara Çandeyî ya Giştî

Hejmar:3

Tebax 1986



A. Mirzoyiv / 1969

Xwendevanên delal,

Daxewa ev hejmara Çarçira bi derengî derdikeve. Lê herwekî ku me hejmara pêşîn de jî gotibû ïsal ewê şes hejmarên Çarçira derkevin.

Em dîsa bi dilgermî sipasî wan organîzasyon û kesan dîkin ku ji me re name şandine û piştgiriya xwe dana xuya kirin.

Em li hêviya berhemên we yên hunerî û zanistî ne.

Digel silavên me...

ÇARÇIRA

ÇARÇIRA

Tebax 1986

Xwedî: PROJA KURDÎ, Risingeplan 3,
163 62 SPANGA

Bîha: 15 kron e-Ji bo derveyî Swêdê 6 DM.

Abone: 80 kron e-32 DM.

Bankgiro: 468-1656

Berpîrsîyar: Ferda TURAN

Redaksîyon: Cemşîd HEYDERÎ, Kemal ELÎ, Malmîsanij

Raxlistin: Vezrîn

Çap: Inter Offsettryckeri AB, Stockholm.

Kurmanciya Bakur

Xerîta Mehmûdê Qaşgarî û Welatê Kurdan.....	1
Jî Hêla Haymana'yê Çend Sîtranê Şêxbizîniyan.....	3
Gergerînok an Siwarê bi Tenê.....	5
Ebdulrehman Begî Sahibqeran (Salim).....	9
Rojnamegeriya Kurdi -II.....	11
Du Hunermendêñ Kurd ji Gurcistanê.....	25

Kurmanciya Başûr

Pêwendî Nêwan Kurd û Rûsiya le Seretay Sedey Bîstem da...	52
Çîrokî Jimare.....	43
Mehemed Elî Kurdi w Çîrokî "Diway Serxoşî Şêtî ye".....	41
Baxçey Şâiran.....	39
Barî Jîyan û Kultûri Kurdi Gurcistanî Sovêt.....	37
Hengawêkî Praktîkane Berew Zimanî Yekgirtî.....	32
Kurte Mejûyekî Kurdnasî le Elmaniya da.....	28

ÇARÇIRA

Kulturtidskrift pa kurdiska

Årgang 1

Nr 3 Augusti 1986

Utgivare: Kurdiska projektet, Risingeplan 3

163 62 SPÄNGA

Ansvarig Utgivare: Ferda TURAN

Redaktion: Cemşîd HEYDERÎ, Kemal ELÎ, Malmîsanij

XERÎTA MEHMÛDÊ QAŞGARÎ

Ü

WELATÊ KURDAN

Bi qasî ku em dizanin kelîma **Kurdistan**'ê ku navê welatê Kurdan e, ji sedsala 12'an vir de tê bikar anîn.

Yek ji nivîskarên herî kevn ku behsa Kurdistan'ê dike **Mustewfî** ye. Ew dinîvise ku: "Li dewra nîveka sedsala şesan ya Hîcrî de **Sultan Sencerê Selçuqî** (1096-1157) mintqa **Cîbal** ji **Kirmaşan(Kermanşah)**'ê vegetand û navê wê danî **Kurdistan**"'. Sultan Sencer, biraziyê xwe **Suleyman Şah Ayba** (**Ayva**) jî kiribû waliyê Kurdistan'ê. Suleyman Şah piştî ku bû waliyê Kurdistan'ê, bajarê **Bihar** ji xwe re kir payîtext (**Bihar**: Li rojava-bakurê Hemedan'ê bû).

Li gor Mustewfî, sînorê Kurdistan'ê digihîşî **Îraqa Ereb**, **Îraqa Ecem**, Azerbeycan û Diyarbekir². Bêguman navê Kurdan bi xwe di belgeyên hîn kevintir de jî heye. Lê welatê wan, di wê demê de bi hinek navên din dihat naskirin. Di vî warî de gelek belgeyên nivîskî yên Erebî û Farisî di dest de hene. Heyanî sedsala sêzdan gelek nivîskar û şâîrên Ereb û Faris an jî yên ku bi van zimanî nivîsîne, gelek caran qala Kurdan kirine. Mesela wekî **Rûdeki** (857-940), **Fîrdewsî** (949-1020) û **Nîzamî Gencewî** (1141-1209) şâîrên navdarên ku bi Farisî nivîsîne di şîrên xwe de qala Kurdan kirine. Herweha tarîxni-vîsîn wekî **Îstexrî** (951), **Mesûdî** (943), **Îbnî Mîskeweyh** (1030), **Yaqût** (1179-1229) û **Îbnî Esîr** (1160-1234) jî di kitêbên xwe de li ser Kurdan gelek tişt nivîsîne.

Ji nivîsên wê demê tê fêmkirin ku di navbera sedsalên 9'an û 13'an de Kurd, di nava **Fars**, **Ezerbeycan**, **Ermenistan**, **Cîbal** û **Zewzan**'ê de li cihekî pir fireh dijiyan. Dîsa, mesela ji nivîsên **Îstexrî** (di sedsala 10'an de jiyaye) tê fêmkirin ku li **Secestan**, **Esedabad**, **Şîraz**, **Kerman**, **Xûzistan** û **Meras**'ê Kurd hebûn³.

Berî bikaranîna kelîma **Kurdistan**'ê gelek nivîskarên Ereb (an jî yên ku bi Erebî nivîsîne) ji "el-Zewzan" (Zozan)'ê wek welatê Kurdan behs dikin. Li gor **Muqeddesî**, **Zewzan**: bajareke Cezîre ya Îbnî 'Umer bû. Lê li gor **Îbnî Esîr** -ku ew bi xwe ji Cizîra Botan e- **Zewzan**: du roj ji Mûsil'ê dûr bû sînorê wê digîhîş heta nêzîkê **Xilat** û **Selmas**⁴'ê.


Çavkaniyêن Îslâmî, pirî caran gava ku behsa dewra berî Selçûqiyan dikin, di çarçewa **Xilat**, **Ermenistan**, **Azerbeycan**, **Cîbal**, **Fars** û **Zewzan**'ê de qala Kurdan dikin. Mesela, **Îstexrî** navê 33 (sî û sê) 'esîrên Kurdan dide ku li mintqa Fars'ê dijiyan⁵.

Li vir emê bi dûr û dirêjahî li ser vê behsê nesekinin. Têne em'dixwazin bala xwendevanan bikşînin ser xerîteyeke kevn ku tê de navê welatê Kurdan jî heye. Ev xerîte ji alî zanayekî Tirk, **Mehmûdê Qeşgarî** (**Kaşgarlı Mahmut**), di 1074'an de hatiye çêkirin.

Mehmûdê Qesgarî, yek ji zanayên Tirkan ê navdar e ku di sedsala 11'an de jiyaye. Ew, nivîskarê **Diwanû Luxatî-t-Turk** (Divanü Lûgat-it-Türk) e. Ev kitêba wî, wek yekemîn ferhenga zimanê Tirki tê qebûlkirin⁶. Diwanû Luxatî-t-Turk, di 1072-1074'an de li Bexdad'ê, bi Erebî hatiye nivîsin. Xerîta ku me li jor behsa wê kir jî di vê kitêbê de ye⁷.

Di vê xerîte de ji bo welatê Kurdan, bi Erebî “**Erdu'l-Ekrad**” ('Erdê Kurdish, Welatê Kurdish) hatiye nivîsin. Wekî ku xwendevan jî dibîne ev der, di navbera **Azerbaycan**, **Erdu'l-Şam**, **Hudûdû Misir**, **Erdu'l-Hîcaz**, **Erdu'l-İraqeyn** û **Erdu'l-Xorasan** de cî digre.

Vê xerîte herçiqas wekî yek ji kevtirîn xerîteyên cîhanê bala zanayan kişandibe ji⁸ wusa xuya ye ku zêde bala kurdologan nekişandiye.



1) binêre: Pêşgotina Yehya Xeşab, Serefnamey Şerefşanê Bidîşî, wergerranî: Hejar, Necef, 1972, rûpel: sed û nozdeh.

2) Maynard, C. Barbier de; Dictionnaire Geographique, Historique et Littéraire de la Perse, et des contrées adjacents, extrait du Mo'djem al-Bouldan de Yaqout et complété à l'aide de document arabes et persans pour la plupart inédits, Leyde, Paris, L'imprimerie Impériale, 1861, r: 480

3) Serefnamey Şerefşanê Bidîşî, r: 119-121

4) Minorski, V.; Encyclopédie de l' Islam, Tome: II, Paris, 1927, r: 1203

5) Ebî İshaq İbrahimî bîn Muhemmed el-Farisî **el-İstekrî** (el me'rûf bî'l-Kerxî), El Mesâlik we'l-Memâlik, Qahîre, 1961, r: 72

6) Binyazar, Adnan; Türk Dilinde 25 Ünlü Eser, Varlık Yayınları, İstanbul, 1982, r: 14

7) Kaşgarlı Mahmud (Mahmud al-Kaşgarî), Divanü Lûgat-it-Türk Tercümesi, çeviren: Besim Atalay, cilt: II, Ankara, 1940, r: 1

8) binêre: Chaliand, Gérard û Rageau, Jean-Pierre; Atlas de la découverte du monde, Fayard, 1983, r: 62

Ji hêla Haymana'yê

ÇEND SITRANÊN ŞÊXBIZINIYAN

Wek tê zanîn li Anadoliya Navîn, li der-dorê Konya, Ankara, Kırşehir, Çorum û Çankırı'yê gelek Kurd hene. Li ser ziman, folklor û jiyana civakî ya Kurdên van derana ci heyf ku heta nuka tu xebateke berbiçav nehatiye kirin.

Kurdên van hereman di demêن cihê-cihê de ji Kurdistan'ê barkirine û hatine, li van derana bicîh bûne, an jî hinek ji wan ji alî karbidestê Osmanî û Tirkan ve bi darê zorê li van derana hatine bicîhkirin. Qismek ji wan Kurdan ji 'eşîrên Şêxbiziniyan e. Şêxbizinî iro li Kurdistanâ Tirkîyê û Kurdistanâ İraqê jî hene. Welê xuya ye ku devoka Şêxbizinî nêzîkî zaravê Soranî ye.

Bêguman li ser ziman, folklor û jiyana civakiya Kurdên van derana divê lêkolînê bi her awayî û firehtir bêne kirin. Bi qasî ku em pê dizanin heta nuka sitranêن Şêxbiziniyan nehatiye nivîsandin.

Em li vê derê herçiqasî kêm be jî gaveke piçûk diavêjin û cîh didin çend sitranêن ku me ji devoka Şêxbiziniyan berhev kirive. Melodiyeke taybetî ya van sitrana heye. Her çar sitran li hêla Haymana(qeza Ankara)'yê, ji gundê Gozgozê ji devê 'Umer (36 salî) hatine girtin.

Her sê sitranêن pêşîn, sitranêن dilan in, ya çaran jî sitrana kar e ku di wexta paliyê de tê gotin.

Li gel 'eslê sitranan me Kurmanciya wan jî nivîsî da ku baştir bêñ fêmkirin. Heta ku ji des-tê me hat di wergera wê ya Kurmancî de em ji 'eslê sitranan bi dûr neketin da ku me'na wan neyê guhertin. Li dawiyê jî me ferhengokek (devoka Şêxbizinî-Kurmancî) çêkir.

Kurmanciya wê:

I

*Hewaman gî şemşitarî
Yam girtige qe névarî
Cay têli je pîrçit wêm de
Wella nédmê hezari.*

II

*Cay le riya ci duz diçû
Payîz wer di payîz diçû
O sinige w o memike
Axînim le duyay diçû.*

I

*Hewa giş tev de tarî
Eyam girtiye qe nabare
Ca têlekê ji porê xwe bi min de
Welleh nadime hezari.*

II

*Ca li riya ci düz diçû
Payîz di ser payîzê re diçû
Ew sîng û ew memika
Axîna min li dû wê diçû.*

Dêrin boro dwêtê hînî
Qerteli le canit xwînî
O rindiyê w o pêkiyê
Ra mérdi neçar diminî.

Dwête rindê, dwête rindê
Destit je kuno we min dê
Qay min desti tu nêxwerim
Wê banî birînê min dê.

Ko diçiyay, ko diçiyay?
Wê motiro xericiyay
Ke je şermi que newu
Serim elgirim wiçim le duay

III

Azî azî Necatîn azî
Disa dilim qisay Pakê dixwezi
Wizanistam dil giran e
Qe werdit nedikirdim henek û vazî.

Kepîri Caniman de newale
Dengi Pakê dê diyay nale-nale
Herke dengê diyaye wêm
Şas dikerem riyê male.

IV

Pale duze w pale giro
Xwera tawistanê nawçê nîmerû w diyer
le nazlî yar kir zûro,
Ke je şermi que newu
da wiçim kirase ray wikim
we parçey qereçadiro

Dilo dilo dil yemano
De bira awirdan le destê min dan
kelepçeykê zeftiyano,
De bira le pa min dan sindirikî
je hespano,
De bira min wikirdan de axirê
pes û galو,
De bira le verê min wivistan
we quwê şîwan û gawano,
De lê lê lê
Ew ji sew xatirê du dilano.

Êdî were keçê
Qertel li canê te bixwîne
Ew rindi û ew pakiya
Ji mérê neçar ra dimîne.

Keçê rindê, keçê rindê
Destê xwe ji pencerê bi min de
Qey ez destê te naxwim
Bi ser birîna min de.
Kuda diçûy, kuda diçûy?
Bi motorê (tu) xuricî (borî)
Ku ji şerma qûla nebe
Serê xwe hilgirim biçim li dû wê.

III

Azî azî Necatîn azî
Disa dilê min xeberdana Pakê dixwaze
Min bizaniba dil giran e,
Min qet bi te ra nedikir henek û bazî.

Kepirê Caniman di newalê de
Dengê Pakê tê ji hundur de nale-nal e
Herke dengê wê tê min,
Şas dikim riya malê

IV

Pala düz û pala giro
Tava havînê ya nava nîvro û 'esir
li nazlî yarê kiriye zoro,
Ku ji şerma qûla nebe
Dê biçim kirase xwe jê re bikim
bi parçê qereçadiro.

Dilo dilo dil yemano
De bira bianiyana li destê min dana
kelepçeyeke zefkiri,
De bira li piyê min dana qeyda
ji hespano
De bira min bikirana di axirê
pez û gano (dewarano)
De bira li min bixistana
bi çuyê (çoyé) şivan û gavanano
De lê lê lê
Ew ji seba xatirê du dilano

dûmahîk:
rûpela 24 an de.

Gergerînok an Siwarê bi tenê

III

Bavê Nazê

..Rojekê ez pêrgî kesekî, ku ji ser rê çûbû, hatim. Hînga, paşî min gotinên wî nivîsan-din. Çaxa pêrgîhatina me ji hev re, ez ketibûm minetefê yekemîn di jiyana xwe de. Vêga min hîn nigêن xwe di gelek xefkan de nedîtibû. Min û wî merovî di tirênekê de me hev dît. Tirêna me li ser şiva hesen, a çûnê û hatinê diçû (Şiva hesen a çûn û hatinê, mana xwe şî-vek tenê ye û dema tirênek tê ya din li rawistinokê bendî wê disekine da ku rê li ber vebe.) Wek niha xwes tê bîra min, ku tirêna me li ciyekî ma sekînî û sekna xwe pir dirêjkir. Ji gotinên me, em gihiştin mucadelak germ. Pirsa guhertina serokan ji jêr ve, em sor kirin. Di vir de, ji nişkave wî kesî ji min re got: "De ka wiha bik, ku tirêna me bi rê keve. Rêwiya bera şifîr de, ji bo ku em di wextê de bîghêن malêن xwe... Ma gelo emê karibin wiha bikin? Na û sed carî na... Emê nikaribin, jê re bêjin siya te xware. Erê birako wê tirêna di ciyê xwe de bimîne, heger tu bi hewar kî, heger tu xwe di pencerê re bavêjî, her ewê bi ya xwe bike... Di vir de wê xwe xapandin destpêbike; Yek wê bêje: "Tirêna me bendî tirêna ku tê sekini-ye." Yekî din wê bêje: "Tirêna me xerabûye." Yê sisiya jî wê her gotinên valan bêje. Lê ya rastî, wê ew be ku şifîrê me xwest hinerê xwe pêş me ke, da ku tu meznaya wî ya ku di rasti-yê de tuneye, bibînî. Erê birako çiqasî em nerazî bin û çiqasî em rastiyê dizanin, tevî wiha ji neçarî em li ser teriya xwe rudinên û xwe dispêrin Xwedê teala..."

Tê bîra min, di vir de birader di pencera tirêne re li dur temaşe kir, keserek dirêj berda, paşî rawistinek nedirêj gotina xwe domand: "Wilo jî em di jiyana xwe de ji neçarî serê xwe datînin û devê xwe digrin, da ku yên din razî bikin. Em xwe li ber wan xuz dikin, ne ku ew xercê vî tiştî ne... Na ew ne xercin û ji bo têrkirina hurêن xwe em şelafiyê û çavpaniyê dikin..."

Hînga ez dijî nerînên wî kesî bûm. Lê niha, heger ez bi tirênekê mîna ya berê di çûnak xwe de herim, di axavtina xwe de bi rêwiyeke xir wek min û demakê, ezê bi peyvîn wî kesî bipeyivim û ezê şûna wî bê erê û na bigrim.

..Gelî kesên paye, qure û miriyêن zikê xwe bibihîzin hîn ezê ci ji we re bêjim. Ev gotinên han li ser "hozanêن" me tim û tim min didexdixînin, xwirê bi laşê min dixînin, xwînê li min ditewirînin, me ezê çilo karibim bi xwe re hilînim heyâ gorê û naxasim min nêzîkayî

li çûna nehatinê kiriye?! Helbet peyva min wê bi nebaşî li ser wan be. De werin em binerin min di minetefê yekemîn de ci nivîsandibû: “İntilîgentên cîhanê bi rolek mezin di dîrok û çarenosên gelên xwe de rabûn û diradibin... Herçî intilîgentê me her kerpiçê xwe datîne ser avaya cîranê xwe û zarokên xwe li erda rast li ber rehma Xwedê dihêle. Dema sira bê radibe ew berî hemya gepa xwe davêje nav xwarinê û behra wîji ya hemya bi tewaştire. Lêbelê gava sira bê dişke ji iyarê piling dikev iyarê pisikê û koletiyê ji bo zikê xwe heya ji şeytên re jî dike.

Dibêjin: “Heger tu insanekî ji hemû tiştên wî rut bikî, tu bi destê xwe wî aza dikî, lewra muhtaciya wî bi kesî namîne...” Lê ku tu intilîgentê me bê tişt bihêlî, ewî hîn bêtir serê xwe deyne û wê xwe bimelisine. Loma jî wê heqê me hebe em jêre bêjin: “zanawo” bi ku de tu dixwazî here, here ci bi aliyê rast û ci bi aliyê cep, lêbelê heqê te di yekê de tuneye; meşa li ser xweliya me. Erê li gora dilê xwe bimeşe, tu dixwazî bi payetî û tu dixwazî bi serbilindî. Na bi serbilindî tu nikarî, çîmkî ev ne ji mikufê te ye, û riya hustexwariyê te ji xwe re girtiye. Helbet tu karî biçî, û zikê xwe biçerînî lê hîc tu nikarî bi mîranî li çavan binêrî...

Erê “hozanê” kurd bimeşe, teví ku tu ji meşa xwe, ji siya xwe, ji wişwişa piş derî û ji xişxişa di nav daristanê de, ditirsî û direelî. Madam tu wiha yî derbasî qula xwe bibe û beretan ji xwe re bikişîşn yê. Di cala xwe de deng ji xwe neyn, deng nebe xwe, xwe bi lal û kerayê deyne, ji bo ku tu bankirina ji serê çiyan tê nebihîzî. Ma tê çilo karibî wan bibihîze, madam ew di ferhenga peyvîn te de nemane?!

Ezê hîn peyvîn xwe bidomînim û we pê bidim nasîn. Helbet wê li cem min wek hev be; heger hun bi van gotinan bêşin an jî kêfxwes bibin. Lêbelê divê ez bi bîra we bînim, ku li pey peyvîn hingivî û şoreşgirî bercewendiyên şexsî û genî hene. Leyse, ev baweriya mine û ez we pê girênadim.

Bi xwe, di heyamê minetefa yekemîn de min nerînên xwe li ser hevok û ramanên hêja dinivîsand. Bêguman di riya wan de jî hunê karibin hinek nehînên min nasbikin. De bixwînin: “Min hej çûkan dikir, lewra di firandinê xwe de ew azane. Ew difirin bê ku guh bidin sinc, ben û sînoran.”

Pirsa jiyanê û mirinê, tim û tim ez bê xew dikirim. Loma jî pirê caran min dixwest ez ji vê pirsê birevim, xwe bidim alîkî, lê neçariya min ji ber tinebû û neha jî tuneye.

Di zaroktiya xwe de min xweziya xwe, ku ez kurekî malbata dolmend bim tanî. Paşî di demêr asêngehiyê de min digot: “Xwezî diya min ez neanîbama ser rûyê erdê.” Di qunaxa guhertina yekemîn de min hemda xwe anî, lewra ez ji malek hejar bûm. Di qunaxa tevlihevbûnê de û kirîza giyanî de, ya ku heya neha bi min re domdike, ez bi nehînên jiyanê mijul dibûm û min dipirsî: “Çima ez di vê serdemê de hatim dinê?” Bi vê pirsê min xweziya xwe tanî, ku piştî sadsalî bi şûnde ez bihatima dinê. Lê roja îro, di nerîna we de, ci min diêşîne? Windabûn...? Nebedîbûn...? Erê barkirina ji vê dinê min diêşîne... Û tîrêjîn êşê dighêñ mejiyê hestiyêñ min, lewra ez pê dizanim ku wê tirba min hêdî-hêdî bi erdê re rast bibe. Bi xwe ez ne wek we me. Hesabê gorê bi bîra min nayê. Tenê mana navê min û winda bûna wî, kuştina min ducar dike. Di vê rewşa ha de, ez gihiştîm heqîqetek din, bawiriyeq din; wê ne dur be sebeba xebata merov ewe, ku navê wî li dînyê bimîne. Lê ev tiştê ha min haj û razî nake. Ne dure hun bipirsin: “Madam ev baweriyêñ tene, çima bi lez tu berê xwe didî goristanê?”

Min bi xwe bersîv li ser vê pirsê da bû. Neha jî ezê dubare bikim; ez naxwazim tiştê mayî ji jiyanâ xwe bicûm. Ecêmâyê nemînin, bi rastî du rengê jiyanê hene; yek cûtine, yek jî jiyan bi xwe ye. Bi riya vê serpêhatiyê ez dixwazim herdu rengê jiyanê bi we bidim nasîn:

Dibêjin carekê mîvanê Silêmanê Hekîm hatin. (Ev pêxember dihat nasîn, ku ji zima-nê heywan, teyr û tilûran famdikir) Wî xwest ji mîvanê xwe re berxekî serjêke. Gava wî kîr danî ser qirikê, berxik xwe avêtiyê û jê re got: “Min hîn tu xêr ji xwe nedîtiye û ji demê salê tenê min demek naskirîye. Min berde ji bo ku ez bi emrê xwe şâ bibim.”

Silêmanê Hekîm ew berda û got:

“Here bi temenê xwe şâ bibe!”

Paşî, ku sal zivirî berxik bi xwe hate ba Silêmanê Hekîm û jê xwest, ku wî serjêke. Dema Silêmanê Hekîm jê pirsî; çîma ew naxwaze jiyana xwe berdewam bike, berxik wiha lê ve-gerand:

“Ezbenî, min sal bi her çar demê wê dîtin. Min naskir, ku dem wê li ser demê bê. Bi xwe ez naxwazim jiyana xwe bicûm...”

Dîna xwe bidênenê, tevî ku berxik heywanek ji celebênu ku kayjîna xwe dikin, naxwaze ji-yana xwe mîna benîşt bicû. Lî hun jiyana xwe dicûn... Erê hun bê şerm û fedî qanikê xwe di devê xwe de dibin û tînin!!

Ezê hîn bêtir xwe bi we bidim nasîn... Di dema xwendina xwe de, min pir hez felsefê di-kir. Ew şêrîntir ders li ber dilê min bû. Lîbelê rokê ji rojan ez têde bi serneketim. Heger şagirtî di “mada” ku hej jê dike û pê bi sernekeve, gelo heqê wî heye xwendina xwe dom bike?

Wilo jî di babetê jiyanê de; gelo heqê insan heye li ser rûyê erdê bimîne, piştî ku bi ser seradê dikeve û tê avêtin? Ma ew bendî çi dimîne, madam di pêşde wê nikaribe heya rolek biçûk li ser tiyatroya jiyanê bilîze? Erê ez naxwazim rolek biçûk di tiyatroya ya jiyanê de bilî-zim, tevî ku tiyatroya bê rolên biçûk nayên lîstin. Wilo jî dibêjin, heger ne li ser pişa reben û belengazan ba, wê kesê navdar ciyê xwe bi navdariyê negirta. Bi xwe ez naxwazim ne bi-çûk bim û ne mezinê bi nav mezin bim. Loma jî ezê xwe bi xwe bikujim...

Tiştêkî din. Li gora min ji devê melan bihistiye, divê merov di rewşa xwe de her li kesê di bin xwe re binere. Heger ew binere, ewê her û her merovekî ji xwe feqîrtir bibîne. Loma divê dilê wî bi halê wî neşewite. Lî mele çiqasî waza bike, her mirîdên wî, wê li kesê dol-mentir ji xwe dinerin û bi herhawayî dixwazin bîghêne meqamê wî. Helbet divê du xwesti-nîn ne wek hev em nekin yek. Lî çawa be divê merov her bi jor keve, her bilind bifire. Loma jî dibêjin; “xwelî li serê wî leşkerî be, yê ku naxwaze bibe ceneral!” Ez jî dibêjim: “Sed xwelî li serê wî ceneralî be, yê ku dibe lesker!!”

Gelî kesêni miriyêni zik û binzikan, evin pirsêni ku di herdu qorzîbiran de tebat nedidan min. A rast ewe ku ev hinek ji wanin û min ew ji xelkê venedîşart. Min di guhêni wan de dikir pist-pist, min ban wan dikir û dawîni min dikir barbar û qîrqîr, lî her ew di xe-wa xwe de diman û guh nedidan peyvîn min. Li gel wiha jî wan di nav xwe de ez bi dînîti didam nasîn. Ev tebê xelkêni me ne, heger yek li gora dilê wan neke, hezar tinasî û navan bi du vedikin...

“Ma fêda barîn û qarînê, di şevek tarî û bahoz de heye??” Behlûl hikmeta xwe ducar kir.

Û serpêhatiya ji kitêbekê: “Heger merov dizyê bike, hoyê wê tê nasîn û tê beraetkirin. Lî ku hat merov merovekî bikuje, sedem tê naskirin, lîbelê nayê beraetkirin. Lî ku merov çikusyê bike, hîc ne tê famkirin û ne te tebrietkirin...”

Û ji pirtukek din giranbihayek din: “Sê nivşen koletiyê hene:

-Nifşek ji kolan nizane, ku kole ye û hawildan nake, ku xwe aza bike.

-Nifşek jî zane, ku ew kole ye û xebatê dike ji bo ku razgar bibe. Ev nişf çetirîn nifşe.

-Nifşê sisya jî ew zane ku kole ye, lî bi koletiya xwe ew raziye. Ev jî pîstirîn rengê kolatyê ye.

Hînga bê ku ez zanibim çima, min li bin van rêzan ev gotinê han nivîsandibû: “Întilîgentêñ Kurd zanin ku ew kole ne, lê bi qeydêñ nigêñ xwe dilîzin mîna ku bi tizbiyêñ destêñ xwe bilîzin...”

“Heger merov belengaz be nayê lomandin, lê ku hustexwar be tê lanetkirin” -Dîsa Behlûl hikmeta xwe got.

“Heger hat û ji min bipirsin: (Wê çaxê min wiha di deftera xwe de nivîsandibû, lewra niha hun naghêñ vê pirsê ji min bikin) Kîjan serpêhatiya kurdî li ber dilê min şêrine? Ezê bêjim: “Şêr şere, ci jine, ci mère.” Loma jî ev serpêhatiya ha tim û tim li ser zimanê min bû. Dibe ku ew bûye benîstê devê we jî. Ne xeme. Lê ya xem ewe ku şêra kurd, tevî ku xurtire ji şêrê kurd- a rast ji roviyê kurd- ew hîn bindestê wî ye, dara şikestiye û şîrê dîlîtiyê û azadiyê dide çêlikêñ xwe bi hev re.

Bi xwe ez matmayî dimînin çima keça kurd di ruyê zilam de napijiqe û pêl her tişti nake ez fam nakim. Çilo di qaqlê xwe de, heya niha maye! Diyare, ku ew ji axa êşê û sebrê hatiye cebilandin, an jî tuxmê wê wihaye!!

“Merov kare bi insan be, dema bi êşa xeynî xwe bihise, mîna bi ya xwe dihise!” -Behlûl dîsa gepa xwe avêt nav xwarinê.

Geli miriyêñ berzikan!

Bîr û baweriyêñ min evin û dibe ku min serê we bi wan êşand, lê tevî wiha jî divê hun çend rûpelên dawî jî bixwînin. Erê bixwînin, ji bo ku hun rastiya xwekuştina min nasbikin.

Carna min ji xwe dipirsî; gelo wê ci di serê min de here gorê? Bê erê û na min digot: Ew pêşmergê ku bi mîrxasî li ber celadê xwe rawistya bû, tevî ku yê celad devê tivinga xwe xis-tibû defa sînga wî. Ev rawistina bi meznayî parastina mayina milet bi xwe ye. Heger ez honermendek bama, minê şakerek honermendî jê bigirta -Baweriya min dihat, ku ewê bi-ba eserek û wê ciyê xwe di methefîn cîhanê de bigirta- Heger ez helbestvanek bama, minê helbestek wiha li ser meznaya wî binivîsanda, ku ji devê zarokêñ me derneketa. Gelo min ci di vî pêşmergî de dît, an jî xwend? Li gel ku bersîv li ser vê pirsê dijware, ezê hawildan bikim: Rawistinek bi meznayî û payetî (erê ez zanim peyetî ji rûçikêñ neqence, lê belê pa-yetî li ber mirinê -mîrxasiye, payetiya li ber dijmin qenc û rinde.), nerînek bi çavêñ neşikestî (tevî ku çavêñ wî bi desmalekê girêdabûn...)... Bi kurtî şîn rûçikêñ qenc ji yên milet min têde dît. Ew xisletêñ ku di dîroka gelan de dibin masere, min têde dîtin.

“Zîlam nagrîn.. Zîlam nagrîn...” -Behlûl di sikakan de bandikir.

Hînga, çaxa ez xwedî bawerî bûm, min dixwest ev hîkmeta gelên Rojhilat, berî mirinê di xwe de bi cîbinim: “Gava zarok nuh ji diya xwe çê dibe, bi girî tê dinê û kesêñ li dora wî bi ken û xweşî lê temaşe dikan. Û gava insan dikeve ber mirinê, ew di nava xwe de digrî û kesêñ li dora wî hêşran dîbarînin. Tenê hinek kes hene, ku li ber mirinê dibişirin... Ma ji vê bişirandinê paqijtir û spehîtir heye?”

Geli zik tilêran, we naskir çima ez bi xwe, xwe dikujim? Niha we naskir ku jiyanâ we di devê we de pûç bûye? Ez naxwazim jiyanâ xwe di devê xwe de bikim benîst û ezê bidim ser riya çûn û nehatinê, bê guman wê bişirandinâ rûmetê li ser lêvîn min be...”

Siwaro deftera bîranînê, kesê şewitî girt û xwest bîne bîra xwe; dema ku agir pê diket, berî ku bi hama xwe bê xwar, ew dibişirî yan na. Soretê şewatê mîna rew-rewka li ber çavêñ wî çû û hat tenê diranên qîç di nav êgir de li ber çavêñ Siwaro ketin û wî nema zanîbû gelo lêvîn kesê şewitî ji ber şewatê yan jî bişirandinê li ser diranêñ wî rabûbûn. Hîn Siwaro wi-

Salim yekek ji wan her sê şairên kurd (Nalî û Mustefa Begê Kurdi) ku hatine naskirin bi damezirandina bingeha dibistana şîrên kurdi bi zaravê soranî

Ebdulrehman Begî Sahibqeran

(Salim)
1805-1869



Dema em li ser dîroka edeba kurdî dipeyivîn pirsek tê kirin: Kengî vî edebî destpêkiriye û kê hîmîn pêşî daniye. Û wiha jî bi ci tunî hatiye avakirin. Her wiha jî pirsa zarav û tîpênu ku pê hatiye nîvisandin tê ber çavan.

Helbet bersiva van pirsan ne wiha hîsan e û lêkolînên kur û dirêj jê re divê. Di vî warî de pir tiş hatîne nîvisandin, em karin wan bikin bingeh jî bo nîvisandina dîroka edeba kurdî. Di riya û xaçırêkên lêkolînên xwe de, mirovê tiwêjer (bahis) wê pêrgî sê şewan bibe, şêweyî goranî, kurmancî û soranî. Bi xwe şêweyî soranî ne ji kevin hatiye nîvisandin û belükirin. Mirov kare nasbike bingeha wê ji ku va hatiye û kengê destpêkiriye. Lewra pêwendiyêñ wê bi avakirina îmareta Baban hene, bi taybetî piştî guhestina paytextê îmaretê ji bajarê Qereçuran 1784 bi bajarê Sileymaniyê. Ji vê ra edeba kurdî bi zaravê soranî vekirina mektebxana şairê kurd Nalî destpêkir. Li gel Nalî du helbesvanêñ din jî rolêñ mezin di avakirin û pêşveçûna şîrê kurdî bi zaravê herêma Baban, bi taybetî li Sileymaniyê. Lîstêñ vana herdu şairêñ han bi avakirina îmaretê û herifandina wê girêdaye. Herdu şair jî evin: Ebdulrehman Beg Sahipqeran (Salim) û Mustefa Begê Kurdi. Ew bi xwe pismamê Salim e.

Ebdulrehman Beg sala 1805 a li bajarê Silêmaniye ji dayîka xwe bûye û her li vira jî li ber mela xwendina xwe xwendîye, lêbelê xwendina xwe nebir serî. Dibêjin hîn ji zarokiya xwe da meyla wî li ser edeb hebû û ev hezkirin jî ji xwedibûna malbata xwe wergirtibû, lewra di malbata wan de gelek helbestvan derketibûn. Ji helbesten wî diyar dibe, ku ew di xortaniya xwe da ketibû dasfîn evînê. Wek dibêjin şair dilketibû keçeka bi navê Behê û ev hizkirina han tesîrek mezin li ser kiribû. Ne dur e ev hizkirina ha hiştibû ku şairê me şuna xwe di helbesten evînê debihêle, û ew nimunek berze di warê vî rengî de. Şîrîn wî bi xwe bi pesin û wêne yên edebî pir zengîn e. Zimanê wî jî pir sipehî û sivik e.

Bêguman zanebûna şair bi zimanê mileten cîwar ci zimanê farisi û ci zimanen din ên Rojhilat, tesîra xwe lê kiribûn:

*Pencet lehena megre sorêki talx renge
xwêni dili min tale bo pencey şimşalit.*

Şairê me bi çavêñ xwe herifandina îmareta Baban dît. Loma jî vê bûyerê û vegirtina bajarê Silêmaniye ji aliyê Roman, şair dihejîne û nikarîbû bi sersarî li ser derbas be. Ji bo vê yekê bi dilxwinî şair

helbestên xwe dînîvîsîne û beşekî mezin ji dîwana wî digre. Sala 1850 paşî herifandina îmara Baban û vegirtina Sîlêmaniyê, Salim ji neçarî ji bajêr dertê û diçe Tehran. Muhacirî û derbûna ji welat, wî diêşînin û ev tişt xweş di şîfrêñ vê pêlê de diyar dike. Ew di helbestên xwe de rewşa kurdan a nexweş xwiya dike:

*Çi bilêm haletî dil çûne le hîcra
sehnî golzari Senendoc wekû zindanî mine.*

Di wê heyamê de şîrêñ “Texmîs” û “Xezel” bi nav deng bûn. Shaêrê mezin Nalî hostê van şîrêñ rengo rengo bû û pirê helbestvanêñ wê demê her teqlîda wî dikirin. Lê tevî ku dostaya Salim bi Nalî re tesîra xwe li berhemê Salim dikir, lê her û her ew li ser riya xwe diçû. Di vî warî de, li ser helbestvaniya Salim bi xwe Nalî namek şîrî jê re dînîvîsîne.

Di warê “texmîs” de Salim helbestên Mewlana Xalid û Nalî distend û bi hostaya xwe ji wan re kêmîtir bû. Di warê “xezel” de jî wî 12 de “xezelîn mulemma” nivîsandibû. (Xezelê mulemma ew e ku şair helbestên xwe yên evînî bi du zimanan dînîvîsîne, pêşî bi zimanê zikmakiyê û yê din bi zimanê dinê)

Nimuneya vî “xezelî” em herdu malkêñ ha berçav dikin:

*Dile xelwet serayî hezretî dost
“dide aynedarı tel’it ost”*

Wek hun dibînin malka pêşî bi kurdî ye û a din bi zimanê farisi ye. Bê guman ev tiştê ha hêzbûna şair û zanebûna wî ci bi zimanê zikmakî û ci bi zimanê biyanî xwiya dike.

Tevî ku rewşa welatê nexweş bû û bajarê wî Silêmaniyê di bin destê tirkan de bû, her Salim nema dikarî durî welat bimîne. Ew vedigere bajarê xwe û li vira sala 1869 dire heqîya xwe.

Niha emê çend nemûna ji helbestên wî pêşkesî we bikin. Hunê bi çavêñ xwe spehîbûna ziman û helbestên wî bibînin û wiha jî hunê di nav xêzan û xêzan de nasbikin hezkirina şairê me ji welat û milet û zimanê kurdî re:

*Lewisawa hakîmî Baba gişt derbeder kiran
neydiwa kes le çihreyî kes cewher huner ...*

*Ewsa mekanî aske bû kani askan
esta le deng û ne’rey romî pire la ker.
Şarêkî pir le zilm û mekanekî pir le şîn
cayêkî pir le şor û welatêkî pir keser ...*

*Sensenî siwarey nîzamî gêl “ulan”î tirk úşax
bigre bigrey kurd zeban ax axî tirkan ...*

*Sîwan pire le şexsî sitemdide xwar û jûru
her qîrî pir xemane le her la dekem nezer ...*

*Drixâ bo suwari xasî paytextî Sîlêmanî
le qîrge û qizler û qorx be rotî cumle gawan in ...*

*Legel dil şerte (Salim) ger necatim bê le Taran
behîst ger bête destî rey be Érana gozer nakem ...*

*Bi eqil em roja pêm zanî defewtê
ke Salim azîmî milkî ecem bû ...*

*Jê re sermaye ye bo Salim û kirmanî deba
şîeri kurdî ke bida cîlwe lelay sêxi kebir ...*

*Xane xwîyîm mîewan newaze werne seyri piyaweti
doşegi xwom xak û xol ser raxerî espim sema
yaxwûdenî*

*Emîn û bargîrî koyit herdu binwêñ beşkim be xew
min binîm roy xorak û ew bibînê royi ka
Axurî espim hewaye xwanî xurakim xeyal
herdu birsi maynewe wa çake ru bikeyne hewa.*

Ji bo nivîsa vê gotarê me ji van çavkaniyan bi kar anîye û şîr bi tenê ji dîwana Salim hatine wergirtin.

Dîwanî Salim, çapî 2, Hewlêr, 1972

Encumenî Edîban, Emîn Feyzî, çapî 2, 1983, Bexda (çapî 1, Îstenbol 1920) Kemal Mîrawdelfî, Govarî Peyv, hejmare 1, 1986
Dr. Maruf Xeznedar, le babet mîjûyî edebî kurdiyawa, Baxda, 1984 Elaeddîn Secadî, Mîjûyî Edebî Kurdfî, Bexda, 1971

ROJNAMEGERİYA KURDÎ

Lİ KURDİSTANA BAKUR Ü Lİ TİRKİYÊ

- II -

5

KURDISTAN

İstanbul, 1908-1909

Ev rojname, piştî ilana Meşrûtiyetê (1908), li Îstenbol'ê derket û di 13 yê nîsana 1909'an de hate girtin.

Derheqê vê rojnamê de, di hejmara pêşîn a rojnama Kurdistan (15 zulqa'de 1305/12 eylul 1917) a ku **Sureyya Bedirxan** bi naznavê (pseudonyme) **Azîzî Ehmed**, li Qahîre derxistibû de, agahdariyeke baş heye.

Di hejmara pêşîn a rojnama Kurdistan (15 zulqa'de 1335/12 eylul 1917) a ku li Qahîre derketibû de sernivîsarek bi navê “**Ê Me Dixwînin**” (Ên ku Me Dixwînin) heye. Di vê sernivîsarê de van agahdariyana hene²⁶.

Piştî ku Meşrûtiyet ilan dibe (1908), Bedirxanî ji hepsê derdikevin û dîsa ji bo “qencya welatê Kurmanca” dest bi xebatê dikin. Neviyê Mîr Bedirxan, **Sureyya Beg jî dest pê dike li Îstenbol'ê rojnama Kurdistanê derdixe**. Lê, piştî bûyera 31 ê adarê (13 nisan 1909), ku Mahmut Şevket Paşa dest danî ser desthelatdariya Osmaniyan, Cemiyeta Îttîhad û Tereqqî dest bi zulm û zordariyê kir. Digel gelek kesên din, **Sureyya Bedirxan jî bi kevnepereştiyê (îrtîca) îtham kirin, wî avêtin zîndana Bekir Ağa Bölüğü** ya bi nav û deng û rojnama Kurdistanê jî hate girtin. Wê demê Kurdan ji Cemiyeta Îttîhad û Tereqqî gelek xirabî dîtin.

* Di beşê 1.ê vê nivîsê de û di hejmara 2. a Çarçira' yê de çend şâsiyên çapî yên girîng hene. Wek vana:

rûpel	sutûn	rêz	şas	rast
10	1	28	1919	1913
20	1	17	diwemîn	3.

AMİD-İ SEVDA

(AMİDA REŞ)

İstanbul, 1909

Derheqê vê kovarê de zanîneke me ya têkûz tuneye, tenê me xwest ku em bala xwendevan bikşînin ser vê kovarê û xwediyê wê.

Kovara **Amid-i Sevda**, di 1909'an de li Îstenbol'ê, bi Tirkî derketiye. Herçî Amid-i Sevda di me'neya **Amîda Reş** de hatiye bikaranîn (**Amîd** yan jî **Amed**: navê kevn ê **Diyarbekir** e).

Ev kovar şes hejmar derketiye û em dizanin ku nivîsên **Ali Emîri'yê Diyarbekirî** (1857-1923) jî tê de hene²⁷.

Xwediyê vê kovarê, **Mehmet Şukri** yê Diyarbekirî ye. Li Îstenbol'ê, bi navê **Matbaa-i Amîdî** çapxaneyek wî hebû²⁸. **Kurd Neşr-i Maarif Cemiyeti Nizamnamesi** (Nîzamnama Komela Belavkirina Rewşenbîrî ya Kurdî) û **Divânçe-i Dehrî** ku naşîrê wê Ehmed Ramiz bû, di vê çapxanê de hatine çapkîrin.

no	tarîxa derketinê
5	16 nisan 1325/1909

YEKBÛN

İstanbul, 1913

Yekbûn, yek ji van kovaran e ku **Komela Hêvî**'yê derdixist²⁹. Ev kovar “bi **Kurdî** û **Tirkî** belav dibû, tenê çend hejmarêñ wê derketin. Ne dûr e ku ji ber destpêkirina **Şerê Cîhanê** yê **Pêşîn** hatibe sekinandîn”³⁰.

Dr. Kemal Mezher Ehmed, derheqê vê kovarê de weha dibêje:

“...Xwendevanêñ Kurd yên li Îstenbol'ê, Komela Hêvî'yê damezirandin û di sala 1913'an de dest bi belavkirina kovara Rojî Kurd kirin. **Her** di wê dewrê de kovareke din jî bi navê **Yekbûn** derket.”

“...Wextekê, berrêz **Rewşen Bedirxan**, jîna Celadet Bedirxan, ew gotarêñ bi Tirkî ku di kovara Yekbûn û Rojî Kurd de hatibûn belavkirin dan min. Piraniya wan gotaran ji alî bavê Rewşen Xanimê, **Salih Bedirxan** ve hatibûn nivîsîn”³¹.

Yekbûn “di hejmara 2. de bi vî hawî gîlî dike û dibêje: ‘**Herçiqas tu tiştekî** me ji gelên din nekêm-tir e jî hîna me nikaribûye desthelat û karîna **xwe** di jiyanê de nîşan bidin’ çimkî ‘bi carê de em nexwende û nezan in’”³².

Dîsa di hejmara 3. a Yekbûn'ê de weha hatiye gotin:

“**Bi kêmanî divê** ku ji %40 yan %50'yê **Kurdan fêrî** xwendin û nivîsandinê bibin” û ji bo bicîhanîna vê mebestê jî Yekbûn xîtabî xortan dike û vê yekê ji wan dixwaze: “**Destê xwe** ji **xweşıya** jiyanê hilgirin” û “berê **xwe** bidin ber bi ciyayêñ bilind û hênik ên **Kurdistanê**, bibin mamosta û rêberê zarokêñ milletê”³³.

Musa Anter di gotareke xwe de dide diyarkirin ku hejmara 2. û 3. a Yekbûn'ê li cem wî hene û derheqê kovarê de jî van agahdariyan dide³⁴:

“Li serê rûpela pêşîn a rojnama Yekbûn, bi herfîn xweşik em nivîsa ‘Yekbûn’ê dibînin (ji Yekbûn’ê, hejmar:3).

Hejmara 3. çar rûpel e û **bi Kurdî-Tirkî** ye.

Abonetiya salê: 35 quruş

Abonetiya mehê: 20 quruş

Nusxeyeke wê:10 pere ye.

Di hefteyekê de du caran derdikeve, **têkilî siyasetê nabe**.

Mudurê mesûl: **Îbrahîm Kurdî** ye.

Amanca Yekbûn’ê: Di nav koma civata Osmaniyan de danasîna Kurdan û bilindkirina qedr û qiy- meta wan e. Ev nivîs, bi îmza **Muncî Kurdi** xîtabî xortan dike. Nivîskar di vê nivîsa xwe de hin şiretan li xortan dike. Em li vê derê bi kurtî çend pasajan ji wê nivîsê bi zimanê îroyîn pêşkêş dikan:

1-Ji ber ku di nav **Kurdan de hejmara xwendeyan gelek kêm e**, divê elfabeyeke hêsan bête çêkirin.

2-Divê ku xort nekevin nav iştîrasa siyasî.

3-Divê ku xort, xizmeta milletê wek şerefa herî bilind bizanin.

Yekbûn, bi şîr, gotar, fiqre, gotinên pêşîyan û bi nivîsên din ve xemilandî ye.

Îmzeyênu ku di hejmarê 2. û 3. de hatine bikaranîn ev in: **F. N., M. H., M. S. Azîzî, M. Salih Bedirxan**.

Di sernivîsara hejmara 2. de îmza **Ebû Rûşen** heye. Ebû Rûşen naznavê **M. Salih Bedirxan** e (Wêlê xuya ye ku **Ebû Rewşen** bi şaşî Ebû Rûşen hatiye xwendin. Çimkî em dizanin ku M. Salih Bedirxan, bavê Rewşen Bedirxan a jina Celadet Bedirxan e. -N. M.).

Nivîskar di vê nivîsa xwe de xîtabî **Şêx Muhemmed Ebdullahê Şemdînî** dike, dibêje ku divê şêx, Kurdan di nava cehaletê de nehelin û ji wê cehaleta wan iştîfade nekin.

Di hejmara 3. de, nivîskarê ku bi îmza **Muncî³² Kurdi** nivîsandiye ji, hin mîsalan ji hin ayetên Qur'an'ê dide û dibêje: ‘**Herkesê ku xwedî hişê Muhammedî be, divê wekî ku hîç namire, hertim xizmeta milletê xwe bike.**’

Herçendî Musa Anter tarîxa derketina kovara Yekbûn’ê wek 1914 nivîsandiye ji, rastiya wê 1913 ye. Tarîxa derketina hejmarê 2. û 3. ya Yekbûn’ê weha ye:

no	tarîxa derketinê
2	19 eylül 1329/1913
3	30 eylül 1329/ zulqa'de 1331/1913

8

HETAWÎ KURD

İstanbul, 1913

Piştî ku hukûmetê Rojî Kurd da sekinandin, **Komela Hêvî**'yê dest pê kir kovara Hetawî Kurd derxist.

Di hin çavkaniyan de hatiye nivîsin ku “di bin îdara **Hemze Begê Muksî** de derdiket.”³³ Lê, li gor profesorê Tirk **Tarîk Zafer Tunaya**- ku wî bi xwe hejmara pêşîn dîtiye- li bergê hejmara pêşîn hatiye nivîsin ku “**sahib-i imtiyaz ve mesul müdürü: Baban Abdulazîz**” e.³⁴ Herweha **Dr. Celîlê Celîl** ji dide diyarkirin ku sernivîskarê Hetawî Kurd: **Abdulazîz Baban**'e³⁵.

Hetawî Kurd, kovareke edebî ya mehane bû û bi zimanê **Kurdî û Tirkî derdiket**.

“Wêneyê **Ebdurrahman Paşayê Baban** di rûpela 1. de hatiye belavkirin.”

“Bi tevayî xwendekarênu Kurd yên ku di Unîversîteya Îstenbolê de dixwendin, bi nivîsên xwe tê de besdar dibûn û bi gotarênu xwe yên edebî, tarîxî û bi honraweyê (menzumeyê) Kurdî alîkariya wê dikirin.”³⁶

Li gor Tarik Zafer Tunaya, di hejmara pêşîn a kovarê de **Dr. Abdullah Cewdet** di nivîseke xwe de şîretan li sernivîskarê kovarê dike³⁷. Di çavkaniyeke din de jî hatiye nivîsin ku di hejmara pêşîn a Hetawî Kurd de (di rûpela 2. de), bi navê “Ji Nivîskarêni Hetawî Kurd re” gotareke Abdullah Cewdet heye. Abdullah Cewdet dibêje ku: “Ji bo xortên Kurdan riya herî rast ev e ku mamostatî yan jî muessisiya dibistana seretayî (îbtîdâ) ya gundekî Kurdan, ji qeymeqamî û mudiriya cihekî din tercîh bikin.”³⁸

Me berê jî, di behsa li ser Rojî Kurd de qala têkiliyên pozitif ên Abdullah Cewdet û welatparêzên Kurdan kiribû³⁹. Şârî navdar ê Kurd, **Pîremêrd** (Hecî Tewfîqê Suleymaniyeji) jî di vî warî de weha dînivîse:

“Piştî Meşrûtiyetê gava ku Abdullah Cewdet ji Ewropa’ye vege riya Îstenbol’ê, ji herkesî bêtir min alîkariya wî dikir. Di kovara wî de (mebest jê kovara İctihad e -N. M.) ci bi nezm ci bi nesir be xizmeta min û kurê min Nejad heye.”⁴⁰

Di hejmara 3. a Hetawî Kurd de (rûpel: 11-12) dîsa nivîsek Abdullah Cewdet, bi navê **Hissi Hadiseler ve Aklî Hadiseler** (Hediseyên Hissî û Hediseyên Eqlî) û nivîsek **H(İzanizade) K(emal) (Fewzî)** bi navê **Zavallî Kûrdler ve Üfûl** (Kurdên Reben û Ufûl)⁴¹ heye. Li gor **Dr. Hanioğlu**, ev nivîsa Kemal Fewzî protestoyeke “tûj a etnîkî” ye⁴². Wek tê zanîn, di 1925’an de, di dema serihildana Şêx Seîdê Pîranê de Kemal Fewzî ji alî Kemalîstan ve li Diyarbekirê tê idamkirin.

Kovara Hetawî Kurd, “hetanî îlana seferberliga sala 1914’an weşana xwe demand”⁴³. Ji xwe Komela Hêvî’ye jî heta wê gavê vekirbû. Lê, gava ku herb îlan dibe, piraniya endamên Hêviyê digrin dişînin eskeriyê û Hetawî Kurd jî nema derdikeve. “Piraniya mesrefen Komela Hêvî’ye û weşanên wê bi rêberiya yek ji serokên Kurdan, Seyîd Ebdulqadirê rehmetî, ji karkerên Kurdan dihat temînkirin”⁴⁴.

Navê kovara Hetawî Kurd di hinek cihan de şaş hatiye nivîsin. Mesela di wergera (tercuma) Tirkî ya kitêba M. Emîn Zekî de navê wê bi şaşî bi “Netewa Kurd” hatiye binavkirin⁴⁵.

Dîsa di kitêbeke Kurdî de jî, derheqê **Zîvar** (Zêwer-N.M.) de hatiye nivîsin ku “cara pêşîn helbes-tênen wî di kovara Netewa Kurd da têne weşandinê. Ev kovar di sala 1912’dâ li Stenbolê derdiket”⁴⁶. Ger ev kovara “Netewa Kurd” ku li vê derê behsa wê tê kirin, ne kovara Hetawî kurd be, haya me ji kovareke weha (bi navê Netewa Kurd) tuneye.

Li gor **Dr. Hanioğlu** tarîxa derketina hejmara 1. û 3. a Hetawî Kurd weha ye⁴⁷:

no	tarîxa derketinê
1	teşrînî ewwel 1329/23 çirîya yekem 1913 ⁴⁸
3	29 kanûnî ewwel 1329/13 sefer 1332

9

JÎN (kovar)

İstanbul, 1918



“Kovara Jîn di payiza sala 1918’an da li Stanbolê dest bi derketinê kiriye. Wusa tê zanîn ku organa nerestmî ya Komela Pêşketina Kurdistanê bûye. Jîn 25 jimare hatiye weşandin... Jîyana xwe nêzîkê salek domandîye. Jimareya wê ya paşîn, yanî ya 25’an di tarîxa 2-10-1919’an da derketîye. Kovar piştê wê tarîxê hatîye girtin. Ü bi wî awayî di dîroka gelê Kurd da veşîriye”⁴⁸.

Kovara Jîn, di hejmara pêşîn de amanca xwe weha dide diyarkirin:

“Jîn ne ji bo bi destxistina lişteka (menfeet) maddî derdikeve. Amanca wê belavkirina zanînê ye li ser jiyanâ Kurd a dîrokî, heqên wî yên neteweyî, bêjeya wî û rewşa wî ya civakî ku ji sedsa-lêñ dirêj vir da hatine îhmalkirin”⁴⁸.

“...Em di jimareya 23'yan da ragîhanek dibînin. Di wê ragîhanê da hatîye eşkerakirin ku, wan bir-yar daye ku Jîn'ê bikin kovareka sîyasî...”⁴⁸

Ji 25 hejmarê Jîn'ê 22 hejmar 16 rûpel derketine.

Ev hejmarana jî 24 rûpel in: Hejmara 15., 16. û 25'an⁴⁸.

Kovara Jîn'ê bi Tirkî û Kurdî (Kurmancî û Soranî-Mukrî) derdiket.

Bernama **Kurd Tamim-i Maarif ve Neşriyat Cemiyeti** (Komela Kurd ji bo Zanînê û Weşanan) “di tarîxa 2-2-1919'an da di Jîn'ê de bi belavokeka dirêj hatîye çapkîrin û ragihandin. Komela kurd ji bo Belavkirina Zanînê û Weşanan, di wê bernama xwe da ragihandiye ku ji dema sazbûna xwe pê ve, kargêriya kovara Jîn jî girtiye ser xwe”.

“Serkar û berpirsiyarê kovarê **Hemzê Muksî** bûye... Berpirsiyariya Hemze ji jimareya pêşîn heta jimareya 20'i dom kiriye”⁴⁸.

Dr. Kemal Mezher Ehmed, dibêje ku berpirsiyarê kovarê **Eşref Hemze** bûye⁴⁹.

Hemze yek ji muessisên **Kürdistan Teali Cemiyeti** bû û bi navê Hemzeyê Muksî dihat naskirin. Pêşgotina kitêba **Mem û Zîn** a çapa Îstenbol'ê, wî bi sernivîsara **Edebiyat û Asarê Edebî** nivîsiye (1919). Wekî ku **M. Emîn Bozarslan** dide diyarkirin, ev pêşgotin di hejmara 19. a Jîn'ê de hatîye belavkirin.

Ji hejmara 20. heta hejmara 25. berpirsiyarê Jînê **Memduh Selîm** bû.

Derheqê Hemzeyê Muksî de, di rojnama Îstenbol'ê **Vakit** (29-5-1925) de xeberek weha heye:

BERPIRSIYARÊ JÎN'Ê LÎ MUDÎRİYETA POLISE

Çar pênc kesên ku navêne wan li Şark İstiklal Mahkemesi (Dadgeha İstîqlal a Rojhelatê) mewzû-behs bûn, ji alî mudîriyeta polîs ve hatîn tewqîfîkirin. Di nav wan de **Seyîd Hemze Efendî** jî heye ku li Omerî'yê (qezayele Mêrdîn'ê ye ku Kurd jê re Mahsîrt dibêjin-N.M.) mamosta ye û berê jî mudîrê mesûl ê rojnama Jîn'ê (mebesta wî kovara Jînê ye-N.M.) bû. Li gor texmînan dê wan bişî-nin **Diyarbekir'ê**.

Dîsa di rojnama Vakit (14-6-1925) de xeberek weha heye:

SEYÎD HEMZE DİŞİNİN DİYARBEKİR'Ê

“Van rojana, dê berpirsiyarê kovara Jîn'ê Seyid Hemze ku çend roj berê hatîbû girtin, bişînin **Diyarbekir İstiklal Mahkemesi** (Dadgeha İstîqlal a Diyarbekirê).”

Rojnama Vakit (12-5-1925) dînivîse ku **Kemal Fewzî** “bi navê Jîn rojnameke Kurdî derxistiye”. Lê, baş nayê fêmkirin ku ji vê “rojnamê” mebest **kovara Jîn e, an rojnama Jîn e**.

Rojnama Vakit (12-5-1925), bi vî hawî qala mehkema Kemal Fewzî dike:

Serokê Dadgeha İstîqlalê **Mazhar Müfit** (Kansu) dipirse:

“Li Îstenbol'ê te û Memduh (Memduh Selîm-N.M.), Şukru Mehmed (Dr. Şükrü Mehmet Sekban -N.M.) û Xelîl Xeyalî we hevûdu didît?

Kemal Fewzî:

-**Memduh berpirsiyarê rojnama Jîn'ê bû... Kürdistan Cemiyeti** (mebest jê Kürdistan Teali cemiyeti ye-N.M.) pişt re bû du şax: **Kurd Kavi**⁵⁰ û **Kurd İctimai Cemiyeti** (Komela Civakî ya Kurd).

Serokê mehkemê (Mazhar Müfit-N.M.):

-**Dema ku ez walyî Bedlisê bûm, we ji min re jî (ev) rojname dişand.** Ma gotara te ya bi navê ‘Dema Berê ya Kürdistanê, Nûka û Serxwebûn’ dîtimên separatîst (bölgücü) nediparast?... Wê demê we kovara xwe bi rêkûpêkî dişand her derê. Binêre çiqas li min tesîr kiriye ku min hîna jî ew gotara te ji bîr ve nekiriye.”

Piştî ku Kurdistan Teali Cemiyeti bû çend şax, van kesana ku serxwebûna Kurdistanê dixwestin, **Teşkilat-ı İctimaiye Cemiyeti** (Komela Organizekirina Civakî) danîn:

Emîn Alî Bedirxan (Cizîra Botan)

Ferîd Beg

Şukru Baban (Suleymaniye)

Fuad Baban (Suleymaniye)

Hîkmet Baban (Suleymaniye)

Dr. Abdullah Cewdet (Arapgîr)

Dr.Şukru Mehmed (Paxir Maden)

Kemal Fewzî (Bedlîs)

Ekrem Cemîl Paşa (Diyarbekir)

Necmeddin Huseyîn (Kerkûk)

Memduh Selîm (Wan)

Xwedîyê rojnama **Serbestî**'yê⁵¹ Mewlânâzade Rîfat

Kovara Jîn ku heta wê gavê ji alî Kurdistan Teali Cemiyeti û Kûrd Tamim-i Maarif ve Neşriyat Cemiyeti (Komela Belavkirin a Rewşenbîrî û Weşanên Kurdî) dihat derxistin, êdî bû organa **Teşkilat-ı İctimaiye Cemiyeti** û dest pê kir wek rojnameke rojane derket⁵².

Ji hejmara pêşîn heta hejmara 5. a kovara Jîn'ê de, di binê navê wê de weha hatiye nivîsin: “**Haftalık Gazete**” (Rojnama Hefteyî), “**Din, edebiyat, ictimaiyat ve iktisadiyattan bahseder Türkçe-Kurdçe mecmuadır**” (Kovara Tirkî-Kurdî ye, behsa tiştên dînî, edebî, civakî û aborî dike).

Ji hejmara 5. pê ve, klîşeya “**Haftalık Gazete**” rabûye, li şûna wî “**Hayat**” hatiye nivîsin.

KESÊN KU DÎ KOVARA JÎN'Ê DE NIVÎSANDİNE

Di kovara Jîn'ê de digel şîrên Kurdî yên klasîk, nivîsên bi Soranî/Mukrî, Kurmancî û Tirkî hene. Yênu bi Soranî/Mukrî nivîsandine: **Tewfiqê Suleymaniye** (Pîremêrd), **Muhemed Mîhrî**...

Yênu ku Kurmanciya Bakur nivîsandine: **Xelîl Xeyalî** (Kurdiyê Bedlîsî), **Evdîrrehîm Rehmiyê Hekarî**.

Yênu bi Tirkî nivîsandine:

Kemal Fewzî

Memduh Selîm

Azîz Yamulkî

Law Reşîd

Siverekli Hilmi (Hilmiyê Siwêregî)

İhsan Nûrî

Kamuran Alî Bedirxan

Qadîzade Mustefa Şewqî

Qadîzade Letîf

Dersimli Hûzni (Huzniyê Dersîmî)

Cizreli Mirza (Mîrzayê Cizîrî)

Zaxoyî

Suleymaniye İsmail Vedad (İsmaîl Wedadê Suleymaniye)⁵³

DERHEQÊ KOVARA JÎN'Ê DE HÎN AGAHDARIYÊN DÎN

a)Cemal Xeznedar dinîvise ku “**Sureyya Bedirxan** di 1916'an de, mehê du caran li Qahîre'yê bi **Kurdî-Tirkî-Erebî** kovara Jîn'ê derxistiye. Ev kovar dewama rojnama Kurdistan'ê bû”⁵⁴.

b)Thomas Bois dinîvise ku “**Sureyya Bedirxan**, di 1916'an de **bi Tirkî**, hefteyê de carek Jîn'ê derdixist”⁵⁵.

c)Li gor ku di kitêba **Koçgiri Halk Hareketi** (Tevgera Gelêrî ya Qoçgîrî) de hatiye nivîsin, **Rahmi Apak** di kitêbeke xwe de (Türk İstiklal Harbi/İç Ayaklanmalar: 1919-1921, c:6, Genel Kurmay Bası-

mevi) dibêje ku rojnama **Jepîn a Elîşêr** (Serokekî serîhildana Dêrsîmê ye -N.M.) di nav xelkê de propagandayek tûj diajot (binêre: Koçgiri Halk Hareketi, Komal Basım-Yayım-Dağıtım, Ankara, 1975, r: 22).

Lê, bi a me **Jepîn** a ku Rahmi Apak qala wê dike, her Jîn e. Ji ber ku bi herfêن Erebî nivîsina “Jîn” û “Jepîn”ê gelek nêzîkî hev in, dibe ku kelîma “Jîn”ê şaş hatîbe xwendin.

d)Derheqê Jîn’ê de di **Erzincan Tarihi** (Dîroka Erzîncan’ê) de (rûpel:152) weha hatîye nivîsîn: “Di dema Mutarekeyê de (Mutarekeya Mondros’ê-N.M.) **Heyder Beg** çûbû İstenbol’ê û bûbû endamê Kurd Teali Cemiyeti. Heyder Beg gava ku vege riya **Umraniyê** (Qezayek Sêwasê ye-N.M.), li wir di bin serokatiya xwe de şaxeke (şube) Kurd Teali Cemiyeti vekir û hinek serek’erşîr û axayê Der sim’ê jî kir endamê wê. Wî, **rojnama Jîn** ku organa propaganda ya **Cemiyet’ê** bû teví hinek broşurên ku derheqê serxwebûna Kurdistan’ê de hatibûn nivîsîn, anîn, bi **Elîşêr** dan xwendin û propaganda xwe domand.”

Wusa tê fêmkirin ku **rojnama Jîn** a ku Erzincan Tarihi li vir behsa wî dike jî her **kovara Jîn** e. Deh hejmarêن pêşîn ên kovara Jîn’ê, digel orîjînal (bi herfêن Erebî) û wergerê, bi herfêن Latînî, ji alî **M. Emîn Bozarslan** ji nû ve hatîn çapkiran.

Tarîxa derketina çend hejmarêن kovara Jîn’ê ev in⁵⁶:

no	tarîxa derketinê
1	7 teşrînî sanî 1334/1918
5	12 kanûnî ewwel 1334/1918
10	2 şubat 1335/1919
15	3 mart 1335/1919
20	4-6-1919
25	2-10-1919

10

KURDISTAN

İstanbul, 1919

مدد ٦ نیسان ١٣٣٥

تاریخ ۲۰ آگوست ۱۹۱۸
اربع آیینه ۲۰ میونیشان

کردستان

ساله ۲۰۰ شش ساله
۴ میاز ۷۰ فروردین

سیاسی، اجتماعی، ادبی و علمی اولدرق هفتاده بى دفعه نشر اوئلور

Li gor pênc hejmarêن ku me dîtine, kovareke du hefteyî ye.

Sernivîskarê wê: Arwasîzade Muhemed Şefiq

Xwedîyê imtiyaz û berpirsiyarê wê: **Muhemed Mîhrî**⁵⁷

Wek kovara Jîn’ê ev kovar jî di çapxana Necm-i İstikbal’ê de hatîye çapkiran.

Dr. Kemal Mezher Ehmed dinîvise ku: “Navê berpirsiyarê wê **Seyîd Huseyn** bû.”⁵⁸ Lê, wekî me li jor jî nivîsand, di hejmarêن ku me dîtine de (**hejmarên 2., 3., 4., 5., 6.**) ev nav tune.

Cebbar Cebbarî jî dinîvise ku hejmara 1. di 25 rebiûlewwel 1337’ê Hîcrî de derketiye, “çend carismên Selaheddînê Eyûbî, Hemze Beg, Şeyxulislam Îbrahîm Efendî Heyderî û çend navdarêن din” tê de çapkirine. “Xwedîyê wê **Muhemed Mîhrî** û berpirsiyarê wê **Seyîd Huseyn** bûye.”⁵⁹

Derheqê vê kovarê de malumatên cihê cihê hene:

Li gor Cemal Xeznedar: “Kovareke hefteyî ya edebî bû, li İstenbol’ê ji alî Muhemed Mîhrî dihat derxistin. Heta 1918 weşana xwe domand û li ser hev 37 hejmarên wê derketin.”⁶⁰

Mamoste **Elaeddîn Secadî** jî weha dinîvîse: “Kurdistan rojnameyek hefteyî, siyasî û edebî bûye. Muhemed Mîhrî li Îstenbol’ê hejmara 1. di 25’ê rebiûlaxir a 1337’ê Hîcrî/1917’an de derxistîye. Sî û heft hejmarênen wê derketin û di 7’ê receb a 1338’ê Hîcrî/1918’ê Mîladî de êdî nema derket.”⁶¹

Lê, Mamoste Secadî mîladiya van tarîxana şas nivîsiye. Çimkî 25’ê rebiûlaxir a 1337’ê Hîcrî beramberê 1918’ye Mîladî ye û 7’ê receba 1338’an jî beramberê 1919’ye Mîladî ye.

Dîsa **Dr. Kemal Mezher Ehmed** gava ku behsa wan hejmarênu ku dîtiye dike, dibêje: “Di binê navê kovarê de bi Tirkî dinîvîse ku ‘siyaset ne têda ci behs bi ci zimanî bibe bila bibe, heftê carekê belav dike’. Lê, ji wan hejmarênu ku me dîtine welê diyar e ku ji herdu hefteyan carê bi pênc zimanan (**Kurdî-Tirkî-Erebî-Farisî-Frensî**) derdiket. Hejmara dawî ya ku min dîtiye, hejmara 19. ya sala duðoyan e û li ser wê hejmarê tarîxa 29 mart 1336/7 receb 1338/1920 heye. **Ev 19 hejmar, li ser hev 256 rûpel in.** Kovareke rîkûpêk e û gelek hejmarênu wê bi rîsmîn navdarên Kurd xemilandiye. Kovara Jîn’ê gelek caran di rûpelên xwe yên dawîn de xebera derketina wê (kovara Kurdistan-N.M.) û navero-ka wê dida.”⁶²

“Bawer nakim ku li dunyayê rojname yan jî kovarek hebe ku gotarênu xwe bi pênc zimanen cihê belav kiribe.”⁶³

Divê em bibêjin ku di wan hejmarênu ku me dîtine de ne rîsm û ne jî nivîsên bi Frensi hene.

Di rûpela dawî ya hejmara 6. de hatiye nivîsînu ku ev kitêbên Kurdî li idarexana kovara Kurdistan’ê de peyda dibin:

- 1) **Eqîda Mela Xelîlê Siîrdî** (menzûm îlmîhal û îlmê ehlaq)
- 2) **Eqîda Mela Ehmedê Xanî** (menzûm îlmîhal)
- 3) **Eqîda Kurdan -Ebdurrehîm Efendî** (menzûm îlmîhal)
- 4) **Muqeddîmetû'l-Îrfan -M.M.** (broşurek e ku xizmeta yekîtiya zimanê Kurdî dike)

Di eyñî rûpelê de mîzgîna derketina hejmara 16. ya kovara Jîn’ê heye û kovara jîn ji xwendevanan re tê tewsiye kirin.

Ji çavkaniyeke din tê fêmkirin ku di hejmara 9. ya Kurdistan’ê de (rûpel:109-112) bi vî navî nivîsike Tirkî heye: “**Tercuma muxtira ya serokê delegasyona Kurdan, Cenabê Şerîf Paşa ye ku pêşkêşî Konferansa Sulhê (li Sewrê -N.M.) kiriye.”**⁶⁴

Dr. Maruf Xeznedar dibêje ku hejmara 8. û 9. ya rojnama Kurdistan’ê li cem wî hene. Li gor wî xwedîyê wê: **Muhemed Muhrî** û sernivîskarê wê: **Muhemed Şefiq Erwasîzade** ye. Dr. Maruf Xeznedar ji hejmara 9. şîrek bi navê “**Cewanîn**” ya **Qazîzade Mistefa Şewqî** neqil dike⁶⁵.

Çend nivîsên bi Tirkî ji hejmara 3. ev in:

- Bi munasebeta kovara Kurdistan’ê -**Kemal Fewzî**
- Seyahet ber bi Kurdistan’ê -**Ahmed Wehbîyê Xarpêtî**
- Ji rojnama İleri (Ati) re -**İzzet Melîh**

Di hejmara 6. de şîrek bi navê Delaliya Zarakan heye ku ji ’**Eşîra Mîran Zeyno** nivîsandiye. Tarîxa derketina hin hejmarênu kovara Kurdistan’ê ev in:

no	tarîxa derketinê
1	28 rebiûl axîr 1337/30 kanûnî sanî 1335/31-1-1919
2	12 cemazîyel ûla 1337/9 şubat 1335/1919 - 12 rûpel e.
3	25 cemazîyel ûla 1337/25 şubat 1335/1919 - 12 rûpel e.
4	13 cemazîyel axîr 1337/15 mart 1335/1919 - 12 rûpel e
5	2 receb 1337/3 nîsan 1335/1919 - 12 rûpel e.
6	21 receb 1337/22 nîsan 1335/1919 - 12 rûpel e.
9	11 hezîran 1335/1919
13	31 agustos 1335
19	7 receb 1338/29 mart 1336/1920 ⁶⁶

JÎN (rojname)

İstanbul, 1919-1920

Wusa xuya ye ku ev rojname dewama kovara Jîn'ê ye. Çavkaniyên ku derheqê vê rojnamê de malumatân didin, gelek caran kovara Jîn û rojnama Jîn tevlihev dîkin. Jixwe di bin navê her çar hejmarêñ pêşîn ên kovara Jîn'ê de jî ibareya “**Haftalık Gazete**” (Rojnama Hefteyî) heye.

Di vî warî de, di hin çavkaniyan de van malumatên jêrîn hene:

Li gor Zinnar Sîlopî, berê ji alî Komela Hêvî'yê dihat derxistin, organa **Teşkilat-i İctimaiye Cemiyeti** bû, pişt re bû rojnameyek rojane⁶⁷.

Dîsa li gor ku **Zinnar Sîlopî** dibêje: di hejmara 28. (20 teşrînîewwel) a rojnama Jîn'ê de gotareke **Suleyman Nazîf** bi navê “İzmir Kurdistan Değilse ya Kurdistan Nedir?” (Ger Îzmîr ne Kurdistan e, Kurdistan Ci ye?) heye⁶⁸.

Li gor **M. Emîn Zekî** “kovareke hefteyî” bû, “amanca wê serxwebûna Kurdistan'ê bû.”

“**Memduh Selîm** û **Kemal Fewzî** derdixist. Heta sala 1920'î 32 hejmarêñ wê derketin.”⁶⁹

Di çavkaniyek Tîrkan de jî weha hatiye nivîsîn: “Endamên Kürt Teali Cemiyeti ku di 1918'an de li Îstenbol'ê hatibû damezirandin, piştî demekê ji ber hin sedemên stratejîk li hev nekirin û ji hev veqetîyan, grûbek ji wan bi navê **Teşkilat-i İctimaiye** komeleyek danî, ev (rojnama Jîn'ê-N.M.) jî organa vê komela nû bû.”⁷⁰

Li gor **Cebbar Cebbarî** jî “rojnameya Jîn: rojnameyek edebî û hefteyî ye, xwediyyê wê Muhammed Hemze ye. Li dawiya Şerî Pêşîn ê Cîhan'ê, bi taybetî sala 1919'an de, li Îstenbol'ê, bi Kurdî û Tirkî dest bi weşanê kir. Van rewşenbîrên Kurdan ên navdar di vê rojnamê de dinivîsand: Memduh Selîm, Kemal Fewzî (serbazekî eskerî bû, nivîskarekî hêja û şâîr bû), Emîn Bedlîsî û Dr. Abdulla Cewdet. Ev rojname, bi firehî li Misir û Îstenbol'ê li gelek navçeyîn Kurdan dihat belavkirin. Komek xwendevanê wî yên taybetî hebû”⁷¹.

Cemal Xeznedar jî dibêje: “Ji alî Memduh Selîm Beg û Kemal Nurî li Îstenbol'ê, bi Kurdî hatiye derxistin. Rojnameyeke edebî û ictîmaî ye, hejmara wê ya pêşîn di 1919'an de derket.”⁷²

Li gor **Dr. Maruf Xeznedar** jî: “Jîn, rojnameyeke hefteyî bû. Hin rewşenbîrên Kurdan wek Hemze, Memduh Selîm, Kemal Fewzî sala 1337 Hîcrî/1919 Mîladî de li Îstenbol'ê derxistine. Hejmara 32. di cemaziyelûla 1338 Hîcrî/kanûnaduwem a 1920'an de derketiye (binêre: Tarîxe'l-Kurd we'l-Kurdistan, cild: 2, r: 352). Min bi xwe tu hejmareke vê rojnamê nedîtiye û nizanim li kuderê jî hene. Di destnivîsa **Necmeddin Mela** de tê gotin ku: ev helbest û pêşgotina wê, di Jîn'a Îstenbol'ê de hatiye belavkirin, lê nehatiye nişankirin ku kîjan hejmar e.”⁷³

Kemal Fewzî ku ji mulazimtiyê teqawîd bûbû û di 1925'an de ji alî Kemalîstan ve hatibû idamkirin, di ifada xwe de digot ku di dema Mutarekeye de li Îstenbol'ê bû, her di wê wextê de endamê du komelan (**Kürt Teali Cemiyeti** û **Vilayet-i Şarkîye Cemiyeti**) bû û du mehan sekreteriya yekê jî kiri-bû. Pişt re dev ji vî karê xwe berdide û dest bi derxistina rojnama Jîn'ê dike. Kemal Fewzî gelek belavok jî daye çapkîrin û van belavokana bi wasita serekê 'esîra Şîrناq'ê di nav Kurdîn Tîrkiyê de belav dikir⁷⁴.

Di rojnama **Vakit** (7-6-1925, rûpel: 3) de hatiye nivîsîn ku di rojnama Jîn'ê (25 şubat 1341) de⁷⁵ bi navê “**Hiss-i Kable'l-Vuku**” helbestek bi Tirkî hatiye çapkîrin. Di bin helbestê de jî “28 nisan 1918, Kazim Wehbîyê ji Erxenî (**Ergani Madeni'nden Kazım Vehbi**)” heye. Em dizanin ku Kazim Wehbî, mebûsê Ergani Madeni'ye bû.

Di hejmara 32. a rojnama Jîn'ê (rûpel: 2) de nivîsek Abdullah Cewdet bi navê “**Lütfî Fikri Bey**” heye. Di vê nivîsa xwe de Abdullah Cewdet rexne li Têvgera Anadolî (ya Kemalîstan) digre:

“Rica dikim Lütfî Beg, tu dixapînî yan tu bi xwe têyî xapandin? Ez te layiqî van herdu tiştan jî nabînim. Ma tu dibêjî qey Îttihad-Tereqqî gava were, wê li serî Talat Beg bi def û zirne û şahî were? Gelo yên ku li Anadolî’ye dişewitînin, dişkînin, serjê dîkin kî ne? Ma yên ku li vir di bin navê tewir tewir partîyan de jahr û qotikê belav dîkin kî ne?”⁷⁶

Di rojnama Jîn'ê de (21 receb 1338/mart 1920) nivîseke din ya Abdullah Cewdet bi navê “**Milletler ve İnsanlık**” (Millet û Mirovayetî) heye. Di vê nivîsa xwe de Abdullah Cewdet, bi kurtî weha dibêje: Divê ku em ne tenê jî bo menfe'eta xwe lê ji bo hemuyan prensîbênen Wilson qebûl bikin. Prensîbênen ma fê çarenûsî yê milletan û yên wekhevî û azadiya milletan divê ji bo Kurdistan'ê jî bênen qebûlkirin. Ji bo Tirkan karê herî aqilane ev e ku hêza xwe ji bo bindestkirina Ereb, Çerkez, Kurd, Laz, Ermenî û Rûman xerc nekin”.⁷⁷

no	tarîxa derketinê
28	20 teşrînî ewwel 1919 ⁷⁸
32	cemazîyel ûla 1338/kanûnî duwerm 1920



Herweki ku me di destpêka nivîsa xwe de jî gotibû, ji 1920'i heta 1950'yî dewleta Tirkîyê fersend nedaye ku Kurd rojname û kovaran derxin. Ger ev hovîtiya dewleta Tirk nebuya bêguman wê gelek rojname û kovarên Kurdi derketana. Mesela bi qasî ku rojnamên Tirkan dînîvisi-nin jî Zazayêن Çêrmugê, kurê Hecî İbrahim Dr. Fuad (1887-1925), çend meh berê Serîhildana Şêx Seîdê Piran'ê, li Diyarbekir'ê ji bo derxistina rojnama Mezopotamya'yê hazırî dikir⁷⁹.

12

AGRÎ

Agrî, 1929-1930

Wekî ku di hinek çavkaniyan de jî hatiye nivîsin, di dema Serîhildana Agrîyê de, serokê serîhildanê İhsan Nurî, bi navê Agrî rojnameyek derxistîye.

İhsan Nurî bi xwe, di kitêba xwe ya bi navê **La Revolte de l'Agrî Dagh** (Serîhildana Çiyayê Agriyê) de weha dibêje:

“Li Agriyê bi navê Agrî rojnameyeka Kurdî hate belavkirin. Ji ber ku kaxiz kêm peyda dibû, ev rojname hindik dihat derxistin û belavkirin. Rojnama Agrî, ji tunebûna daktîloyê bi dest dihat nivîsandin.”

Wekî ku İhsan Nurî dibêje, ev rojname, **organa resmî ya têkoşerên Serîhildana Agriyê** bû. Vê rojnamê, di nivîseka xwe ya bi navê “(Kuştina) Du Çivîkan bi Kevirek” de behsa dek û dolabên karbi-destêne Tirkîyê dikir ku çawa wan dixwest navbera Kurd û Farisan xera bikin⁸⁰.

Nivîskarê Ermenî **Garo Sasûnî** jî behsa nivîseke İhsan Nurî dike ku bi naznavê (pseudonyme) **Cemşîd** di “organa şoşerger a Kurdî: Egrî” yê de derketiye. İhsan Nurî di vê nivîsa xwe de ji Kurdan dixwaze ku li hember orduya Tirkan bi mîranî çek hilgirin û bi hev re li dij êrîşen wan bisekinin”⁸¹.

Di kitêba Zinnar Sîloپî de marş(xwesxan)eke Kurdî heye ku ji hejmareke rojnama Agrî'yê hatiye girtin⁸².

Di çavkaniyeke Tîrkan de jî hatiye nivîsin ku di dema Serîhildana Agriyê de **Xoybûn**'ê bi navê **Agrî Agir Dibarîne** bultenek derdixist.

Her di wê çavkaniyê de hatiye nivîsin ku Îhsan Nurî, li Çiyayê Agriyê bi navê **Gaziya Welat** rojnameyek derdixist û bi vê rojnamê dixwest ku daxwaz û amancêن xwe bi xelkê navçeyê bide zanîn⁸³.

13

DICLE KAYNAĞI (ÇAVKANIYA DİCLÊ)

İstanbul, 1948



Her Şey Halk İçin

DİCL
21
Dicle Yer
10 cu yıldız
tevkîfî p
be 200
bir A.

Li gor hejmarên ku me dîtine (hejmara 28. û 30.) di binê navê vê rojnamê de ev îbare heye: "**Haf-**
talik müstakil siyasi gazete/Hersey Halk İçin" (Rojnameyek siyâsî û serbixwe ye/Hertiş ji bo Gel).

Mezinahiya van hejmaran: 50 × 34 cm.

Buhayê wê: 10 quruş e.

Xwediyê wê: **Hüseyin Dikici, Şehmus Elmas** (Ev Şehmus Elmas: **Musa Anter** bi xwe ye).

Yê ku karûbarê nivîsan idare dike: **Hüseyin Dikici** (Hüseyin Dikici, ji sekreteriya Siyasal Bilgiler Fakültesi teqawîd bûye).

Dicle Kaynağı, bi Tîrkî derdiket. Li gor hin çavkaniyan hejmarên 20. û 21. jî di 1948'an de derketine⁸⁴.

Dr. S. A. Şivan jî ji bo vê rojnamê weha dinivîse:

"Di temmûza 1948'an de hin xwendekarên unîversîteyê⁸⁵ û rewşenbîrên Kurdan li dora kovara hefteyî, Dicle Kaynağı ya ku **Musa Anter** (**Şehmus Elmas**) derdixist de civiyan û **di çarçewa qanûnan de li gor imkanen xwe li ser mesela Rojhelatê (Kurdistan'ê) têkoşîna fîkrî didan**",⁸⁶

Di hejmara pêşîn a rojnama **Dicle- Fîrat'ê** de (1-10-1962) nivîseka Tîrkî (**Bütün Ümidimiz Okuyan Gençlerdedir**: Hêviya me Xortên Xwende ne) bi imza **Amedî** hatiye belavkirin ku ji Dicle Kaynağı (1949) hatiye girtin.

Hin nivîsên hejmara 28. a Dicle Kaynağı ev in (Nivîs hemû bi Tîrkî ne):

-**Şeva Dîclê** (Bi munasebeta 10. saliya avabûyîna Dicle Yurdu, di 21'ê Adarê de wê şevez çêbibe).

-Qultek ji Kaniyê: Ceza Peran (**Anter**)

-Pêla Kurt: Xewna bi Xof (**H.D.**)

-Mîzah (**Rahsan**)

-Hin dîtin: Peters Familias (**M. Ander**)

-Ji Xalê Minê Încö re (**Av. Baki Tekin**)

Hin nivîs ji hejmara 30. ev in:

-Ji bo Pêşdebirina Bajarêñ Rojhelatê Reforma 'Erdan (Toprak Reformu) jî Lazim e (**Av. M. Remzi Bucak**)

-10. Saliya Avabûyîna Dicle Yurdu (**Dr. Karahan**)

-Pêla Kurt: Tava Rojhelatê (li ser Dicle Talebe Yurdu)-**H.D.**

-Derd û Daxwaza Gel: Nameyek Vekirî ji Wezîrê Daxiliyê re (**Hamit Fendoğlu**)

-Gava ku Dor Tê: Bextê Rojhelatê (**A. Şirvani**)

Tarîxa derketina çend hejmara Dicle Kaynağı:

no	tarîxa derketinê
20	1948
21	1948
28	3-3-1949 (çar rûpel e)
30	17-3-1949 (çar rûpel e)

14

ŞARKIN SESİ (DENGÊ ROJHELATÊ) İstanbul, 1950



Ev rojname bi Tirkî derdiket. Di bin navê rojnamê de ev îbare heye: "Haftalık müstakil siyasi, ictimai gazete" (Rojnameyek hefteyî, siyasi, civakî ya serbixwe ye).

Xwedî û yê ku karûbarê nivîsan idare dike: **Samed Avşar**

Dr. S. A. Şivan jî qala **Şark Mecmuası**'yê dike ku di cileya paşîna 1950'yî de derketiye⁸⁷. Lî em bi xwe nizanin, ya ku Dr. Şivan qala wê dike gelo rojnama **Şarkın Sesi** ye yan na.

Rojnama **Şarkın Sesi** ya ku em pê dizanin rojnameyek hefteyî ye û **hejmara wê ya pêşîn** di 18-5-1950'yî de derketiye, çar rûpel e.

Musa Anter jî qala **Şark Mecmuası**'yê dike ku li Îstenbol'ê derketiye⁸⁸.

Me bi xwe tenê hejmara pêşîn a rojnama **Şarkın Sesi** dîtiye. Rojname di vê hejmara xwe de bi hawakî pozitîf behsa îqtîdara nû ya Partiya Demokratî (Demokrat Partisi) dike û navê mebusê "Rojhelatê" jî hatine nivîsin ku navê Dr. Yusuf Azizoğlu û Av. M. Remzi Bucak jî têde ye. **Samed Avşar** bi navê **Matbuatımız ve Şark** (Çapemeniya me û Rojhelat) sernivîsa vê hejmara nivîsandiye.

26-Çirkey Kurdistan, London, no: 3 (tîşrînî duwem 1980), r: 60

27-Ali Emiri (1857-1923): Nivîskarekî Diyarbekirî ye ku bi navê Osmanî Vilayat-i Şarkiyesi (Wilayetîn Rojhelat ên Osmanî), Tezkire-i Şuara-i Amid (Antolojiya Şârifîn Diyarbekirî) û Esami-i Şuara-i Amid (Navîn Şârifîn Diyarbekirî) çend kitêb nivîsandiye. Wî gelek ji kitêban hez dikir û ji 14000 (çarde hezar)'î zedetir kitêbên wî hebûn. Van kitêbana ji dewleta Tirkîye re bexşands. **Millet Kütüphanesi** (Bibliyoteka Millet) ya ku fro li Îstenbolê ye, ji van kitêbên wî pêk hatiye.

Li gor ku Ali Emiri dibêje, dema ku ew di zarotiya xwe de li Şîrwan'ê li cem xalê xwe (qeymeqamê Şîrwanê) bûye Kurdî jî hîn bûye (binêre: **Beysanoğlu, Şevket**; Diyarbakır Fikir ve Sanat Adamları, cilt: 2, İstanbul, 1960, r: 139-174).

28-**Beysanoğlu**, cilt: 2, r: 146, 324

29-Yamulkî, 'Ebdulezîz; Kürdistan ve Kürd İhtilalleri, Bağdat, 1947, r: 56

30-Ehmed, r: 231, 73-74

31-Anter, Musa; "Yekbûn/1914'te Çıkan Dergi", Doğu (Aylık

Bilimsel Dergi), İstanbul, no: 1 (Aralık 1969), r: 29-30

32-Em nizanin ev Muncî kî ye, dibe ku naznav be. Lî, her di wê demê de bi navê Muncî birayekî mezin ê Lutfî Fikrî heye (Lutfî Fikrî mebusê Dersim'ê bû).

Kelîma muncî bi xwe di Erebî de, di me'naya xelaskar de ye.

33-Sîlopi, r: 35

34-Tunaya, r: 406

35-Celîl, r: 94

36-Cebbarî, r: 148

37-Tunaya, r: 406

38-Hanioglu, r: 317-318

39-Ji bo agahdariyê zedetir binêre: **Malmîsanij**; Yüzyılımîzin Başlarında Kürt Milliyetçiliği ve Dr. Abdullah Cevdet, Jîna Nû Yayınları, Stockholm, 1986

40-Yê ku ji Jîn, no: 679 (1942) neqil dike: **Umêd Aşna**, "Çend Layenêkî Şardirawe le Jiyanî Rojnamegerî Pîremêrdî Nemir", Karwan, Hewlêr, no: 39 (kanûnî yekem 1985) r: 37

41-ufûl: Zimanê Osmanî de bi me'nâ windabûn, windabûna

- stérkan û mirin'ê (bi mecazî) de bikar tê.
- 42-Hanioğlu, r: 318
- 43-Silos, r: 36
- 44-binêre: **Zeki, M. Emin; Kurdistan Tarihi, Komal Basım-Yayım-Dağıtım, İstanbul, 1977, r: 190**
- 45-Bali Xan-Rohat; Berevoka Helbestvanen Kurd, Weşanen KOM-KAR, 1982, r: 104
- 46-Hanioğlu, r: 317, 318
- 47-Celîl, r: 94
- 48-Jîn, Kovara Kurdi-Tirkî (Kürç-Türkçe Dergi): 1918-1919, cild: I, Wergîr ji tîpén Erebî bo tîpén Latîmî: **M. Emîn Bozarslan**, Stockholm, 1985, r: 9, 13, 11
- 49-Ehmed, r: 49
- 50-kavi (qewî): bi hêz, bi quwwet
- 51-Rojnama Serbestî ya Mewlazade Rifat di navbera 1908 û 1913'an de li Îstanbul'ê derdiket. Sernivîskarê wê **Hasan Fehmi**, ji ber nivîseke xwe ya ku li dijî Îtfîhad û Tereqqî nivîsandibû hat kuştin.
- Li gor hinek çavkaniyan rojnama Serbestî di 19'yê sibata 1913'an de hatiye girtin û ji hejmara 192 heta 197 bi navê **Ahalî** derketiye.
- Serbestî di dema Mutarekeya Mondrosê (1918) de ji derketiye û carna di rûpelên xwe de cih daye nivîsen li ser Kurdan ji. Mesela, nivîseke **Kamuran Alî Bedirxan** bi navê "Kurdistan-3" di hejmara 2327 ya Serbestî'yê de (2 kanuni-sani 1919) heye.
- Qasî ku çavkaniyan Tirkan dinîvisin, rojnama Serbestî'yê wek organa Osmanlı Ahrar Fırkası (Partiya Azadîxwazê Osmanî) bû (binêre: **Tunaya**, r: 147).
- Li gor hinek çavkaniyan ji rojnama Serbestî'yê piştgiriya **Damat Ferit** dikir û dijî tevgera Kemalîstan bû (binêre: **Erzincan Tarihi**, r: 147-148).
- Çapxana Serbestî (**Serbestî Matbaası**)'yê ji di 1329 (1913-1914)'an de kitêbeke **Celadet Bedirxan û Kamûran Bedirxan** bi navê "**Edirne Sükutunun İçyüzü**" (Rastiya Teslimbûyîna Edirnê) çapkiriye (binêre: Hanioğlu, r: 432, 293, 319-321).
- Silvio van Rooy û Kees Tamboer** (ISK's Kurdish Bibliography, Amsterdam, 1968, Nr. 1, volume: B, r: 523'an de) dibejin ku rojnama Serbestî ji alî Bedirxaniyan di 1918'an de hatiye derxistin, lê, wekî ku me li jorê ji qal kir, xwedîye rojnama Serbestî'yê **Mewlazade Rifat** e.
- Ji bo rojnama Serbestî û Mewlazade Rifat binêre:
- Yalçın, Hüseyin Cahit**; Siyasal Anılar, İstanbul, 1976, r: 30, 69
- Türk Basın Tarihi, r: 107-108
- Malmisanji**, r: 51-52
- 52-Silos, r: 60
- 53-Wusa tê fêmkirin ku İsmâîl Wedad kurê Pîremêrd (Hecî Tewfîqî Suleymaniyeyî) e.
- 54-Xeznedar, r: 60
- 55-Bois, Thomas; "La presse Kurde", Encyclopédie de l'Islam, r: 487
- 56-binêre: Jîn, Kovara Kurdi-Tirkî: 1918-1919, cild: I, II
- 57-Derheqê Muhemed Mîhrî de ji bo malumatên zêde binêre: **Malmisanji**, r: 70-73
- 58-Ehmed, r: 233
- 59-Cebbarî, r: 148-149
- 60-Xeznedar, r: 6
- 61-Secadî, r: 559
- 62-Ehmed, r: 233
- 63-Ehmed, r: 94
- 64-Hanioğlu, r: 318
- 65-Xeznedar, Dr. Maruf; "Dr. Mistefa Şewqî Şairî Niştimanperwerî Xakî Mukriyan"
- binêre: **Mistefa Şewqî û Peyje**, sax kirdinewe w lêkolînewey: **Mumtaz Heyderî**, Hewlêr, 1985, r: 83-89
- Disa ji bo hejmara 8. 9. ya kovara Kurdistan'ê binêre:
- Dr. Maruf Xeznedar**, "Hendê Destnusî Kurdiyî Mînorskî le Leningrad û Du Rojnamey Kurdistan le Estemul", Govarî Rojî Kurdistan, no: 43-44 (kanûnî yekem 1977), r: 38-44
- 66-Li gor Elaeddîn Secadî, hejmara 37. ya kovara Kurdistan'ê di vê tarîxê de (7 receb 1338) derketiye (**Secadî**, r: 559
- 67-Silos, r: 60
- 68-Silos, r: 185
- 69-Zekî, M. Emîn; r: 190
- 70-Gürsel, Dr. İbrahim Ethem; Kürtçülük Gerçekî, Ankara, 1977, r: 190
- 71-Cebbarî, r: 149
- 72-Xeznedar, Cemal; r: 7
- 73-Xeznedar, Dr. Maruf; Le Babet Mêjûy Edebî Kurdiyewe Brîti ye le Çwarde Lêkolînewey, Bexdad, 1984, r: 148
- 74-Yê ku ji **S.B. Avanesav** neqîl dike: **Hasretyan, Prof. M.A.**; 1925 Kürt Ayaklanması, Jîna Nû Yayınları, Stockholm, 1985, r: 26
- 75-Wusa xuya ye ku ev tarîx şas e, çimkî 25 şubat 1341'ê Rûmî beramberî 1925'ê Mîladî ye.
- Ji vê rojnama Jîn'ê mebest, dibe ku kovara Jîn (1918-1919) be.
- 76-Hanioğlu, r: 297
- 77-Hanioğlu, r: 321
- 78-Silos, r: 185
- 79-Yê ku ji rojnama Akşam (7-5-1925) neqîl dike **Hasretyan, Prof. M.A.**, r: 70
- 80-General İhsan Nouri Pasha, La Revolte de l'Agri-Dagh/Ararat, Genève, 1986, r: 123, 129-130
- 81-Sasunî, r: 201
- 82-Silos, r: 112
- 83-Vedat, Sadîllîli; Türkiye'de Kürtçülük Hareketleri ve İşyanlar, cilt: 1, Kon Yayınları, Ankara, 1980, r: 128
- 84-Bulletin Mensuel du Centre d'Etudes Kurdes, no: 4 (1949), Paris, r: 2
- 85-Her di wê demê de li Îstenbol'ê ji alî Xarpêtiyan ('Elazîziyan) ji çend rojname bi Tirkî hatine derxistin. Rojnama mîzahî: **Kûrsubaşı** (1944-1959) ku xwendekarên Xarpêtiî derdixist û rojnama **Harput'ê** (1949) ji bo vê yekê du nimûne ne. Lê em derheqê naveroka van herdu rojnaman de zêde tişt nizanîn (ji bo van herdu rojnameyan binêre: **Sunguroğlu, İshaq**; Harput Yollarında, cilt: 2, İstanbul, 1959, r: 540
- 86-Şivan, Dr. S.A.; Kurt Millet Hareketleri ve Irak'ta Kurdistan İhtilali, r: 106
- 87-Şivan, Dr. S.A., r: 106
- 88-Anter, Musa; Doğu (Aylık Bilimsel Dergi), no: 1 (1969), İstanbul, r: 209

dewama rûpela 4' an

FERHENGOK

awirdan: bianiyana
axînim: axîna min
azî: dengê ji bo sitranê wek lê lê, hay lê, way way û hwd.
bî: bê
boro: were, bê
Caniman: navê gundekî ye li hêla Haymanâ'yê
ca: ca, de, çika, carekê
cay le riya: ca li riya
çuw: ço, çov
da wiçim: da biçim/dê biçim
de: di...de
de axirê: di axurê
de bira: de bila, de bira
de newalê: di newalê da
destit: destê te
destî tu: destê te
dê: têde, têda, hundur
dêrîn: êdf
diçiyay: diçuyî, tu diçuyî
dikerem: dikim
divistim: disekinim, radiwestim
dixwezî: dixwaze
diyer: 'esir
duye: paş, dawî, dû
dwête hînî: keça filanesê, dotê
elgirim: hilgirim
gal: gayan
gawan: gavan
girtige: girtye
girtin: girtin
gî: gişt, gişk, gi, gî; hemû, hemî, tev
hesp û gal: hesp û gayan
hewaman: hewa me
je: ji
ke: ku
kepir: kepir, wirane, xerabe
kirasem: kirasê min
ko: çiya
ko: kuda?
ko diçiyay: kuda diçuyî?
kune: pencere, pace, şibak; kun, qul
le destê min dan: li destê min dana
le duyam diyay: li dû min tê
le duyay: li dû wê/wî
le canit: li canê te
le verê: li berê/li ber
le verê yekî vistan: li yekî xistin

motir: motor/traktor
memik: memik, pêşîr
mêrd: mêt
nawçe: navçe, nav, navber, orte
Necatîn: Necatî (navê lêwik e)
nedikirdim: min nedikir
newu: nebe
nêdmê: nadim, nadime

nêxwerim (nêxwum): naxwim
nêvarî(ji "varîn"ê): nabare
nîm: nîv
nîmerû/nîverû: nîvro
nuya: pêş, ber
o: ew
pa: pê, ling
Pakê: navê keçikê
pal: pal (pala gir, pala çiyê)
pes: pez
pêkî: pakî
pirçit: porê te, pirça te

qay: qey
qe: qet
qereçadir: konê reş, qereçadir
qisay: qisê, qisê wê/wî
qul: qûl, insan

ra: ra/re, ji...re
ra mêrd: ji mêt...ra
ray: wê ra/wî ra, ji wî ra/ji wê ra
riya: rê
riyê male: riya malê
rûj: roj
rûjnê: ronahî

serim: serê xwe, serê min
sew: seb, seba, ji bo
sindirikî: qeydekî, qeyda hespan
sinig-e: sîng
suke: sing, qazix

şemşitarî: şeva tarî, hemû tarî, tarîşev
şivan: şivan
teli: têlek, têlekê; tayek, tayekê
vazî: bazî, lîstik
vindirandin: westandin, betilandin, qerimîn
vistan: sekinîn, westan

we: bi
we banî: bi ser...
we çuwê: bi çuyê, bi çoyê
wella: welleh
we min dê: bide min, bi min de
we parçey: bi parçekî
wer di: bi...re
werdit: bi te re, ber te, cem te
wêm(we min): bi min
wêm de: bi min de, bide min
wiçim: biçim
wikim: bikim
wikirdan: bikirana
wizanistan: min bizanî ba
xericiyay: xericiy, tu xerici, tu derbas buyî
xwînî: bixwîne
yam: eyam, bi 'ewr, 'ewroxî
zeftiyano: zeftkirî, şidandî
zûr: zor, zehmet



Du hunermendê kurd ji Gurcistanê

BESÊ CAFAROVA

- Di ûlona 1943'an de li Tibrîs'ê ji diya xwe bû.
- Di 1967'an de Dibistana Hunerî ya Y.Nîkoladzî xelas kir.
- Sala 1968'an li Akademiya Hunerî ya Tibrîs'ê dest bi xwendinê kir. Di beşê dekorasyonê de xwendina xwe domand, bû pispora hunermendiya tevnan.
- Sala 1972'an xwendina xwe xelas kir û li Tiyatroya Muzîkal a komedî xebitî.
- Sala 1974'an li Almanya Rojava beşdarê pêşanga (sergî) hunermendî ya tevnan bû. Di navbera 1972 û 1977'an de li Komara Gurcistanê çend caran beşdarê pêşangayan bû.
- Endama Yekitiya Hunermendê Gurcistanê ye.

ANTON MÎRZOYÎV

- Di 6-10-1950'î de li Tibrîs'ê ji diya xwe bû.
- Sala 1964'an, li Dibistana Hunerî ya Y. Nîkoladzî dest bi xwendinê kir û di 1969'an de xelas kir.
- Di navbera salên 1969 û 1967'an de li Akademiya Hunerî ya Tibrîs'ê xwend, beşê wênekeşî (ressamî) temam kir.
- Endamê Yekitiya Hunermendê Gurcistanê ye û beşdarê hemû pêşangayên komarê buye.
- Di 17-7-1980'î de cara yekem pêşangayeke taybetî vekir.
- Di tabloyên Mîrzojîv karekterê însan tê nişandan. Di bikaranîna rengan de jî hostayıya wî diyar e. Mîrzojîv xwedî stîleke taybetî ye.


dewama rûpela 8' an

ha bû, ba û bahozek wiha rabû hişt ku ew ji ramanên xwe şiyar bibe. Ariya kesê şewitî li ber bê rabû mîna ku bê melhebkirin. Her bi wir de diçû ba bi hêz xezeba xwe ji devê xwe bêtir davêt, dikir fîz-fîz wek marê teyar. Di vê navê re dengek kete guhêni Siwaro: "Herin ba melik... Herin ba sultân... Ew we dawetî ser dana xwe dike. Mîna her sal ewê dilovanî û xezeba xwe li we belav bike... Yênu ku neyin, ceza wan, wê ji ceza kesen salên berê mezin-tir be..."

dümahîk heye



B. Cafarova / 1979



A. Mirzoyev / 1972

Em nûsîney xiwarewe biritiye le kurteyekî ew witare benirxey Dr. Jemal Nebez, ke le salî 1974 da “Korî zaniyari kurd” legel dû witarî dîda le şewey kitêbek da le jér nêwi “berkurtêkî xermanî kurdnasî le Ewrupa” bilawî kirdotewe.

Çarçira be pêwîstî zanî ke ew witare be çend beşêk bilaw bikatewe. Ca beşî yekemî terxan dekeyn bo “Sedey nozdeyem” û beşekanî dîş ke le jimarekanî ayindegî Çarçira da bilawî dekeynewe terxan debêt bo “Sedey bîstem”!

”Kurte mêtûyekî kurdnasî le Elmaniya da”

Beşî yekem

Hewildan bo nasandinî Kurd be Elman mêtûyekî konî heye. Dûr nîye ew geşnameyey ke le salî 1473 da le layen zêrîngerî Bawariyewe Johann Schiltberger (1394-1427), bilaw kirawetewe, kontrin serçaweyekî Almanî bê ke nawî Kurdi têda hênrave.

Herweha yekêk le serçawe here konekanî Almaniya w Ewrupa ke le barey Kurd û wilatekeyewe edwên, raportêke bo boney yekêk le cengekanî dewletî Wismaniyewe le jimare (38) î govarî ”Tûrchiş-Estats- und kriegs- Bericht” da le layen ”Tomas von Wiering” nawêkewe le Hemburg, le mangî şubatî 1684 da bilaw kirawetewe.

Le sedey hejdehemî ferhengîda çend serçaweyekî Almanîman berçaw dekewê ke le barey Kurdewe edwên. Yekêk le wane basî geştêke ke nîbur (Niebuhr) nawêk Kurduyetî bo wilatî Ereb û ew wilataney der û drawsêy erebin. Le beşî duhemî ew geşnameyeda ke le 1766 da derçuwe, nuser basêkî leser Kurdiş nusîwe¹. Bêrg (Bergh) nawêkîş geştekî kirduve be Kurdistan û Ermenistan û Gurcistan û Enedol û Êraq da w namîlkeyekî lew bareyewe nusîwetewe w le 1799 da bilawî kirdetewe. Em kitêbe gelê nîgarî ciwanî têdaye w dû nexşey legele².

Le sedey nozdehemî ferengîda jimareyekî zor serçawey be zimanî Almanî nusrawman leser Kurd û Kurdistan dest ekewê.

Rastiyekî lem sedeye da nek her jimareyekî zor le zana Almanekan le barey ziman û edebiyat û mêtûy kurdewe xerîki lêkolînewe bûn û bes, belku gelêk lew elmananey rîyan kewtote Kurdistan, sa ûtir be îşûkarî taybetî xoyan bubê, ya bo pişknînî zanistane bubê, ya bo geştû gêl bûbê, ya bo îşukarî nihêni w siyasetbazî dewlete kaniyan bubê, leser Kurd û wilatekey, kem û zor, çak û xirap, nusîniyan bobecê hêştûn.

Eweşman nabê lebir biçêteewe ke çiroknusî elman Karl May (1842-1912) be bilaw kirdnewey çirokey "be naw Kurdistanî kewîda"³, nawî Kurd û Kurdistanî nek her le naw elmanekan da, belku le hemû Ewrupa da w le sinurekî yekcar firawan da bilaw kirdewe.

Nuserî em çiroke ne le naw Kurda jiyawe w ne Kurdistanî be çaw dîwe, belku deng û basekanî tenya be demî le dastan gêrewakanî ew serdeme bîstuwe. Leber ewe hendê le qisekanî ziyatir le qisey he-leq û meleq deçin, belam legel ewes da gelê layenî başı rewst û xu û corî bir kirdnewey Kurdî pîşan dawe, wek mîwendarêtî. Eger çî silî leweş nekirdotewe ke Kurd têkra be cerde w rîgir bidate qelem. Her lem çîrokeda zordarî w nalebarî sultanekanî wismanlışî pîşan dawe w derî xistuve ke kurd zû hel exeleterê û be qisey xoş û zimanî lûs tefre edrê.

Her lem sedeyedea (sedey nozdehem), Von Hammer -mêjûnusî nemsayı be naw bang û yekêk le nûseranî mêjûy dewletî wismanlı, le salî 1814 da basêkî lesor zimanî kurdî w şewe corcorekanî nusîwe⁴. Ca em base eger le barî zanistiye ewende giring nebê, ewa bêguman le barî mêjûyiye we nirkêkî zorî heye.

Le sedey raburdû da pêwendî siyasî w bazirganî dewletî wismanlı be dewletî prusiyay elmanewe zor be hêz bû. Her leber ewe gelêk esferî elman lem dewreda le supay wismanlıda xizmetiyan kirduve. Yekêk lewane Helmût Fon Moltike bûwe ke le diwayî da bûwe be fild marşalî supay elman. Moltike be hoy ewewe ke le leşkeri wismanî da esfer bûwe, naçar buwe dijî şorişgêre kurdekanî ew deme bicengê. lew namaneda ke Moltike le barey rewşî Turkiyawe le (1836-1839) bo jinekey nusîwin⁵, ewey le bîr neçotewe ke basî azayefî w dlîrî w siwarçakî w cengawerî kurd bika. ew basey ke lesor kurd û wilatekey nusîwetî⁶, be tewawî derî dexat ke fild Marşal Moltike ta ci endazeyek şarezay rewîst û xu û corî bîr-kirdnewey kurd buwe w ta ci radeyek dilî be gelî kurda çuve. Moltike le yekêk le namekanî da ke le Turkiyawe nusîwnî Lîwekrojî lewe kirduve ke kurdekan yek nagirin û kesiyan piştî ewî tiryan nagrê. Xo eger bêt û yek bigirn û le her kes bo xoyî dûr bikewnewe, ewa dujmîn le beryan da xoy nagrê. Moltike debêjê: "Her yekê lem (serok hozane) tenya lesor hozekey xoy ekirdewe. Bêhêzî em gele a leme daye. Xo eger yekîyanbigirtaye jêr ne ekewtin. Belam kesiyan nehatine ser ewey lesor ewî tiryan bikenewe. Le katêk da ke Reşîd paşa w Hafiz paşa nawçeyekîyan lîf eda, ewanî dî bewe dilî xo-yan xoş ekird ke agire sûre le xoyan dûre. ta sere ehate ser ewanî⁷.

Le sedey rabûrdû da jimareyekî zor le geştweranî Ewrupayî w Emrîkayî w le naw ewaneda jimareyekî zor Elman rûyan kirde Kurdistan. Em geştwerane zor ya kem, çak ya xirap, le barey geştekanî xoyanewe şîyan nusîwe. bo wêne:- Sandreczki nawêk le nîwey duhemî sedey rabûrdû da çote Musil û be kurdistan da gerawê heta geyîstote Wirmê w paş geranewey basêkî em geştey xoy nusîwe⁸.

Vûns "Wunsch" nawêkî Nemseyî geştekî be kurdistan û Ermenistan da kirduve w serncî xoy le barey em dû wilat û dû gelewe le dû kitêb da bilaw kirdotewe: Yekêkiyan be taybetî lesor kurdistane w le 1883 da derçuwe⁹, w ewî tiryan lesor Kurdistan û ermenistan w salêk diway yekem derçuwe¹⁰. Dr. Jemal Nebez deyan karî geştwer û zana elmanekanî bas kirduve ke sebaret be kurd û niştimanekî nusîwyane. Be daxewe ême boman nakirê ke her hemûyan lêreda binûsîn.

Mamosta Nebez lemar witarekey drêje dedaw debêjê: le naw em geştnamane da ke geştwere elmanekan le sedey rabûrdû da nusîwyane -her wek geştnamay hendê geştwerî ewrupayî tir- çend namîlkeyek ebînîn ke xawenekaniyan be giyanekî dujminanewe bilawiyan kirdotewe. Ewane pêş ewey biçne kurdistan hendê başı xirapiyan le barey kurdewe bîstuwe w ke çunete ewê tenya bo stî xirap gerawin. Xo eger sed başew mîwendarêtî w rûy xoş û dilpakiyan dîbê, karî tê nekirdûn û beser ew hemu çakiya de bazdiyan dawew be diway tanya xirapeyek da gerawin. Emca gwêyan nedawete ewey eger le Kurdistan da car û bar cerdeyetî w rîgrî w piyaw xirapiyek bûbê, ewe gûnahî Kurd niye, belku gûnahî şe-vey naqolayî berêwe birdinî kar û bare le layen Wismanî w Qacariyekanewe ke axay Kurdistan bûn. Eweş şayanî başe eweye kuştinî profesorekî Elman ke nawî Şults (Schultz) bûwe le 1830 da w giwaye le katî xoyda bo pişknînî zanistane çuve bo kurdistan. Herweha le nêwbirdinî culekeyeki Zêr Froş be destî kabrayekî derebegî kurd ke karbedestî Wismanî bûwe¹¹ yekcar bîrî hendê lew geştwere Ewrupiyaney têkdawe ke be diway binçîney karda negerawin, belku her le xoyanewew be hewes fermaniyan dawe beser kurd daw kurdian be piyaw kûj û cerde w rîgir û xwêr rîj dawete qelem. bo wêne: Fowler (Fowler) nêwêk ke giwaye sê salêk le nawçey Farisda jiyawe w geştekî kurdistanî kirduve, dû

berg kitêbî lesor em geştey derkirdûwe¹². Be silkirdinewe w dil le dildan kurdî be piyaw kûj û dilreq û xwênrêj dawete qelem. Moritz Vagner geştekî be kurdistan û wilatî Farisda kirduve w paş geranewey dû kitêbî derkirduve, yekékiyan derbarey nawçey Erarat û Ermenistanî jûrûwewe ye¹³ w ewî dîkeyan le barey nawçey Faris û wilatî kurdewe ye¹⁴.

Vagner le nusînekanî da, be taybetî le bergî dûhem da le gelê lawe, bê perwa, kurdî be cerde w xwêrêj û piyaw kûj dawete qelem. Serçaweyekî tirî lem babete kitêbêke le layen Baron Fon Nolde nawêke-we nûsrâwe¹⁵.

Belam lam waye em Noldeye Kurdistanî ya be başî nedîwe w tenya lamserlayî pêda têperîwe, ya eweta şitekanî le xelkî dî bîstûwe w Kurdistanî be çawî xoy nedîw. Emîş gelêk naw û natorey xirapî be kurdewe nave. Wêney em kitêbane be zimane Ewrupayîkanî dîkêş hen¹⁶.

Rastiyekey eweye çunke kurd ew deme kesî way nebuwe berberekanî ew dro û delesane bikat û tan-ya layek ke Kurdistanî pêşkêş Ewrupayîkan kirdbê her Wismanlîw Qacariyekan xoyan bûn, diyare ew dagîrkeraney Kurdistanî destêkî drêjiyan buwe le çespandinî ew tomet û buxtananeda beser gelî Kurd da. Bêguman hemu ewrupayîkî têgeyiştu dezanê, ke le hemu wilatêkî em serzemîneda, dizî w cerdeyî w piyawkwî buwe w debê, sa itir zor ya kem. Tenanet lem Almaniyaye da le salî 1972 da roj niye çend kesêk nekujrê, ya banqêk nebirdrê, ya pelamarî yekék nedrê, ya..., ya... htd.

Hîç neteweyekîş bewe nabête cerde w piyawkuj. Emey Kurdîş zor çak dezanîn, her katê daway fişe mafêkî xomanman kirdibê hezar naw û natorey seyrman lênrâwe. leber ewe ewende xoşê bûyn, ke em core qisane karman tê naken. Belam legel eweş da debê bêwiçan xerîk bîn û bîrûray giştî cîhan beramber xoman û meselekemanbecarê roşin bikeynewe. Ebê eweşman lebîr neçê ew Elman û Ewrupayîaney ke be zorî em beyt û balûraneyan xistote diway Kurd, ya nan xorfî dewletî Wismanlî -wate karbedestî dewletî turk bûn, ya ke hatûnète Kurdistan le layen turkekan û qacariyekanewe gwêyan be xirapî Kurd axinrawe. Bo wêne Fon Hemmer -wek lemewpêş nawman bird- mêtûnusêkî Nemsayı bûwe¹⁷ w yekêk buwe le waney ke zor le wilatî Wismanlî da jiyawe w bo turk karî kirduve. Em hem-mere zincîreyek kitêbî çend hezar lapereyî le barey mêtûnusêkî Wismanliyewê derkirduve. Le nusînekanî da gelê hûkmî nareway dawe beser kurd da. Çunke serçawey zanîyariyekanî Hemmer edebiyatî turk û siyasetî hikûmetî Wismanlî bûwe¹⁸. Herweha Frîdrîk Millingen ke Kurd be xwênxor de-date qelem¹⁹ karbedestêkî dewletî Wismanlî bûwe.

Zanay rûs Xalîfîn lem bareyewe debêjê: "Jimareyekî zor le serçawey rojawaiyekan ke le barey Kurdistanî sedey nozdeyemewê nusrânetewe, kurd be "diz û cerde" naw deben. Em core naw û natora-ne we nebê le hemu katêk da le rastiyewe nizîk bin"²⁰

Ewey şayanî bas û dilxoşîmane eweye em base zanistane w destkird û dro û delesane w em deng û bas û hewalaney ke bo kurd helbestrabûn le layen hendê geştwêr û xo be zana zanewe, karî le zana ras-teqînekanî elmanîya nekird û her le sedey rabûrdü da hendê le zanakanî elman û Ewrupa xoyan zor be ziman û edebiyat û mêtûnusêkî kurdewe xerîk kird.

Bo wene:

Frîdrîk Fon Bodenstêt le salî 1849 da basêkî zanistaney lesor goranî w awazî kurdî bilaw kirdewe²¹

Le salî 1857-1858 (3) sê berg kitêbî zanay be naw bangî rûs Peter Lerch kira be elmanî. Emane birûtî bûn le lêkolîneweyek le barey kurd û hoze kildaniyekanî Éranewe²².

Frîdrîk Müller (F. Mueller) û Nemsayı (3) sê berhemî le barey zimanî kurdiyewe pêşkêş kird. Yeké-kiyan basêke lesor ferhengokî kurdî w sîryanî²³ w ewî tir basêke lesor şewey zaza²⁴ w ewî tîrîşyan le-ser şewey kurmancî bakûr²⁵. Basî yekemyan le 1863 da w hî duhemyan le 1864 da w hî sîyemyan le 1894 da w her sekîyan le Vîena bilaw kirawnetewe.

Zanay Swîsreyî Albert Socin (1844-1899) ke profesorî beşî İslamewanî bûwe le zanistgey Laybizîk, be hawbeşî Egen Perin dû berg kitêbî derkird, be nawî Keşkolî Kurdiyewe²⁶. Lîreda gelê çîrokî folklorî w dastanî kurdî be wergêranî elmaniyewe bilaw kirdewe.

Zanay zimanewanî zor benawbangî elman w ewrupa profesor Theodor Noeldke (1836-1930) basêkî zor giringî lesor pêwendî wişey "Kardu" be "Kurd" ewe nusîwe le kitêbêk da ke pêşkêş be zanay elma-nî koç kirdû kiepert kirawe, le 1898 da le Berlin bilawî kirdotewe²⁷.

Efserêkî supay elman le ser şarî Silêmanî (ke Sinceqêkî Wismanî bûwe), herweha wilatî Êranî di-rawsêy Silêmanî, basêkî cugrafayî w mêtjûjî le barî serncî supayıyewe nusîwetewe. Em base nexşeyekî legele ke rewşî şarî Silêmanî betaybatî le dewanî Aşurî w Babilîyekan da exate berçaw²⁸.

Streich nawêk witarêkî le govarî “Aşurewanî” da bilaw kirdotewe w hewlî ewey dawe wilatî Kurdistan û Ermenistan û rojaway Êranî zemanî Babil û Aşur, leber roşnayî ew serçawê Babilî w Aşuriyaney ke be xetî bizmarî nusrawin bixate berçaw²⁹.

Mawêtî

Perawêzakan:

- 1) **Niebuhr:** Reisebeschreibung nach Arabien und anderen umliegenden Laender, Teil II (Die Kurden), 1766
- 2) **Bergh, J:** Anatoljen, Çeorien, Armenien, Kurdistan, Irak und Al. Dschesira, 1799
- 3) **Nawî kitêbêke be elmanî:** “Durchs Wilde Kurdistan” e, belam wişey “Wild”î elmanî lêreda manay “drinde w canewer” niye, belku ziyyatir “kêwî remeki” egrêtewê. Wata wilatêkî xiwa kird ke destî şaristanêti negeyiştuyetê.
- 4) **Von Hammer, Joseph, Freiherr:** Über die kurdische sprache und ihre Murderten aus dem III. Bande der Reisebeschreibungen Evlias in “Fundgruben des orient,” Band IV, s. 246-247, Wien, 1814.
- 5) **Von moltke, Hellmuth K.B. Graf Feldmarschall:** Briefe Über Zustaende und Begebenheiten in der turkei aus den Jahren 1836-1839, Berlin, 1841
- 6) **Von Moltke, Hellmuth K.B. Graf Feldmarschall:** Das land und Folk der Kurden, in vermischte Schriften Zur Orientalischen Frage, Berlin, 1892, Band II, s. 288-298
- 7) **Von Moltke, Hellmuth K.B., Graf Feldmarschall:** Briefe...etc, Ibid, Bd. II, s. 295
- 8) **Sandreczki:** Reise nach Mosul und durch Kurdistan nach Urumia, Stuttgart, 1857
- 9) **Wunsch:** Reise in Kurdistan, Wien, 1883
- 10) **Wunsch:** Meine reise in Ermenien und Kurdistan, Wien, 1884
- 11) **Millingen, Mayor Frederich:** The Wild life among the kurds, London, 1870, p.234 vgl. anch Fraser, J.
- Baillie, ESQ: Trevels in Kurdistan, Mesopotamien...etc. Vol. I, London, 1840, p. 62
- 12) **Fowler, S:** Drei Jahre in persien reiseabenteuer in Kurdistan, 2 Baende, Aachen, 1842
- 13) **Wagner, Dr. Moritz:** Reise nach dem Ararat und hoch-Armenien, Stuttgart und Tuebingen, 1848.
- 14) **Wagner, Dr. Mortiz:** Reise nach Persien und dem Lande der Kurden, Leipzig, 1852.
- 15) **Von Nolde, Baron Eduard:** Reise nach Innearabien, Kurdistan und Ermenien, Braunschweig, 1895
- 16) Bo Wêne temasay em serçawaney xiwarewe bike: **Millingen, Major Frederich:** The wild life among the kurds, London, 1870. Percy, Earl, M.P.: Highlands of Asiatic Turkey, London, 1901.
- 17) Birwane perawezî jimare “4”.
- 18) **Von Hammer, Joseph, Freiherr:** Geschichte des Osmanischen reiches.
- 19) **Millingen, Frederich:** Wild life among the Kurds, London, 1870
- 20) **Xalfin, N. A.** “Xebat le rêy Kurdistan da”, Moskva, 1963, lapere, 22 (be rûsi)
- 21) **Von Bodenstein, Friedrich Martin:** Lieder aus Kurdistan, in tausend und ein Tag im orient, Berlin, 1849-1850
- 22) **Lerch, Peter Ivanovitsch:** Forschungen über die Kurden und Inanisehen Nordchal daeu, 3 Bande, st. - Petersbourg, 1857-1858.
- 23) **Mueller, Friedrich:** kurdisches und Syrsches woerterzeichniss, Wien, 1884.
- 24) **Mueller, Friedrich:** zaz-Dialekt der kurdensmache, Wien, 1984.
- 25) **Mueller, Friedrich:** Kurmangi-dialekt der Kurdensmache, Wien, 1894.
- 26) **Albert-Socin und prym Eugen:** Kurdische Sammlungen, 4 bande, St.-petersbourg. 1887-1890
- 27) **Noeldke, Theodor:** Kardu und Kurden, in Festschrift fuer H. Kiepert, s. 71-81, Berlin, 1898.
- 28) **Billerbeck, A., Oberst A. D.:** Das Sandschak Suleimania und dessen. persische Nachbarlandschaften Zur babylonischen und assyrischen Zeit, Leipzig, 1898
- 29) **Streich M.:** Das Gebiet der, heutigen Landschaften Armenien, Kurdistan und West-persien noch bablonisch-assyrischen Keilschriften, in Zeitschrift Fuer assyriologie, XIII, XIV und XV, 1910

زمانی يهكگرتتوو . شەمەش بەھى شۇھى ئەو پىت گۆرئىنە - سا ئەھەر بەھىكى گوردىستاندا بىت -
گوربىنېكى ھەتا ھەتايى بىت و بۆمان نەبىت جارىكى تر دەستكارى بکەينەوه، بەلكو پىۋىستە
ما فى گۆرئىنى كۆملە پىت بۇ نووسىنى زمانى كوردى بە شىوهى بندەرتى و ھەتاهەتايى بپارىزىن
بۇ ئەو كاتھى ھەلۈمەرجى سياسى و كۆمە لايىتى و روشنىبىرى و ۰۰۰ هەت لەبار دەبىت و كىشەي
نەبوونى زمانى يهكگرتورىش كەمتر دە بىتەوه يان نامىنېت .

(+) - لەسەر داخوازى كاڭ حىمە ، وتارەكه، مان بە رىنۋەسە باڭو كەدۋەنە، كەبە خىرى
ئىچى نۇرۇنى بىوو .

”هەنگاوا ئىكىپەتىكىانە بەر وۇزمانى يەكىرىتوو“

زمانى يەكىرىتوو پەكىيە لە دىاردا كۆمە لایەتتىيە پېشىكەوتتۇو بە ھىزانە، كە كەفتۇر گۇ پېيىكە- رانى شىۋەزمان جىا جىاكانى زمانىك لە قەوارە يەكى پەتھوى نەتمەۋەسى بە ھېزىدا پېكەوە دەمە- سەتىتەوە، نەبۇونىيىشى ناپاتھوى و بىبەيىزى ئەقەوارە و يەكىتى يەدەبەخشىت .

يەكىيەك لە و گىرۇگرفته مۇلە قانە ئەمروز زمانى كوردى تۇوشىپەتاتۇو نەبۇونى زما- نىكە كە ھەممۇ كوردى- لە ھەر بەش و پارچە و شۇينىك بىت - ھەلسوكەوتى ئەددەبى و ۋوشنب - يىرى خۇبىي پېپەتەت . ئەوهى ئاشكرايە دوو شىۋەزمانە سەرەكىيەكەي كەمانچى خواروو و كرما- نجى سەرروو كە ئەمپۇرۇ لە كوردستان و لە ناو خۇينىدەوارانى كورد دا ئەمەن ھەلسوكەوتەيىان پېيىدەكىرىت، لە گەل جىاوازىيەكى دىيارى قەبارەنى نۇوسىن و ژمارەنى شارەزا و پىسپەرداڭ و جۇردى دەرفەت . جەڭەنلە ئىشلىرىنە لە ھەممۇ كوردى ئەمەن ھەنديك دەرفەتى تايىەتىدا بەكار دەھىنرىن .

ئەوهى شىباوى باسە پېيويستە ھەممۇ ئەمەن بىزانىن كە روودانى زمانى يەكىرىتوو بە زۇرە ملى و ھېيل بۆكىشانى سەر مىز و بىركرىدىنەوەي راستەخۇرى كەسىك ياخود كۆمەللىك نايەتەندى، بەلکو ئەم دىاردەيە لە ئەنچامى ھەلۇمەرجى سیاسى، كۆمە لایەتى، روشنبىرى ياخود ۵۰۰۰ دەت . لە يەكىيەك لە قۇناغە چالاکە مىژۇوپەيەكەن گەللىكدا دېتەدى . بە لام ئەمەش ئەمەن ناگەيەنپەت كە بە ناچارى چاوهەرىي رۈوداتنى ئەقۇناغەمىژۇوپەيە بېكىرىت، بەلکو رادەي ھۆشىيارى توپىزە چالاکەكەن كۆمەل بۇيى ھە يە بە ھەنگاوانانى پراكتىكىيائە لە سەرەتتاي قۇناغە چالاکە مىژۇو-

بېكەندا زە مىنە بۇ ئەم رووداوه گرنگە خوشبکەن و روودانەكەن نزىكىكەنەوە .

شارەزا و پىسپۇر و خۇينىدەوارانى دىلسۆزى كوردىش بە تايىەتى لەم سەرەتەمەن ھاوجە- رەخەماندا - ھەر ھەلۇمەرجىك لە كوردستان يان لە ھەنندەران بى رەفتەيدانى كەمەنەرخەمېيان لەم رووهە نە كردو، ج بە پېشىكەشىرىنى پېشىنیار و ج بە كۆرپەستنى لا بە لایان ئىاراستە- كراو ھەولىان بۇ ھېبانىمىدى ئەم ئامانجە داوه و بە پىيى توانايان ھەنگاوى سەرپىي يَا خىد ئازا- سەتكراويان بۇ ناوه، ھەرچەندە ئەم ھەنگاواھ نراوانە نە كەمەشتوونەتە ئاستى خواتى ئاما-

نجەكار، لە گەل ئەمەشدا بۇونى يەكىتى ئامانج و ئارەزۇوى گشتىيان سەلماندۇو .

گەلى كورد و ھەر گەللىكى تىرىش كە بارى زمانەكەن وەك ھەممۇ كوردى بىت پېيۇ- بىستە ھەولى ئەمەن بىدات كە بەزۈوپىي بەرە و ئەم ئاواتە گشتى يەھەنگاوا بنىت و سىتى و دۇولۇ ئەنۋەنپەت و ھەلۇمەرجى زەمینە خوشكەنلى بۇ بەرە خىسىنپەت، ئەم ھەنگاواھ پراكتىكىيە شە كە ئەمرو دەتواتىرىت بدرە و ئەم ئامانجە لەم رووهە بىنرىت ئەمەبە ھەولبىرىت زمانى كوردى بە ھەممۇ شىزەكايىنەرە لەم دوارۇزىكى نزىكىدا تەننیا بە يەك كۆمەلە پىت بىنۇوسىرىت ، يان بە ئەملف و بىيى عەرمىبى كە لە بە شە كوردستانى ئىران و ئىراقدا باوه، ياخود بە تىپى لاتىنى كە لە بەشە كائى ترى كوردىستان ۰۰۰ بەكار دەيىتىرىت .

ئەگەر بىت و بىرياردانىكى وا جىكىر بىت، زمانى كوردى ھەنگاوايىكى گەورە و گرنگ دەنپەت بەرە و پېشەوە و ھېيۋات ئەمە دەگىرىت كە ھەنگاوايى دىكەن بەدوا دابىت بەرە و روەدانى



- × - له ۱۹۵۰ لە تبلييس له دايىك بۇوه .
- × - له سالى ۱۹۶۴ لە قوتاپخانەي هونەرى بە ناوى / يَا . نيكولادزى / و رگيراوە و له سالى ۱۹۶۹ دا تەواوى كردوه .
- × - له سالانى ۱۹۶۹ - ۱۹۷۶ لە ئەكاديمىيەي هونەر جوانەكانى شارى تبلييسى خويندۇه ، بەشى هونەرى تەشكىلى تەواو كردوه .
- × - ئەندامى يەكىتى هونەرمەندانى گورجستانە و بەشدارى لە ھەمۆ پېشانگاكانى كومارى كردوه .
- × - له ۱۷ گەلا ويىزى ۱۹۸۰ بۇ يەكمەن جار پېشانگاي تايىبەتى بۇ ساز كراوه . لە تابلوكانى ميرزوبييفدا ، ھەست بە سەركەوتتىكى تەواو دەكرى لە پېشان دانى رەوشتى مروقۇ دابەش كردنى روناکى و بەكارھىيانى رەنگدا . ميرزوبييف شىوه و ستىلى خۇي ھەمە .

سەر چاوه کان

- ۱ - بىريارەكانى كونگرە و كوبونە وە كانى پارتى كومونىيىتى گورجستان ، بەرگى ۴ ، ۱۹۸۰ تبلييس .
- ۲ - كەتھلوكى پېشانگاي ب . جەعفەرۇۋا و ئەمنتون ميرزوبييف ، تبلييس ۱۹۸۰ .
- ۳ - هونەرمەندانى كورد ؛ تبلييس ۱۹۸۶ .
- ۴ - روزنامەكانى / زارى ئەستوک، فيچيرنى تبلييس، سوقىھىتسكى گورجستان / سالى ۱۹۸۰ .

پاشماوهى ل ۴۰

لەمber خويىدا دىتە قسە: "ئاخ بۇنىكى زۇر ناخوش دى؟ بەلام لە وەلامى خويىدا دەلى: ئەمۇھ بۇنى ئارمەھ لە من دى ۰۰۰ بۇنىكى تر دى؟ نازاتم بۇنى چىھ؟ - بۇنى مىردوھ ۰۰ کى مىردوھ؟ "

بەلام كە دىتە ژورھوھ چاوه بە زىنەكەھ دەكەھوئى: "بە چەشنىكى وا بى ئەندازە چاوى كراوەتمەھ، كە واى زانى داواى شتىكى لى دەكەت ۰۰۰" جەلال تۈووشى دوو دلى دى و سەرى لى دەشىيۇي، وە ھەست دەكەت تارامايەك بە دواي رادەكەت، ترسى لە سىبەرى خۇ دەكا ۰۰ بەلام كە بە خۇ دىتەمە و دەزانى كە نازاتپىن مىردوھ، يەكسەر رادەكەتە سەر شەقام و بە ھەمۇھ يېزىمەھ ھاوار دەكەت: " بە خۇوا مىرد ۰۰ بە خۇوا مىرد ۰۰ بەخۇوا بە تعنیا لە مالمۇھ مىرد و لە كچەمەھ زىاتر كەمى بۇ نەڭرىيا " .

محمدەمەد عەلى كوردى چىروكە كەھ بەم ووشانە كوتايى هيپاوه: "دواى سەر خوشى شىقى يە " .

بى گومان ھەل سەنگاندى هونەرى دارىشتن و شىوهى ئەو چىرۇكە، پېيپىستە لە روانگەھى سەرددەمى خۇي بىت . لە گەمل ئەھەشدا نووسەر تىيدا تا رادەيەك سەر كەوتوھ، بە تايىبەتى لە بەكارھينانى مەنھلۇڭ و روونكەرنەوهى بارى دەرەونى قارەمانى چىرۇك و ھەلبىزآردى بابەت و سەلماندى تowanاي خۇي و زمانى كوردى لە پەخشان دا .

سەر چاوه (۱) - ديارى لاوان - بەغدا، ۱۹۳۴ لەپەرە ۱۰-۱۸

پیشانگای دوو هونمرمه ندی کورد له گورجستان



له سالی ۱۹۸۰ بُو یەکەم جار له گورجستان پیشانگای شەخسی هونمرەندانی کورد بە سی جە عفە رۆقا و ئەفتەن میرزۆبیف کرايەوه . له تابلوکانى میرزۆبیف و تەھون و چىنىي بەسىّدا شەقلى نەتمەوايىتى و هونمرى مىلى كوردى زۆر بە ئاشكرايى دىاره . هونمرەندان له كاره هونمرى يەكانياندا سوودىيان له ترادىسىۇنى هونمرى مىلى كوردى و تاقى كردنەوه و ئەزمۇونى هونمرى تەشكىلى مىللەتىنى يەكىيەتى سۆقىيەت وەرگرتتووه . بەسىّ و میرزۆبیقۇپ بەشداريان كردوه له پیشانگاى كۆمارى گورجستان و كۆمارە يەكگرتتوه كانى سۆقىيەت و دەرەوهى سۆقىيەت دا .
كۆرتەمى زىيانى بەسىّ جەعفەمۇرقا

- × - له ۱۰ ئەمېلولى ۱۹۴۳ له شارى تبلىيس هاتومتە دونيماوه .
- × - له ۱۹۶۷ قوتباخانى هونمرى بە ناوى / يَا . نيكولاڈزى / تەمواو كردوه .
- × - له ۱۹۶۸ له ئەكادىمىيە هوننەر جوانەكان له تبلىيس وەرگىراوه ، له بەشى هونمرى رازاندنهوه (دىكەتىف) ، پىپۇرى له تەھون و چىنن وەرگرتتوه .
- × - له سالى ۱۹۷۲ خويىندى تەمواو كردوه و له تىاترى موسىقىاي كۆمىدى خەرىكى كارى هونمرى بوه .
- × - له سالى ۱۹۷۴ بەشدارى پیشانگای تەھون و چىنىي كردوه له شەلمانىيائى روزاوا ، هەروەها له نىيون سالانى ۱۹۷۲- ۱۹۷۷ چەندە شدارى كردوه له پیشانگاي كۆمارى گورجستان دا .
- × - ئەندامى يەكىيەتى هونمرەندانى گورجستانە .



نهبوون ، بهلکو همراه کاریک ههبوه ، به لام دووشت کوبانی دهکدهوه : ئەركى مىلى
بەرامبەر كولتوورى نەندوايەتى و خوشويىستى ھونھرى شانو گھرى و ھەستى ئەكتەرى .

دەستەي دامزرينه رو ئەكتەرانى يەكەم شانو
گھرى بىرىتىسى بۇون له : ئەند ازيار و شۆفېر
كىرىكار ، موجە خور و فيزىك(پىپۇرى فېزىا) .
نوبەرهى ھاوكارى و دىلسوزى ئەۋ مىۋقانە
پېشىكەش كردىنى يەكەم شانو گھرى كوردى بۇو له
زېر ناوى " ساجۇقىزا خۇبە مىرد دە دا "
شەۋ شانو گھرى سەركە و تىنېكى گھورەي وە دە -
ست ھىنا ئەۋە شەنائى لاوانى ترى دا كە
بىنە رىزى ئەدو تىپە و كومىمكى بىدەن ئەۋە -
ندە ئىمە ئاكا دار بىن ئەدو تىپە چەند شانو گە
رى ترى پېشىكەش كردوه . لە وانە : كۆمبىدى
" دراوسىكان " و " خەصىو " و " خەمبى
و سىابىند " ، ناوى ھەندى لە ئەكتەركان :
تەنگىزى مامۇ ، شىرىنى ئامۇ ، تازى خاستى ،
تەيمۇرى كەلاش ، بەسىرى مەممەد ، تىنە عباس
چەندەھاي تىز .



قىستيقالى كولتوورى كوردى لە گورجستان

لە سالى ۱۹۸۱ بە بونە ۶۰ لە سەرتى پەر
بونى دەستە لاتى سۆفييەتى لە گورجستان ئاهە -
نېڭىكى ۳ رۆزى كىردرە لە شارى تبلىس بو
كولتوورى كوردى . لەم ئاھەنگىدا كورى شىعر
و شانو گەرى و پىشانگاي ھۇ نەرى و گورانى
و ھەلپەركى كوردى پېشىكەش كرا . ئەم ئاھەنگە لە لايەن بەپرسىيارى ساندىكاي گشتى كرىكارانى
گورجستان ز . كىچاچادزى يەوه كرا يەوه و هەروەها نوپەنھرى كۆمەلى شانو و تىتاترۇ گورجستان ،
ئەكتەر گەلى سۆقىيەت د . ئەلىكىسدزى و تارىكى خويندۇھ و مىوانىكى لە مۆسکو و تۈركمانىيا و ئەرمەنیيا
و ئازىز بىجان بەشداريان تىدا كردىبو . رۆژنامە و گۇفارەكانى گورجستان بە دەھا رىپورتاتىزىان لە سەر
نووسىمۇ بە تايىيەتى زاريا قىستوک كازىيەھى رۆزە لات . شورگانى ناوەندىپارتى كۆمۇنيستى گورجستان
و چىرىنەمما تبلىس و سۆقىيەتى كورجستان . لمبارەي پىشانگاي ھونھرى مندانى كورد يەمىنى جەمعەفروقا
و ئەفتۇن ميرزو ۋېيىف عەزىز بەگىرۇف ، . ئەندامى ئەنچىجومەنلى بالا گورجستان نووسىييەتى :
لەم پىشانگايىدا راپور دودوارۇ و چارەنۇسى گەلەكەمان / كوردمان / رەنگى دايىتەۋە "

له ۱۰۰۰ کم خویندی بهرز٪ ۳، ۷

خویندی ناومندی٪ ۱۵

خویندی سمره‌تایی٪ ۲۶۷

ئوانه‌ی نه خوینده‌وارن ژماره‌یان تمنیا ۳۲۱ کمese " (۱)

ئه‌و دواکه‌وتنهش به‌پی‌ی بو‌چونی نووسه‌رانی ئه‌و راپورته ده‌گه‌ریته‌وه : " له ماوه‌یه‌کی زور کم ته‌ر

خه‌می و گوی نه‌دان به کورد و پیش‌تختنی کاری فیکری و پهروه‌رده له نیویاندا ، هروه‌ها به ده‌گم‌هن

بلاو کردنه‌وه په‌رتووک له‌سمر باری ژیانیان ، گرینگی نه‌دان به کاری سیاسی له نیویاندا ."

جا له برباره‌که‌دا چهند پل‌انیکی ریک و پیک دانراوه بو‌چاره سه‌ری ئه‌م باره و به‌رز کردنه‌وه‌ی راده‌ی

ژیان و کولتوروی کوردان . داوا له ئورگه‌نه‌کانی پارتی و ده‌ولمت و لاوان و کریکاران ده‌کات ئه‌رکی

سر شانی جی‌به‌جی لهم بوارده : برباره‌کان بربیتین له ۱۶ خال ، لموانه . دامهزرندنی کومملی هونه‌ری

وهونه‌ری میللى ، یارمه‌تی ئابوری بو‌ئه و جوره ریک‌خراوانه ، هروه‌ها دامهزرانی سیکشونی نووسه-

رانی کورد له یه‌کیتی نووسه‌رانی گورجستان و چاپه‌مەنی کتیبی کوردی هروه‌ها بلاوکرنه‌وه‌ی کتیب

له سمر ژیان و کولتورو و روی کورد له ژیانی کوماری گورجستانی سو‌فیه‌تی .

دوای چوار سال ، واته له سالی ۱۹۷۸ له کوبونه‌وه‌ی کومیتەنی ناومندی برباره‌ریکی تر و هرگیراوه

له باره‌ی جی به جی کردنی برباری سالی ۱۹۷۴ وه ، تیدا باسی ئوموه کراوهه تا چ رادیه‌ک کورد

پیش‌که‌وتني و ھدھست ھیناوه : له زانکو و ئامۆزگاکانی ده‌ولمت شوینى تایبەتی بو خویندکارانی

کورد تەرخان کراوهه ، به پی‌ی برباری کونه‌وه ، جا دېتە سمر ژماره‌ی نوی خویندکاران و بەراوردیان

ده کات و ده لی : ئەگەر له ماوه‌ی شەست سال له تەمەنی دەستە لاتی سو‌فیه‌تی له گورجستان دا ژما-

رهی ئوانه‌ی خویندی بەرزیان تەواو کردوه (۷۵) کمese بوه واته تا سالی ۱۹۷۴ ئەوه له سالی

۱۹۷۸ ژماره‌ی خویندکارانی کورد له زانکو و ئامۆزگاکانی گورجستان ده‌گاته ۲۰۰ خویندکار .

جگەلەوه‌ی که له نیوان سالانی ۱۹۷۸-۱۹۷۴ ژماره‌ی ئەو کوردانه‌ی بە ئەندامى ئەنچۈچۈمىنى شارى

تبليس ھەلبىزىراون گەيىشتوھە ۱۳ کمەس . ژماره‌یه‌ک له زانا و پىباوي لى ھاتوی کورد ئەركى دەولەت

بە جی دەگەينىن بو وېنە : عەزىز بەگىروف - ئەندامى ئەنچۈچۈمىنى با لاي گورجستانە ، كەريمى

ئەنچۈقىسى رۈزھەلات ناس و راوىزكەرى دەستگای کومىتەنی ناومندى پارتى كومۇنىستە ، لوسا ئالوپىقا

پارىدەرى پەوفىسىرى زانکو تېبلىس ، كەريم ناموپىيف دوكتورى ئابورى - سكرتيرى زانستى يەك

له ئامۆزگاکان ، و چەندەها زاناي تر . له گورجستان چەند شا عىرۇ هونەرمەندى کوردى بە ناوابانگ

ھەن وەك : عەزىزى ئىسکو و جەردۆي ئەسەد و مارف مەمىدۇفۇر و عەددۇي گەنچىو ، هونەرمەندان :

ئەنتۇن مىززوپىيف و بەسى جەعفەرۇۋا و ئەندۇي چىدارگۇوشى و شامىل نادرۇف .

چەند ووشيمىك له سمر شانۇ و هوتىرى تەشكىلى (تابلو و گرافيك) کورد له گورجستان . هەر

وەکو له سەرەوه باس‌کراوه ، له نیوان سالانی ۱۹۷۸-۱۹۷۴ چەند کومملۇ ریک‌خراوه‌ک دامز-

راون بە ئامانجىي پیشخستتى ژيانى کولتوروی کوردی گورجستان له وانه : کومملۇ ئەمرازى موسىقى

کوردى / ميللى / کومەلەھى موسىقا و گورانى نوی / ئىستراد ديسکو / ، هروه‌ها له مانگى دىسامبىرى

۱۹۷۹ تىپى شانۇي کوردى دامزراوه . له سمر ھتاوهتىپى شانوى کوردى دامزراوه له سمر

بنكەی ئەو دوو برباره‌ی پارتى كومۇنىستى گورجستان له باره‌ی کورده وە ئەو تىپە له سەرەتا وە

له لايەن چەند كەسانىك كه له خوبان را بىنیوھ كە بەم كاره هەلسىن ، هەر چەندە ئەكتەرى پەوفىسىنال

باری زیان و کوتوری توری گورجستان سوچیه ت

برو سک

له ژماره‌ی یه‌که‌می "چوار چرا" دا له سهر ئاوازو موسيقای کوردی ئهرمه‌نستانی سوچیه‌تیمان نووسی بwoo، له ماره‌یه‌ش دا به کورتی همندی زانیاری له سمر باری زیان و کولتوروی کوردی گورجستان بلاو ده‌که‌ینه‌وه، له‌گه‌ل پی‌ناسینی دوو هونه‌رمه‌ندی کوردی گورجستان به خوینه‌رانی "چوار چرا"

کوردی گورجستان یاخود ئهو کوردانه‌ی ئیستا له گورجستان نیشه جی بوبنیه؟ که‌ی هاتونه ته ئم ولاته؟ باری زیانیان چونه؟ چ پیشکه‌وتنيکیان وده‌ست هیناوه دواش شورشی ئوکتوبه‌ری مهمن؟ ۴۰۰۰ ۴۰۰۰

وهک له سمر چاوه میزوه‌یه کان بومن ده‌ردکه‌وه، ئهو کوردانه‌ی ئیستا له ولاته سوچیه ت ده‌زین زوربیان به ناچاری کوردستانیان به جی هیشتوه لمبه‌ر سته‌می زورداری عوسمانی یاخود له کاتی شهری نیوان پرووسیا و ده‌وله‌تی عوسمانی و ئیرانی سه‌فه‌وه و قاچاری دا . بی گومان توّمار کردنی میزوه‌یه هاتنی کورد و باری زیانیان له گورجستان شوینی له و تاره نابیت‌وهه مه‌بستی ئهو و تاره تم‌نیا رون کردنی هه‌ندی لایمنی زیانی کوردی گورجستانه .

باری خوینه‌واری کورد له گورجستان دا

له برياريکي کوميته‌ی ناوه‌ندی پارتی کومونيستی گورجستان دا که له ۲/۲۶ ۱۹۷۶دا وه‌گيراهه له‌سمر باری کورد له گورجستان نووسراوه: "هر چمند کان کورده‌کان دواي دامه‌زانی ده سته‌لاتی سوچیه‌تی له گورجستان پیشکه‌وتنيان و ده‌ست هیناوه، به‌لام له گه‌ل ئه‌وشدا تا ئیستا له هه‌موو گه‌لانی گورجستان دوا کوتوتونه بوئونه به پی‌ی ستاتستیکی سالی ۱۹۷۰ (زماره‌ی کورد له گورجستان ۲۲۰۰ هه‌زاره ، له‌وانه ۱۸۰۰ هه‌زاری له شاری تبليس "ژين جح)، زماره‌ی ئه‌وهی خوینه‌دنی به‌رزی تمواو کردوه له هه‌زار که‌س

ناگری نهوروز به شاپلیت و پرونگ ناکریت و
 زو و بینت خوله میش و تینی داب مریت و
 ناگری نهوروز به گیان و دل نه بشی واخوشکرنی
 گهربخور دیجله و فوراتی بینه سرنه کوزیت و
 هاتسو و گردشیت انه منعی جه زنی نهوروزت کرا
 لازمه گیانت به مردی بیخه به ژیر پیت و
 دهست و پی تیسکی شکاو چبلکه و چهوبیلی چاوه گه به
 لاشه هدر و هک داری ژنگه قلیشه کوزبکریت و
 خونینی لاوان نهوت و به نزین بینت و برزیت سه ری
 کلپه بینیکی وابسینی شه و قی دانه مریت و
 پیاو بزیرینی و کوشیتیری زیان هله مهت به ری
 ژن به دوری ناگرا بگری و بلاوینیت و

خوش نه بشی ٹهوسا بلیسیه ناگری نهوروزه کدت
 نهود حله سهیری گولی که چون ده می نه کریت و
 چند به خوشی بلبلی خوشخوان نه خونینی بو گولان
 چون چریکه سه رچلی عذرشی عظیم نه گریت و
 بهو زویانی حاله خوشه ئهم نزاید بتوئه کا
 ره بشی ئهم روزه هدمو و سالی بخوشی بینت و

من سه رو هری ولاتم و سه رداری قهومه کشم
 بمری به ئیشی ده ردی دل و ئیحتیقارة و
 من بیشم له بدر ره زای دلی تویان به کنیکی تر
 نامسو و سی کورده واری بنیمه که ناره و
 تنو ئه و که سه شن که وای و تسووه باش تی بگمن
 کوردنایه وی بژی بدله کهی عدیب و عاره و



شیخ نوری شیخ صالح

۱۸۹۸ - ۱۹۵۸

شیخ نوری شیخ صالح (م. نوری) یه کیکه له شاعیره همه‌رگه کانی سده‌هی بیستم، که دهستیکی با لای همه‌بووه له نوی خوازی و تازه کردنه‌وهی شیعری کوردی له تهک گوران و مشید نمی‌جیب دا ...

له سده‌هه تای اویه‌تی خودی داونه شیعر و نووسین و چهند زمانیکی روزه‌هه لاتی، جگمه‌هه زمانی سگماکی / کوردی / زور باش زانیووه . له سده‌هه تای بسته‌کاندا جا لakanه به شداری زیانی کولتووری کوردی کردوه و یه کیک بووه له نووسه‌ره کانی روزنامه‌ی "باغگی کورستان" و همه‌ره‌ها له سالی ۱۹۲۲ بويته سهر نووسه‌ره روزنامه‌ی "روزی کوردستان" .

شیخ نوری له گوفار و روزنامه‌کانی کوردی دا زور ووتارو شیعري بلاؤ کردوه‌وه، به تابیه‌هه تی له سالانی ۲۶ دا زنجیره و تاریکی گرینگی له زیانه وه بلا و کردوه‌ته له سرئه ده ب، به مهش شیخ نوری یه کم شدیبی کورده که هاتوه‌ته کوری لیکولینه‌وه و تیوری ئه‌ده ب به زمانی کوردی .

شیخ نوری روناکبیریکی لی هاتوو و شاعیریکی نیشتمان په روهری گهوره بووه و زور به گهرمی پیشه‌وازی له شورشی شیخ مه حمودی نهمر کردوه و چا لakanه هاتوه‌ته کوری خزمه ت کردن و خمبات .

شیخ نوری به بونه‌ی ده چوونی روزنامه‌ی "ئومیتی ئیستقلال" که له لایهن حوكه‌مه‌تی شیخ مه حموده‌وه ده ده چوو ، نووسیوه یه ق :

خوایه به سیه ئیتر لا به‌ری ده‌می جه وری اضمحلل

طلوعی پی بکه‌ی خورشیدی روزی پاکی ئیستقلال

له گهل خولیای هیجرتا به سه چوو عومری شیرینم

ده سا نوبه‌ی ویصاله ئاه ۰۰۰ئی ئومیدی ئیستقلال

لهم ژماره‌یدا ، پارچه هه لب‌ههستیکی شیخ نوری شیخ صالح پیشکه‌ش به خوینه‌رانی

چوار چرا ده کهین .

چوْرَه عارِه قه دهکات که شهوان نوشی دهکات له مهیخانه دا و گیانی مرؤّقایمته لاده مری.

ئه و شهوهی ژنهکهی له سهر مردن ده بیت ، داوای لی دهکات و لی دهپاریتمه که به تهنيا له گمل پیروزی نمیهیلیته و دهلى : " ژنهکهت تکات لی دهکات که شهويک له تهکیا دانيشی ، چونکه زور نه خوش و نزيکی مردنهه تی " . . به لام جه لال بهم جوْره و لام نازه تینی خیزانی که له سهر مهروگه دهاتهوه : " دويتی شهويش هر وات ئه گوت ، که چی هيچيش نه بو " . .
ئه و سا که پیروزی تاقه کچیان ، که تهمنی حفت سالانه ، دهبيتی باوکی دلی دایکه نه خوش و که دهشینی ، له باوکی دهپاریتمه و دهليت : " بابه - ئه و شهوله بمر خاتری دایکم له گهلمان دانیشه " .

ئه و چيروکهی ممحه مهد عملی کوردى راسته و خوّثاراسته ئه و جوْره که سانه کراوه ، که لاسای ئهوروپیه کانیا ن دهکرد له خوارف نهوهی مهی و ياری کردنی قومار دا . وا دیاره ئهم جوْره ره و شته له کوردستان و عیراق باو بوه ، چونکه ئه و بابهته له چيروکی عه ربی عیراقیش دا رهنگی داوهاتهوه .
بو چوونی ممحه مهد عملی کوردى له بارهی مهی خواردنهوه و رسیوا و توانبار کردنی ئه و جوْره ره و شتهانه له دوو چاوگمهه هملقلاوه . له لایمک دزی لاسا کردندهوی کوپرانه يه و له لایکی ترهوه بهره هلسنی کردنه لمو گورانهی له نیو شاره کان سمری هملداوه و وا له همندی مرؤوف دهکمن دورور که و نهوه له نیریهه تی کومه لايهه تی و پیومندیه کانی قوّناخی باوکایمته / پهتریارخی / که نووسمر له " رو- مان " ه کهی پروپاگندهی بو کردوه و به پیومندیه کومه لايمته کانی نیو گوند و خیله کانی دا هملگوتوه .

نووسمر و هک منهوریکی سه رده می خوی ، ئه و جوْره ره و شتهی به نه خوشی کوّهل زانیبوه و بويش به برهه کانی کردوه ، به لام نهک له روانگهی ثاینیه وه ، به لکو چاوگهی ره تسانالیزمه (عقلانیمت) وه بوی چووه .

جا ممحه مهد عملی کوردى هر چه نده جه لالی توشی مهی خواردنهوه کردوه و پالی پیووه ناوه که بی له ویژدانی خوی بندی بو چوریک ثارهق ، به لام ئه و شمان بو ده سله لمپنی که جه لال به تهواوی نه- خلیساوه ، به لکو ویژدانی ئازاری ده دات . که دگاته ممیخانه و له گمل يه کهم پیالسنه مهی بیری منال و ژنهکهی له میشکی په نگ دهاتهوه . نووسمر بهم جوْره ده ری دهبری : " مهی تامی جارانی نیه " نووسمر خوی تیکه ل روداوه که دهکات و ده بیزی : " لام وايده له نیو پیاله کمدا دبی کچه کهی لی ئه- پاریتموه

له چيروکه کمدا بو مان ده رده که وی که جه لال ۵ ساله تووشی مهی خواردن هاتوه ، به لام شهوي کاره- سأ تهکه کات زمیر دووی شه ده گمربیتمه ماله و ده بینی نازه ضئینی خیزانی چوون پال که توو که ئیواره به جی هیشتبو و هر وايه ۰۰ نووسمر د بیزی : " ئه و بیچاره بیه هر پالی داوهته سه رینه کهی تهختی نووستن و پیروزیش له تهنيش تیمه له سر کورسیکی تر دانیشته ، به لام سمری کردوته باوهش دایکی " جه لال له بمر سر خوشی له توانای نه بیو خهون له مردن جیابکاتوه ۰۰۰ به ده نگیکی زور له پر زوک بانگ دهکات : " نا ۰۰ نازه ضئین ۰۰۰ همتا ئیستا به خبری ۴۰۰ چوّتیت ؟ "

نووسمر باری ده رونی جه لال - مان وا بو شی دهکاتوه که ئازاری ویژدان و اله لال دهکات که خهون نه چیته چاوی و ده نوو سی : " بایه کی سارد هانه ژووره که وه ، پیاوه سه رخوش که هوشی هاتوه سه رخو ۰۰۰ نووسمر پهنا دهباته بمر مهنه لوگ بو ئه وهی ئه و راستیه مان بو بسله لمپنی و جه لال بو لایمه .

محەممە دەعەلىٰ كوردى

و ھېرۋەكى دواى سەرخۇشى شىتى يە

جەشىرىم بەرەرى

محەممە دەعەلىٰ كوردى، نۇوسەریكى لىٰ ھاتووى كورد بۇوه، كورد يېتىكى پەنتى و پوختى زانىوھە . تا ئىستا بە تەواوى بە سەر ھاتى ژيانى ئاشكرا نىيە، ھەر چەندە تا سالى ۱۹۵۷ ژياوه . ئۇوهى شا يانى باسەلە كاتى خۆى دا زۇر ھەولمان داوه لە رىگاى نۇوسەرانى كوردوھ زانىيارىمان وەددەست كەھۋى لە سەر ژيانى ئەو زاتە، بە لام بە داخھوھ ھەممو كۆششمان بە فېرۇچوھ، لە گەل ئەمە - شدا لەو بىرۋايىھ يىن كە روژىك بېت تىشكى بخىرەت سەر ژيان و ھەممو نۇوسەرە كەن ئەم نۇوسەرە . مەممە دەعەلىٰ كوردى، لە سەرە تاي سىيەكانەھە ھاتوھە كۆرۈ نۇوسىن و بلاو كەردىنەوە لە گۇفارو رۆژنامەكانى كوردى - كوردىستانى عىراق - و يەكىك بۇھ لە نۇوسەرانى " دىيارى لاوان " كە لە سالى ۱۹۳۴ لە بەغدا لە لايەن روناكبىيرانى كورد و بلاو دەكرايىھو . لە مىگۇفارەدا چىرۆكىكىي بلاو كەردىنەوە بە ناوى " دواى سەرخۇشى شىتى يە "، نۇوسەر لە سالى ۱۹۳۶ لە گۇفارى " روناكى " كە لە ھەولىيەر دەردەچوو بەرھەمېيکى ترى بلاو كەردىنەوە بە ناوى " نازدار يان ئىنىكى لادى " ناوى لى ناوە (رۆمان)، سىيەھى ئەم (رومانى) لە ژ مارە كانى / ۱۱، ۹، ۷ ئى روناكى دا بلاو كەردىنەوە / لە بەھى دووھەمى ئەم و تارە باسى لى ڈەكەين /، جەلە نۇوسىنە پەرت و بلاوەكانى ترى : مەممە دەعەلىٰ كوردى نۇوسىنېكى نۇوسەرى گەورەي فەرەنسىي جان جاڭ رۆســى لە عمرەبىيەوە وەرىگىرماوەتەوە كوردى بە ناوى " زادىچىج " لە پەنجاكان دا بلاوى كەردىنەوە . بىي گۇمان كەھمى ئەو بەرھەمانە لەپەر دەستمانان قىەگەرە دە خاتە بەر ھەلسەنگاندىكىي تەواو و دەست نىشان كەردىنى شوپىنى ئەو نۇوسەر لە ئەمەبى كوردىدا، بە لام لەگەل ئەمەش دا ، دەتوانرى بگۇتىرى كە پەخشانەكانى مەممە دەعەلىٰ كوردى و زمانىھە خوش و رەوانەكەمى ، لەپەرەيەكى مېزۇوى ئەمەب و زمانى كوردى تومار دەكەن .

دواى سەرخۇشى شىتى يە (1)

ئەو چىرۇكە باسى كارەسات و بە سەر ھاتى مەروفيكە كە تەتەخەشى خوارەنەھە مەھى دېت، ئۇوهش دەبىتىھە هۆى كەم تەرخەمى و بىي بەزەيى بە مال و مندال و ژن ۰۰ بەلکو ھەمموو بە قوربانى ئە و

کورم ئەمە دوو جاره ئەم زىنە دېتە ماللمان، توش لىرە نىت ..
رولە خىرت دەگاتى عەرزوحالىكەمى بۇ بنووسە، پارەمى نىيە بە نووسىنى بىدا ۰۰۰ تىۋوو
بۇوم ئىستا كاتى عەرزوحال نووسىنى
ويستم هەزار بەھانە بۇ شەم پېرىھ زىنە بىدۇزىمىوه، بەلام کە پېرىھ ژىن دېتى من قىسە
ناكەم، دەستى هەل بىرى بۇ ئاسمان و ووتى :
- كورم ، خوا مەحاشىت دە دىنار بى، بىي بە عاجى، بىي بە قومسۇر، بە دل ساردى يە -
كەھوھ پى نووس و كاغەزم ئامادە كەرد، دەستم كەرد بە نووسىن . دەم نا دەم پېرىھ زىنە كە
دەبۈوت ، " ئا ۰۰۰ بە قوربانت بى " كورى دەرى كىرىبو، زىنەكەش شەكتىلى كەدەكىد، داواى -
پارەلىلى دەكىد، دەبۈوت: كورم ئىش پى ناكىرى، چۈن ئىش بىكم ، ناتوانىم بە تەفاوى بىروم .

نازانىم چى بىكم ۰۰
دايىك بىمەسىيىتى ووت ، رولە چاكت كەرد ، ئەم زىنە كورىكى دەولەمەندى ھەمېيە ، دايىكى
دوکانىكى بۇ دانا و بەسايەت ئەم دوکان، پا رەپەيدا كەرد. پاشان زىنيشى بۇ ھېنغا
ئىنجا كورە و زىنەكەمى پېرىھ داكىيان دەركەرد .
- ئەمرى بە خوا كورم ۰۰ تىغانم بۇ دانا ۰۰ كەردىم تجارتى كە هيچى نەبۇ ۰۰ ئەمرى بە خوا
هيچى نەبو جىڭىز تاقانەم بۇ چۈن بى ئىشى بېبىن ؟ باوكىشى مردوھ، چەك و خشلى خۆم
فرۇشت، تىغانىكى ئاۋەدانم بۇ دانا، هەتتا نەمرۇم ئىشىم بۇ ھېنغا . دەست و لاقى پىياوه گەورەكە -
نم ماج كەرت تا بىكەنە خاۋەن قۇنتەرات لَا حەسکەرەكان، ئەم چاوانەم كۆر بى ئەگەر خراپەيىكەم
بۇيى بى ئىنجا ئەم چوار مانگە لە مالى دەرى كەردىم ، من قوربەسەر كە نۇ مانگىلە سكى خۆمدا
ھەلم گىرت، دوايىش سە سال نە نووستم ، ئەمرى بە غەنۇس سە سال نەمەك بىگرى ئىنىش لە
خەمودا بىم .

پېرىھ زىنەنەسييەكى ساردى هەل كىشا ، و وتنى ، پېرىار كە گرانە تا گرتىبى سەھاتەك بەرم نە -
دا، ھەر تەرعە ئىشىم بۇ كەرد . ۰۰ بە كورى خۇ بىلىپ نويزىشىم بۇ دەكەرد، دەستم ھەر لە ئاسمان
بۇ ۰۰ شەو روۇز دوعام دەكەرد چاك بېبىتەمە ئىستاش دەركراوم لە كون و قوژبىنان ئەگەرمىم، نانى
شەۋىيم نىيە دويىنى چومە لای ، داواى ئىتىكى لى بىكم تەشتىكى پىر، ماسىي سورەكراول لە بەر دەم
دابو، بۇ حەسکەرەكانى دەبرىد، ئەم چاوانەم كۆپۈر بى، پىشكە گوشتىكى نەدامىن
كورم ئىسان پېر بۇ، وەك منالى ساواى لى دى، حەز لە ھەمە مو شتىكى ئەكادا. ئەمرى بە پېغەمبەر
ھېچى نەدامى بە حەسكەرەكانى دەرىكەم بۇ ۰۰۰ ئىستاش رولە نەم دەزانى چى بىكم ، تاڭو دايىك
كورى ساغ بى پىمى ووت شاكلات بکە، نەھەقەلى وەرگەرە، وە ئىستاش توى حەمر درېز ئەم
خېرەت كەرد وە ئەم حەرزوغانەت بۇ نووسيم .

ئىنجا پېرىھ دايىك بە خىش خىشى كلاشەكەى، بە تەقەتمەقى دارەكەلى لە پېش چاوم وون بۇ ، وەدەم
بە دوغاوه چوھە دەرەوە ، ئىتىر نەم زانى چى بەسەر ھات
پاش ھەشت سال ، لەمگەل ھاوارىكائىم لە گەران بۇوم رىگامان كەوتە سەر گۆستەنەك، لە نكادا
چاوم كەوت بە پېرىھ ژنىكىك: پېرىھ ژنىكى سەر و پۇتەلەك شىپواو، رووت رەجال، زۆر كەساس، بە
كزىكەوە لە تەمنىشت گۆزىكەوە، لەپەرو روو كەوتبو بە ئاستەم نۆزەرى ئەھەت ، وەك باران خورە
خور فرمىسىك بە چاوابا ئەھەتە خوارەوە ، ئەبۈوت:

دایک

(۱) بیسان مسنه فا

گوقاری "چوار چرا" ناو به ناو نیازی همیه، ئمو چیروکانه بلاو بکاتمهوه که یمک جار بلاو بويشمهوه و میزوجویان گهریتمهوه بـ (۴۰ - ۳۰) سال لە مو سمر ، بـ مە بەستى ئە وە خوینە ران بـ بەرهەمی چیروکی کوردى قوتاخى سمر هە لدان و رادەی هونھەری ئمو چیروکانه بناسینى و هەروەما خوینەر بـ رادەی پېشکەمەوتى زمانى ئەمدەبى كوردى ئمو زەمان و ئىستامان دا بناسينى .

ئىستاش لە بيرمه ، وە هەر چەند سالەكانى پېشىو دىنەمەوه پېش چاوم دىتە بيرم پېرەزنىيکى بىر ، بـ قەدى بارىكى ، بـ پېستى چرچى ، بـ ئىسقانى بەرزى ، بـ قىزى سپى شىپواوى دىتەوه بـ چاوم بەللى ، ئىستاش هەر لە بيرمه و چیروکە كەپەتھواوى شەزانم ، هەر چەندە سەر- نجى بـدەمى ، ووشەكانى پارچە پارچە كە لە دلىكى بـ رىندار و خەمناكەوه دەھاتنە دەرەوه ، دىنە پېش چاوم

ئىستاش بـ چاوى خەيال ئەي بىنیم و ووشەكانم گۆيلى يە ..

چۇن لە بىرى كەم ؟ ها .. چۇن لە بىرى كەم من خۇم بەدەستى خۇم عەرزوحالەكەم بـ نووسى ، و لمەنەنېشىتەوه دانىشتبوو بـ دەنگىكى كزو نزم و بارىك ، بـ دلىكى بـ كۈل و جوشەوه ، بـ قولپە قولپى گريانەوه ئەييوت و ئەنم نووسى

ئەمە پېش چواردە سال بـ وو .. رۆزىك بـ مال ئەھاتمە وە دەنگى پېرە زنىيک گۆيلى بـو :

ئەرى قوربان ئەفەندى نەھاتەوه ؟ گەلىك ئەفەندىم لە رىگا دى بـ و مالەوه ئەچوون .. چاوم ھەلبىرى ، سەپەرى ئەم لاو ئەو لاي خۇم كەدە لېت ناشارمەوه تۈورە- بىش بـ ووم ، چونكە خونيانىمى / ئەم وشەيە بـ ومان نە خویندرابەوه / لى بـ رى زنىيکى پېرىرى چەماوهى پشت دە رېپەريووم دى ، دارىكى خوارى بـ دەستەوه بـ وو هاتە پېشى ، كلاشە دراوهەكى لە دوا خۇي كېش شە كرد و دوعاي چاڭى بـ ئەكىرىدە ..

دايىكم ووتى :

- ۱۶) پ.ئی.تیرمین، " راپورتیک بمو گهشته‌ی ۰۰۰۰۰ " ۰ ل ۱۹۷ .
- ۱۷) کور حوسین پاشا سروکی هیزی حمیده‌رانلی بwoo. یهکیک بwoo له فیوادالله گهوره‌کانی سه‌ردنه‌می خوی، خاومنی ۳۰۰ گوند بwoo و ده‌سه لاتیکی سیاسی فراوانیشی به‌سره و لایه‌تکانی سه‌روروی نی - وان‌هه‌ردو پارچه‌ی کورستاندا همبوبوه .
- ۱۸) شیخ عهدبول قادری شه‌مزینی (۱۸۵۱ - ۱۹۲۵/۲/۲۴) سه‌رکردنه‌یه‌کی گلاسیکی به ناوودنه‌نگی کورد بwoo. سه‌رکردنه‌یه‌کی " تعاون ترقی جمعیتی " (۱۹۰۸) و " کورستان تعاون جمعیتی " (۱۹۱۸) " بwoo . دوای هه‌رده‌سه‌ینانی شورشی شیخ سه‌عیدی پیران، له لایه‌ن ئتاتورکه‌کانه‌وه له سیداره درا . پیره‌میردی نهمر له یهکیک له هونراوه‌کانیدا بهم جووه‌ی له‌سره ده‌بیزی :
- شیخ قادره ره‌ئیسی هه‌مو خاندانی کورد میراتی جمددی کمر بwoo به لا بwoo به ئیرسی برد .
- ۱۹) م.لازه‌ریف. " مه‌سله‌ی کورد " ۰ ل ۱۵۹ .
- ۲۰) شایانی باسه که به هوی ئهو هه‌لوپسته‌ی شیخ عهدبول قادره‌وه زوربه‌ی جه‌ماوه‌ری کورد لی‌ی ته‌کیمه‌ره و باوه‌ریان بهو دامودهزگه نوچیه‌ی ژون تورکه‌کان نه کرد و وه‌شون شیخ تمه‌های نایری که‌وتون. ئینجا تور - که‌کان زور بی شرمانه ده‌ستیان له شیخ عهدبول قادر به‌رداو که‌وتنه ماستاو سارکردنمه‌وه بو شیخ ته - های نایری .
- ۲۱) سه‌باره‌ت به پیووندی عهدبول ره‌ماق بمدرخان به روو‌سیاوه، (بروانه: ژماره ۲ ی چوارچرا) .
- ۲۲) م.س.لازه‌ریف. " مه‌سله‌ی کورد " ۰ ل ۲۲۰ .
- ۲۳) همر شه‌وی . ل ۲۲۹ .
- ۲۴) " تیرمین به ئاشکرا بو حکومه‌تی روو‌سیاوه نوسيبوبو که سوود لهو ده‌رفته وه‌رگیری و کورد به گز تورکه‌کاندا بکمن . (بروانه: پ.ئی.تیرمین، " راپورتیک بمو گهشته‌ی ۰۰۰ " ۰ ل ۱۹۸ .
- ۲۵) م.س.لازه‌ریف. " مه‌سله‌ی کورد " ۰ ل ۲۲۹ .

باشماوه‌ی ل ۲

- کولله‌که‌ی روح رو هیزی ئه‌ژنوم رو گریکی دلم رو بربره‌ی پشتتم رو روناکی چاوه کزمکانم رو وهی روله رو .

کاتی چوومه پیشه‌وه چاکلی وورد بومه‌وه، ناسیمه‌وه که شمه شه و پیره ژنه کلوله يه که هاته مالله‌وه و عرزوحالله‌کهم بو نووس .

(۱) -ئیحیان ماسته فا - له سالی ۱۹۲۰ له هه‌ولیر له دایک بwoo و همر له‌ویش خویندنی سه‌رتای و ئاماده‌ی تمواو کردوه . کولیجی حقوقی له به‌غدا تمواو کردوه . هاتوته کوری چیروک نووسین له سالانی شه‌ری دووه‌می جیهان دا، دوو چیروکی له گوقاری " ده نگی گیتی تازه " دا بلاؤ کردومته / دایک ، سکالای مردو /، له پنچا کاندا کوچمه‌له چیروکیکی ئاماده‌ی چاپ کرابوو، به‌لام که‌وتنه لای ماموستا محمد‌محمد ته‌وفیق ووردی، له کاتی گیرانی ووردی چیروکه‌کانیش له ناو چوون .

له باره‌ی ئیحیان ماسته‌فا و، ماموستا حسین عارف نووسیویه‌تی ده‌بیزی : " ئیحیان مسته‌فا تمنها به دوو چیروک هاتوته کوره‌وه . به‌لام به هرمداری و وه‌ستای خوی وه‌ها سلماندوه که ده توانيين بلىن ئه‌گم بر ده‌واه بوايه له سه چیروک نووسین و ده‌ستی لی هه‌ملنگرتاییه ، لهوه بwoo له کوری چیروکی کورديماندا ببوايته چیروک نووسیکی لی هاتووه گهوره و خزمه- تیکی زوری بکردایه . (حسین عارف ، چیروکی هونه‌ری کوردی، به‌غدا ۱۹۷۷، ل. ۸۱-۸۲) .

- (۳) م.س. لازه‌ریف. "مسهله‌ی کورد". موسکو، ۱۹۷۲
- (۴) پ.ئی. متیرمین. "راپورتیک بهو گهشته‌ی سهنجاقی ههکاری و وولایتی وان، سالی ۱۹۰۶ دا". تیفلیس، ۱۹۱۰
- (۵) له سمهده‌ی نوزدهدا روسیا سیاستیکی خو نزیک کردنه‌وهی له گمل کوردا همبشو، که ئه‌ویش بو ممهه ست و بهرزه‌وندی خوی بوو که له شمره یه‌اک له دوای یه‌که‌کانیدا (۱۸۰۶ - ۱۸۱۲، ۱۸۵۳ - ۱۸۷۷، ۱۸۷۸) به گز تورکیایاندا بکات. بروانه: د. که‌مال مزه‌هر. "کورستان له سالمکانی شمری یه‌که‌می جیهاندا". بـه‌غدا، ۱۹۷۵، ل ۱۶. (به کوردی)
- (۶) "ولاتان و میللمتانی روژه‌لاتی نزیک و نیومه‌است". کوردناسی، بـه‌رگی ۱۲، یـهـریـان، ۱۹۸۵، ل ۶۹.
- (۷) پ.ئی. ئهـفرـیـانـوـف. "پـیـشـانـدـانـیـکـیـ بـارـیـ ئـهـتـنـوـگـرافـیـ وـ سـوـپـایـیـ وـ سـیـاسـیـ نـاوـچـهـ ئـاـسـیـاـوـیـیـکـانـیـ ئـیـمـپـرـاـتـورـیـتـیـ وـ سـمـانـیـ". تـیـفـلـیـسـ، ۱۹۱۲، ل ۱۲.
- (۸) ف. مینورسکی. "کـورـدـ". هـوـلـیـرـ، ۱۹۸۴، ل ۱۷۳. (به کوردی)
- (۹) "کورده‌کانی ده‌رسیم بـهـرـدـهـوـامـ بهـ گـزـ دـهـوـلـتـیـ وـ سـمـانـیدـاـ چـوـونـ،ـ بهـ تـایـبـهـتـیـ لـهـ سـالـیـ ۱۹۱۰ تـاـ ۱۹۱۴ شـورـشـیـ دـهـرـسـیـمـ بـهـ سـهـرـکـرـدـهـاـمـ بهـ گـزـ دـهـوـلـتـیـ وـ سـمـانـیدـاـ چـوـونـ،ـ کـهـ بـهـ مـهـ لـاـ سـهـلـیـمـیـ زـازـاشـ بـهـ نـیـوـ بـانـگـ بـوـوـهـ دـزـیـ ژـوـنـ تـورـکـهـکـانـ درـیـزـهـیـ کـیـشاـوـهـ لـهـ مـایـسـیـ ۱۹۱۴ دـهـ لـاـ سـهـلـیـمـ وـ هـاـوـکـارـهـکـانـیـ لـهـ پـیـشـ قـوـنـسـ وـ لـخـانـهـیـ روـوـسـیـادـاـ لـهـ سـیـدـارـهـ درـانـ". بـروـانـهـ: دـ.ـ جـهـمـالـ نـمـبـهـزـ.ـ گـوـهـارـیـ نـیـشـتـیـمانـ".ـ (بهـمـوـ)ـ نـهـیـ تـیـپـهـرـیـوـونـیـ چـلـ سـالـ بـهـ سـهـرـ گـوـهـارـیـ نـیـشـتـیـمانـ".ـ دـاـ لـهـ تـهـمـوزـیـ ۱۹۸۳ دـاـ بـنـکـهـیـ چـاـپـهـمـهـنـیـ ٹـازـاـدـ سـوـیدـ ۲۵۹۷ لـکـ.ـ ۱۹۸۵ فـ.ـ لـ ۶۴.ـ (بهـ کـورـدـیـ وـ بـهـ ئـهـلـمـانـیـ)
- (۱۰) م. لازه‌ریف. "مسهله‌ی کورد". ل ۲۲۵
- (۱۱) هـمـ ئـهـوـیـ.ـ لـ ۲۳۵.
- (۱۲) هـمـ ئـهـوـیـ.ـ لـ ۲۲۸.
- (۱۳) د. جـهـلـیـلـ جـهـلـیـلـ.ـ "چـهـنـدـ لـاـپـهـرـیـهـکـ لـهـ مـیـژـوـوـیـ ژـیـانـیـ کـوـمـهـ لـاـیـمـتـیـ وـ سـیـاسـیـ کـورـدـ لـهـ کـوـتـایـ سـهـ دـهـیـ نـوـزـدـهـیـمـ وـ سـهـرـهـتـایـ سـمـدـهـیـ بـیـسـتـهـمـداـ".ـ سـوـیدـ.ـ ۱۹۸۵، لـ ۱۹۸۵، لـ ۱۱۵-۱۱۶.ـ (بهـ کـورـدـیـ)
- (۱۴) د. جـهـلـیـلـ جـهـلـیـلـ.ـ "چـهـنـدـ لـاـپـهـرـیـهـکـ ۰۰۰۰".ـ لـ ۲۲-۲۱، لـ ۹۹-۸۹.
- (۱۵) بوـ وـیـنـهـ هـاـوـرـیـ یـاسـرـ مـنـدـهـ لـاوـیـ ئـهـوـ شـتـهـ بـهـ رـاـسـتـ نـازـانـیـتـ وـ دـمـبـیـزـیـ کـهـ "لـهـ بـهـ ئـهـوـهـیـ هـورـدـهـ بـوـ رـزوـایـ کـورـدـ کـهـ تـبـوـوـهـ ژـیـرـ کـارـتـیـکـرـدـنـیـ بـورـزـوـایـ تـورـکـ وـ عـارـمـبـ وـ فـارـسـ،ـ نـهـیـانـ دـهـوـیـستـ بوـ کـورـدـسـتاـ نـیـکـیـ سـهـرـبـهـ خـوـ تـیـکـوـشـنـ".ـ بـروـانـهـ: (الثقـافـةـ الـجـدـيـدـةـ.ـ گـوـهـارـیـکـیـ مـانـگـانـهـیـ پـارـتـیـ کـوـمـونـیـسـتـیـ عـیـ رـاقـهـ).ـ نـیـسـانـیـ ۱۹۸۶، لـ ۱۲۲، لـ ۴۹.ـ (بهـ عـارـمـبـیـ)
- (۱۶) ئـیـمـهـشـ دـمـبـیـزـینـ کـهـ گـوـمـانـ لـهـ کـارـتـیـکـرـدـنـمـداـ نـیـیـهـ،ـ بـهـ لـاـمـ تـیـکـوـشـانـ بوـ ٹـازـاـدـیـ کـورـدـسـتـانـ پـیـشـ دـهـسـتـهـیـ هـورـدـهـ بـورـزـوـایـ کـورـدـیـشـ،ـ شـوـرـشـهـکـانـیـ دـیـکـهـیـ سـمـدـهـیـ نـوـزـدـهـیـمـ ئـهـوـ رـاـسـتـیـهـ دـهـسـلـعـیـنـ.ـ گـمـ هـاـوـرـیـ یـاسـرـ مـنـدـهـ لـاوـیـ بوـیـ نـهـکـراـوـهـ چـاوـ بـهـ رـوـزـنـامـهـ وـ چـاـپـهـمـهـنـیـکـانـیـ ئـهـوـ سـرـدـهـمـهـیـ کـانـدـاـ بـخـشـ یـنـیـ،ـ ئـهـوـاـ گـهـلـهـکـ سـهـرـچـاـوـهـیـ دـیـ بـهـ زـمـانـهـ ئـهـرـوـوـپـایـیـیـکـانـ لـهـ رـوـزـنـامـهـکـانـیـ "التـاخـیـ"ـ ۱۹۷۰ـ
- (۱۷) دـاـ بـهـ کـوـمـهـلـهـ زـنـجـیرـهـیـهـکـ وـوـتـارـ بـهـ زـمـانـیـ عـارـمـبـیـ بـلـاـوـکـراـوـهـهـوـهـ ۱۹۷۴

بخاریت‌هود که ده‌بیتیه هوی ئال‌لۆزبۇونى بە تاييەتى ناوجەكانى سەر سنور ۰۰۰ ۰۰

ھەمان ھەلويىستى روسىيا بەرامبەر بە بزووتتەنەوە كانى خوارووی كوردىستانىش (ناوجەھى سۇران و بادىنان) دەبىنин. بۇ وېئە: راپەپىنى شىخ عەبدول سەلامى بارزانى دىزى دەولەتى و سىمانى نەك ھەر پىشتىگىرى نەكراو داواكانى پشتىگۈ خاران، بەلكو روسىيا تەقەلاشى دەدا كار بىكاتە سەر شىخى بارزان كە لە داھات تووشدا دىزى حکومەتى تۈركىيا ھېچ جموجۇلىك نەنۋىننى" (۲۲) ۰ ھەر لە ھەمان سال (۱۹۱۲) دا بۇ كە ژمارەھى دوانزىدە ھەزار كەس لە ھۆزەكانى جاف بىرياريان دابۇ دىزى تۈركىيا بىجەنگىن و بىدەنە پال روسىيا.

لە نېۋەر استى گولانى ۱۹۱۳ شدا نويىنەر شىخ مەحمودى بەرزنجى (احفید) خۇدانە پال كوردى بە رۇو سىاوه بە بالىوزى روسىيا گىرس لە تۈركىيا راگىيەند، بە مەرجىيەك كورد خاونى ھەمان دەسەلاتى خۇبىت لە ناوجەكانى سولىيمانى و كەركوك دا، كوردىش ئامادەبى خۇپىشان دەدات بۇ ھاواكارى كىرىنى لەشكىرى روسى لە رۇوی ئازۇوقفو شتومەكى پېۋىستى تەرەوھ" (۲۳) ۰ دواى ئەۋەش بە چەند مانگىيەك لە راپورتىكى دىدا كە لە لايەن قۇنسۇلى گشتى روسىياوه لە بەغدا ئەرلۇف كە بۇ حکومەتەكەن نوسيبىي و دۇبىارەي كىردبۇرە كە كورد ئامادەھەممو ھاواكارى كەركىن لەگەل روسىيا. ئەرلۇف ئەۋەشى دەست نېشان كردىبو، كە مەسىھە يەكگەرتى كوردىستان بە نىسبەت روسىياوه، ھەرۋەك كورد خۇبىيەت دەكتەمە، بە وېئە، ئۇ بارودۇخە سىاسىيە بۇخاراوه ھېقى يَا ناوجە نېۋە سەرەخۇبىيەكانى ھەند و دەبىت بە نىسبەت ئىنگەلتەرمەوە. لەگەل ئەۋەشدا بىروراى ئەرلۇف وابۇ كە ھېچ خۇبەستنەمە كەن سىاسى بەھە مەسىھەمە نابىتىت گرى بىرىت، و لە ھەمان كاتدا زۇر گومانى لە دلىپاکى كوردو خۇ ئامادە كەردىيان بۇ كە دىزى حکومەتى تۈركىيا راپەپن" (۲۴) ۰

لە لايەكى دىكەمە و نەبىت كە تۈركەكان ئاگایايان لە ھەممو جموجۇلىكى سەرگەرەكانى كوردو پىيۇمنىيان لەگەل دېپلوماسەكانى روسدا نە بوبىت، ھەرچەندە تۈركانى لا و ئەۋەشيان باش دەزانى كە روسىيا ھاواكارىيەكى تەواوى كورد ناكات، لەگەل ئەۋەشدا بەرده وام نارەزايى خۇ دەرمىرىو داواى بە دەستمەدانى ئەۋەش سەرگەرە كوردە دەكەد كە لە قەفقاس پەنابەر بۇون.

لە راستىدا ئەم گەلەپى و نارازى بۇونەتى تۈركەكان وەك ھەرەشمەيەكىش وابۇ كە روسىيا چاوترىسىن بىكەت، كە لە ھەمان كاتدا خۇ نزىك كەردىمە ئەلمانەكان لە تۈرك مەترسېيەكى زۇرى لە رىي بەرژەمەندى ئابۇو رى و سىاسىيە ج روسىيا و چ ئىنگەلتەرمە و فەرەنساش درووست كردىبو. تەنانەت كار گەيشتىبۇوه ئەۋەھى لە كۆتايى سەددەي نۇزىدەيم و سەرتەتاي سەددەي بىستەمدا كەپىتالى ئەلمانيا دەست بىگىت بە سەر گەلمەك نا و چەھى ئابۇورى گەرنگى تۈركىيادا، بە تاييەتى لە رۇوی درووستكەرنى ھېلى ئاسىنىھەوە. جا ھەرچەندە روسىيا ھەممو بەرژەمەندىيەكى ئابۇورى و سىاسى لە ئاسىيابىچوڭدا كەوتبووه كوردىستانەمە و بە تەمائى و لاتە عارەبىيەكان و بەھى ئەورۇۋپاي تۈركىيا نەمابۇو، لەگەل ئەۋەشدا نەيدەھەۋىرا ج بە ئاشكراو ج بە نەھىيىتى يارمەتى كورد بىدات.

بىسماقان

(۱) پ. ئەقىرىانوْف. "كورد لە شەرى روسس لەگەل فارس و تۈرك دا، لە سەد سالەي سەددەي نۇزىدەيەمدا"

تېفلیس، ۱۹۰۰ ،

(۲) د. جەليلى جەليل. "راپەپىنى سالى ۱۸۸۰ ئى كورد" ۰ مۆسکو، ۱۹۶۶

- کانی سهر سنووردا ژماره‌یه‌کی زور له چه‌کداری کوردی خپ کرده‌وهه نهک همر ئمهوه بەلکو له و دیوی کور
- دستانیش، به تایبەتی له ناوچه‌ی ورمی ژماره‌یه‌کی دی له بەگزاده کوردەکانی شکاکیش (که تا سالی
۱۹۰۹ دووزمنی خوینه خوئی تورکەکان بیون) بۇ هەمان مەبەست چه‌کدار کردو کردنیه دۆستی تورک و دو
- وزمنی رووسیا .

(۲) ئەم بۇ چون و جموجولەی شیخ عەبدول قادر وە نەبیت کاریکى کردبیتە سەر ئەو هەلۆیستە نا را .
- تەنی رووسیا بەرامبەر بە کورد، بەلکو بە پیچەوانهوه، جگە لهوی کە رووسیا ھیندە تر بەرامبەر
بە بزووتنەوهە کورد بى باوهە تر کرد، لە هەمان کاتدا زیانیکى گەلهك گەورەشى بە کورد بزووتنەوهە
- گەیاند، چونکە نەتمەوهە کورد جگە لهوی گرفتاری سیاستىکى گەلهكبارى رووسیا و لاتەه رۆز ئاوا
- بى يەکان و ئىزان و تورکىا بیوو، لە هەمان کاتدا ھەندى جار بە دەستى سەرکردەکانى کورد خوش فري
- وى دەخواردو سەرلى لى دەشیویندرا، چونکە ئەو رك و كينه پېرۈزەي كە لاي کورد دىز بە تورکەکان درو
- وست ببۇو بە هوی ئەو جۆرە هەلۆیستانەوە خاموش دەبوبوه (شایانى باسە كە کورد زوو بە هوش خوئ
ھاتەوهە نە چووه ۋىر بالى ڙون تورکەکانەوە) ھەستى پاترىوتىز ميا، نى تا رادىيەك لاواز دەکرد .

جگە لهو شیخ عەبدول قادر تاكە سەر کردەی کورد نەبۇو کە نەيدەتوانى يارمەتى و دۆستايەتى رووسیا بۇ
کورد مسوگەر بىكەت، بەلکو چەندانى دېكەي وەك ئەويش نا ئومىدېيان بە دەست رووسیا ھاوسيييانەوه
چىشتىبوو . بۇيە راستر واپۇو لە بىرەتى چەکدار کردى کوردو خۇ دانە پال ڙون تورکەکان لەگەل سەرکر
- دەکانى دېكەي کورد دا بۇ يەكتىيەتكى بکۈشايمە، كە لەمەدا چەند قازانچى بۇ بزووتنەوهە کوردايەتى
دەبۇو ھىنەدەش دووزمنانى کورد و لاتە زەبەلاخەکانىش چاوابىان بە هەلۆیستى پېشۈوبىان بەرامبەر بە مە
- سەلەی کورد دەخساندەوهە حىسابىكى دېكەييان بۇ دەکرد .

جا هەرچەندە بزووتنەوهە ئازادىخوازى کورد خوئى لە بەرمەتەکى نەتمەوهە دا ياخود رىكخراوېكى
سیاسى يەكىرتوودا كە سەرکردايەتى بىكەت كۆنەکردىبۇوه، بە لام مەسىلەی سەربەخۇبى و يەكىرتنەوهە
ھەردوو پارچەی کوردستان بە گشتى خەباتى زۇرېھى کورد ببۇو، كە بۇ وەدەست ھینانى ئەو ئامانجەش نەك
ھەر داوا لە رئىنۆنى رووسیا كراوه، بەلکو بەردهوام داواي يارمەتى و پالپىشىشى لېكراوه . بۇ وېنە
لە سالەکانى (۱۹۱۱ - ۱۹۱۲) دا کوردەکانى ناوچەسى سەر سنور بە سەرکردايەتى شیخ تەھاھى نايىرى پە
- ناياب بۇ رووسیا بىردووه، سەمکۆي شەكاك و تەيمۇر جانگۇ و عەبۇل رەزاق بەدرخانىش (۲۰) بە دەيان جار
دەلسۆزى خوپان پېشان داوه و داواي يارمەتىيان لى کردوون . هەرچەندە تاقولۇق پېشىنیارەكانى کورد لە لايە
- نەندى لە دېپلۆماسەكانى رووسەوە نەخىندرارون، بۇ وېنە: قونسۇلى گشتى رووسیا لە تەورىز پېرىئە
- بەرەزېنىڭى دەيگۈوت " سمايل ئاغا (سەمکۆ) تەنبا كەسى شەكاك كە منمانەي بە حەكومەتى فارس دەکرد
(لەو سەرددەمەدا رووسیا بالى بەسەر باکورى رۆزئاواي ئىزىاندا كېشىبابوو، و رىنمايى كەرى حەكومەتى فار
- س بۇو - ك.ع) و لە هەمان كاتىشدا دۆستىكى ئاشكراي حەكومەتى رووسیا يە . ناوچەي شکاکىش كە نە
- كەوتۇتە ۋىر دەسە لاتى تورکەكانەوە (تورکەكان تا سالى ۱۹۱۲ ناوچەيەكى فراوانى کوردستانى قاچار
- ئى يان داگىر کردىبۇو، كە لە وېيدا دەزگەمودايرە خوپانيان دامزراپىپوو، و خاۋەننى گشت دەسە لاتىك
بۇون - ك.ع) تەنبا بە هوی جا لاكى ئەمەوه بوبو " (۲۱) . بە لام لە لايەن دەسە لاتدارانى ناوەندى رووسیا وە
ھىچ بايەخىك بە پېشىنیارانە نە دەدران . هەر چەندە رووسەكان وايان پى باش ببۇ كە ئەو ناوچانەي بەدە
ست سەمکۆي شەكاكومنەن ھەروا بىمېننەوهە، بە لام لە هەمان كاتدا رازى نە دەبوبون كە سەمکۆ ھىچ جموجولىك
نۇئى تورکىيا بىنۇنى، ئەمەش بە ئاشكرا لە نامەتەكى گىرس دا دەرەدەكەوى كە بە مېزۇوی ۱۹۱۲/۵/۲۱
بۇ وەزىرى ھەندەران " سۆزانەف " يەنسىبىوو كە " ئاگادارى سەمکۆ بىرىت و لە گشت جموجولىك دوور

همروهک لمه و بیریش دهستان بُوئمه راکیشا که له سهرهتای سهدهی بیسته‌مدا قوناغیکی نوی
 له میژووی کورد دا درووست بُو، ئه‌هیش دامهزراندنی چهند ریکخراویک و کومله‌ی سیاسی و کردنوه
 - ی بانه کولتوروی و ده‌کردنی رۆزنانه بُوون (له لایمن دهسته هورده بورزو او منه‌هه کان "روناکبیرا
 - ن" و سمرکردنه کلاسیکی کورده) ، که له بارودوخی ئابوروی و کومله‌لایمته و سیاسی و فیکری کورد
 - ستانیان ده‌کولی‌یهوه (بروانه: ژماره‌کانی رۆزنانه کوردستان و چاپه‌منه‌یه کانی دیکه‌ی سهرهتای سه
 - دهی بیستم) و همولی چاره‌سەرکردنه کیروگرفته‌کانیان دهداو مەسەله‌ی کوردیان بُو جوره‌ی هەبوبو به
 دانیشتوانی ده‌ولمته سیمانی و میللەمانی ده‌رهه دهناشی. بیگمان گرنگترین ھنگاوی شو ریکخراوا
 - نه دوزینه‌هه چاره‌یهک و جی‌به‌جی کردنه مەسەله‌ی کورد بُو که خمباتی ھەموویان به گشتی له ئازاد
 - ی کوردستاندا یهکی ده‌گرتمهه "(۱۴) . هەرچەندە شووه ریباپیکی ئاشکرا بُو له بزووتنەهی ئازادی.
 - خوازی کوردیدا "(۱۵) ، به لام ھەممو مەرجە خویی و مەوزوعیه‌کانی نیوچوی کوردستان له پیناواي به
 ئەنجام دانی ئەو درووشمەدا ئاماذه چاره‌سەر نەکرا بُو، که ئەمەش ببۇوه ھۆیکی کاریگەر پتەر پال به
 سەرکردنه کانی کورده (کور حوسەین پاشا شیخ عەبدول قادرى شەمزینی و عەبدول رەزان بەدرخان و
 شیخ تەھا نایری و ۰۰۰ هەند) بنى باوهر به پشت بەستن و يارمەتی دەرمەه بکەن، به تايیمەتی به روویس
 - ياي ھاوسی کورده، تەنامەت جەماوه‌ری کوردیشیان بُو پشت بەستنە ئەستور کرددبوو، کە تەنیا
 دوستی راستقینە کوردستان ئەوان. روویش له هەمان کاتدا دەرفەتی لهو ھەمو کورپی و ناتەبایییه
 - ی کوردو ئەو بارودوخه دژواره‌ی کوردستان وەرگرتیوو کە سیاستیکی فروفیلاؤ تەلەکەباری له مەسەله
 - ی کورد دا بەکاربىنی . "۰۰۰ گەر ھات و ئەوانه (مەیستى کورده . ۰. ک.ع ادزى تورك زابن - جىگرى
 قونسولى رووپیا له وان له راپورتیکیدا دەبىزى - تەنیا بُو مەبەستىکە، کە ئه‌هیش سەربەخویییه
 ئىمە (مەبەستى لە رووپیا - ک.ع) هەر بُوئەی ئەو جوره سوزەیان پى بەمەن، دەتوانین بیانجولى
 - نىن و بەگز تورکە کانیاندا بکەن "(۱۶) . جىگە لەھەی رووپیا دەبەیست تورك و لاتە ئەوروپىايىھەك
 - نىش بەھوی مەسەله‌ی کورده و چاوشىنىن بکات له هەمان کاتىشدا نەك ھەر باوهر به کورد نەبوبو
 بەلکو تا رادەبەکى باشىش بُو تىكىدان و ناكوکى نانەهە نیو سەرکردنه کانی کوردىش كارى كردوو، خۇ
 ئەگىنا دەبىت ج ھۆیەك واي لە رووپەكان کردىبىت يەكىكىي وەك كور حوسەین پاشا (۱۷) وەك پەنابەرپەك
 لاي خوييان گل بەنه‌هەو و گومانىش له سەرکردەبەکى وەك شیخ عەبدول قادرى شەمزینى (۱۸) بکەن و بە دو
 - وزمنى خوييانى لە قەلەم بەدن(۱۹) . کە ئەمەش لە راستىدا بە سوودى کوردو رووپەكان نەگەرايمە،
 چونكە سەرکردەبەکى وەك شیخ عەبدول قادر (ھەرچەندە له پیناواي ۋوتۇنۇمى بُو کوردستان له چوارچىو
 - ھى دەولەتى و سەمانيدا تى دەکوشما) بە وېنەي گشت کورده نەتمەمەيىيە کانى دىكە (له راستىدا ھورده
 بورزوای کورد بېرى کوردا يەتىيان لە سەرکردە کلاسیکەوە وەرگرتوو) دەبىيست چارەنۇوسى دوا رۈزى
 کورد بە رووپیا و گرى بىدات . جا پشتگۇ خستن و ھاوكارى نەکردنى كورد كارىكى زۇرى كردىبوو سەر ،
 شیخ عەبدول قادر ، کە دوو ھۆ لە ئەنجامى بەرپىچ دانەهە شیخ دا بەرامبەر ئەو ھەلۋىستە دەبىنەن:
 ۱) شیخ عەبدول قادر وەك سەرکردەبەکى کلاسیکى کوردا (له بوارى ئايىنى و کومله‌لایمەتىدا نیوپانگىكى
 گەورەی لە نیو سەرۋوک ھۆزۈ جەماوه‌ری ھەردو پارچەی ئەو سەرددەمەی کوردستاندا ھەبوبو، ھەرۋەها لە
 بوارى خمباتى سیاسى " دامهزراندنی ریکخراوى سیاسى و سەرپەرشتى کردنى رۆزنانەو چاپەمنەی " دا
 له نیو ھورده بورزو او روناکبیراندا پلەو رېزۇ بايەخىكى كەم وېنەي ھەبوبو) بُو دژایمەتى کردنى ئەو ھە
 - لۇپىستە رووپیا لەگەمل ۋۇن تورکە کاندا رېکەوت و ئەو سۆزەشى پىدان كە بەگز سوپای ئىرمانى قاجارى
 دا بچىت (کە ھاودوستى رووپیا بُوون) و بُو ئەو مەبەستەش كەوتە جەموجۇلىكى فراوان و لەسەر نیچە

- لیک بو کورد نه کریت، ئەوا نه کاریان بو ده چیتە سرو نه بایە خیشیان له کوردستاندا پى دەدریت .
تمنائەت عەبدول رەزاق بەدرخان (ھەرچەندە مافیکی رەوابی خۆی بۇو کە سوود لهو دووبەر کییە رووس - یاو وو لانانی رۇزئاوا بو بەرژە وەندى کورد وەرگریت اجاروبار گلەبى خۆی له روو سەکان بەو جۆرە دەکرد ؟ گە رەواکارى و پشتگیرى کورد نەکەن، ئەوا ناچار دەبیت روو له ئەلمانەکان بىكەت" (۱۰) .

ھەرچەندە ھەواکارى کردنى کورد له بوارى کولتۇورى دا سەركەوتتىيکى سیاسى رووسىيا بۇو له کوردستاندا ، بە لام ئەو پېشىنیار انەدى دېكەچىرىکەن بۇو کەنەنەدیك قوتا خانەدى دى لە چەند شوپنەيکى ترى کوردستاندا ، بە تايىبەتى لە برادۇست و سوماى ، لە لايەن دەولەتى رووسىيا وە هېچ پېشىوا زېكى لى ئەتكەرا ، كە لە راستىدا ئەمەن نەك پېۋەندىيەكى پوخنەتى بە بوارى کولتۇورى يەوهەم بۇو ، بە لىکو ھەرۋەك ئۆزبىلى دەبىزى "ماناوا بەرژە وەندىيەكى سیاسى سېشى بۇ ئىمپراتورىتى رووسىيا لە رۇزەھە لاتدا ھەبۇو" (۱۱) .

ئەمە واو جا با بىزانىن بېرورا و ھەلۈيستى قونسۇلخانەكانى رووسىيا له کوردستاندا بەرامبەر کورد بە گشتى چۈن بۇو ؟

لەو بارەيەوە ئارشىفەكانى سیاسەتى ھەندەرانى رووسىيا پەن لە گەلەك سەرچاوهە بەلگەمى بە - كەلەك ، كە ھەلۈيست و پېۋەندى دېپلۆماسەكانى رووس لە مەسىلەدە کورد دا دەخەنە روو . لە لايىمكى دېكەوە ھەمان ئەو سەرچاوانە سیاسەتى ناونەندى رووسىيا بارەگاى سوپاپى قەفقاس (كە گەلەك جار دىز بە بىرورا و ھەلۈيستى دېپلۆماسىيەكانىان بۇون) پېشان دەدەن ، ئەمە جەڭ لەھەي كە سیاسەتى دوور روو - بىي قەيىسەرەكانى رووس بەرامبەر بە کوردۇ مىللەتە ناموسۇلمانەكانى کوردستان و تۈركىيا و مەدرەخە - ن ، كە ھەموو ئەمانە جىي سەرنج و لېكۈلەنەوەن .

گەر بە درېزايى سەددەي نۆزدەيمم ، قەيىسەرەكانى رووس بارى ناھەموارى کوردۇ دواکەوتتووبي و نەبۇونى رېكخراوېكى سیاسى كوردىيان كردىبووه بەلگەمەك بۇ يارمەتى نە دان و پشتگيرى نە كەنەنى بزووتنەوە ئازادىخوازى كوردى (۱۲) ، سا ئىيەم ئەمەن بە راست نازانىن ، چۈنکە بەرژە وەندى رووسىيا سوتابۇو تا ئەمەن بەكتە ھۆيەك ياخود كوسېپىك بۇ يارمەتى نەدانى کورد . خۇ پشتگيرى كەنەنى مىللەتە ناموسۇلمانەكانى کوردستان و تۈركىيا (لە بەشى دووھەم ئەم ووتار ما دەسىرى دەدۇبىن) و ھەولۇدان بۇ بال بەسەر اگرتىيان لمبىر ئەمەن بەبۇ كە خودانى رېكخراوى سیاسى خۆيان بۇون ، بەلگۇ لە راستىدا ھە - چ يەكىكى لە وانە (جەڭ لە ئەرمەنەيەكان نەبىت) بەرنامە و رېكخراوېكى سیاسى رېكىپەن نەبۇو ، بگەرە گەلەك جار ئەو گەلە ناموسۇلمانانە لە ڙىز بزووتنەوە ئازادىخوازى كوردىدا دىرى دەھەلتى و سما - نى جەنگاون .

ئىنجا دەبىت بىزانىن لە سەرتاي سەددەي بىستەمدا ھەلۈيستى رووسىيا بەرامبەر بە کورد چۈن بۇو ، كە كاتىيەك كورد بۇو خاونى رېكخراوى سیاسى و رۆزىنامە و چاپەمنى خۆي (لە سالى ۱۹۰۰ دا يەكەم پار - تى كوردى " پارتى عەزمى قەويى درووست بۇو " ۱۳) و بىي چانىش سەركەرەكانى کورد بۇ دوستايەتى و بە ھېز كەنەنى ھاوسىيەتى و زامن كەنەنى پشتگيرى رووسىيا تى دەكوشان ؟

ھەرچەندە دوو ھەلۈيست و بىرورا جىاوازى دېپلۆماسىيەكان دەسە لاتى ناونەندى رووسىيا لە كو ردستاندا دەبىنин ، بە لام ھەردووكىيان خزمەتى بەرژە وەندى سیاسى رووسىيايان كردووهە لەو بارەوەش كو - مەللىك بەلگە هەن كە ئەو راستىيە دەسەلەمىن ، كە پېش ئەمەن ھەندىكىيان لى دەست نېشان بەكەن بە پېۋىستى دەزانىن ھەلۈيستى سەركەرەكانى ئەمەمە كوردستانىش بەرامبەر رووسىيا بەخەمینە روو .

- وام له لایمن کورده وه پیشناوار ده کراین کوْمه‌کیمان بکهن و پیکه‌وه به گز تورکه‌کاندا بچین، به لام هیج کاتیک نه‌مان توانيوه ئه و پیشناوار انیمان بئرخینین" (۲) .

بی‌گومان سرچاوه و بله‌گمی وا گله‌یکن و ده‌بی‌ئه و شه‌شمان بیر نهچی که له هه‌موو قونا غیکدا سیاسه‌تى رووسیا به‌رامبر به کورد وهک يهك نصبوون، يان باشترا وایه بیزین که هله‌لویستى رووسیا له‌گمل کوردا گری درابو به لاوازی و به هیزی ده‌ولهتى و سمانی‌یمه، که له رووه‌شه وه دیپل‌وماسی‌یه‌کانی خوشیان پی‌یان لی ده‌مان و ده‌یانگوت "هر کاتیک شمر له دوازی قه‌فاسه‌وه هله‌گیرسایه، ئیممه (مهمستى له رووسیا) - لک، ع) بايەخ مان زیاتر به کورده‌کان دهدا" (۸) .

جگه له‌وه رووسیا ده‌یویست ده‌سه لاتی خوی له کوردستاندا به چه‌شنیکی دیکه‌ش قایم بکات، بو وینه : جموجولی وو لاته ئه‌وروپایی‌یه‌کان (ئینگلتەرەو فەرمنسا) و پاشانیش ئەلمانیا له رۆزه‌ه لاتی نزیکدا بیووه‌هه‌یه که رووسه‌کانیش بکهونه خویان و له بەرهه‌می ئه و ناوچه‌یه و چوسا ندن‌هه‌یه می‌لله‌تە - کانی بی‌بەش نەبن، که له راستیشدا رووسیا مافی خوی بولو بایه‌خیکی تایبەتی به ناوچه‌کانی پشت قه‌فاس و تورکیا و ئیران برات، که گرنگترین ناوچه‌کانی دیکه بونو. جا لم میدان‌مدا می‌لله‌تە‌کانی بن ده‌ستى ده‌لەتى و سمانی و قاجاری باشترين چەکى ده‌ستيان بونو که له رئیانه‌وه مەرام و بەرژه‌هندی خو - يان به ده‌ست بیزین، بی‌گومان کورد وهک نه‌تە‌وه‌یه کى به ژماره فرەو به هیزۇ تووانا چاکترينيان بولو که بیکەنە دارده‌ستى خویان و به ئەنجام دانی ئەم کارەش كەوتوبووه ئەستنۇ دیپل‌وماسی‌یه‌کانیان: جا بو به - هیز کردن و چەسپاندنی ده‌سە لاتیان ژماره‌یه ک قونسولخانە دیکەشیان له کوردستاندا کرده‌وه، که يهك له‌وانه له ناوچه‌ی خەربیوت بولو، ئەویش بو مەبەستى به هیز کردنی پیو‌ندیان له‌گمل کورده‌کانی دەرسیم دا (کورده‌کانی ئەم نیچەیه به قېرسچەم نیوبانگیان رۆیشتبولو، و هەر وا به ئاسانی سەریان بۇ بیانی نەوی نه دەکردد) و کەم کردن‌هه‌یه ده‌سە لاتی فەرمنساو ئینگلتەرەو ئەلمانیا . له هەمان کاتدا ئەم هله‌لویستە رووسیا بۇ مسوگەر کردنی را وەستانی ئە و شەرەش بولو که له میزه‌وه تورکیا به نیاز بول دزی رووسیا هله‌گیرسینى.

بۇ بەرده‌وام دانی ئە و سیاسەته، رووسیا پلانیکی دیکەشى ساز کردىبو بۇ ئەوه‌ی کورد به تەواوى مەتمانە - يان پى بکات و تەنگ به جموجولی مسیونییرە رۆزئاوايی‌یه‌کانیش له ناوچە‌کەدا هله‌بچنى، ئەویش بایه - خ دانی بولو به مەسەلەی کولتوورى و روشنبىرى له کوردستاندا . له رووه‌وه ئۆلۈغىریش بە ئاشكرا دەیگ - ووت " دەبیت زۆر بە گەرمى کارىکى کولتوورى فراوان له ئەرمىنیا و کوردستاندا بکەن، کە ئەمەش كا - رىكى گرنگ دەبیت بۇ گورپىنى بىروراي میلله‌تەنلى رۆزه‌لات بەرامبەر به رووسیا" (۹) .

بۇ پىتى ئاسان کردن و به ئەنجام دانی ئە و پلانه، رووسەکان ئە و دەرفەتەشيان قۇزىتمە دەنديك له سەر - کرده‌کانى کورد، بە تاييەتى عميدول رەزاق بەدرخان کە دەمیك بولو هەولى دەدا بە يارمەتى رووسیا مەلبەندىكى کولتوورى کوردى دابمەزرى و نووسىنى کوردى بە پىتى عاربى بکرىپتە رووسى و رۆزئامەو چاپخانە و قوتابخانە کوردى له کوردستاندا بکرپەوه، (لە ئەنجامىشدا يەكم قوتابخانە کوردى لە شارى خوی بە پىتى رووسى کرايە‌وه و زمان و ئەمەبى رووسىشى تىدا دەخويىندر).

ئەم جموجولەی رووسیا له کوردستاندا ببۇوه نارەحەت کردنى تورکە‌کان و له هەمان کاتدا كوسپىكى گەو - رەشى لە كاروبارى مسیونییرە رۆزئاوايی‌یه‌کاندا ، بە تاييەتى ئەلمانە‌کان درووست کردىبو، هەر بۇیەش بۇ بەرپىچ دانەوه‌ی ئە و هله‌لویستە، قونسولى ئەلمانیا له شارى موسىل "ھۆلۈشتاين" كەوتە خویي و پە - يمانى دا كە ژمارە‌یه ک لە لازى كورد بۇ خۇيىندىن بىنيرىتە ئەلمانیا و تەنانمت له قوتابخانە مسیونى - رەكانى خوشياندا له شارى وان کورد وەربىگىرپىن دياره ئەلمانە‌کان هەستيان بەوه کردىبو، گەر شت

- سیاست قمیسهریش له ممهله‌ی کوردا راکیشاوه به لام تاکو نئیستا کاریکی تیروت‌هسل گمر سهباره‌ت به پیوه‌ندی کوردو رووسیا له سه‌هتای سده‌ی بیسته‌مدا کرابیت شوا له لایهن مس. لازمیف" (۳) هومیه، که نهک شو کاره‌ی و هک سه‌چاره‌یه‌کی هیزا که‌لکی لی و مرده‌گیری، به‌لکو له روانگمیه‌کی باهه‌تانه‌ی زا - نستانه‌شهوه سیاستی ئیمپراتوریه‌تی رووسیای بمرا‌مبهر به کورد کولیوه‌تموه. جگه لهوه کاریکی دیکه‌ش که لهو سه‌دهمه‌دا کرابیت له لایهن پ. مئی تیرمین" (۴) هوه ببووه که همرچی تاموبه‌رامه‌ی کاری زانستانه بی تییدا بهدی ناکری. جگه لهوه له چمند شوینیکی دیشدا تمنبا سه‌پی‌یی پیوه‌ندی نیوان کیز - ردو رووس له ده سالمی سده‌ی بیسته‌مدا له چاپه‌مه‌نی و بلاوکراوه کوردی و بیانی‌یه‌کاندا بمرچاو ده - کمون.

مهبه‌ست لم ووتاره چمند رووپه‌لی‌یه‌ی ئیمه‌تمنبا وده‌رخستن و دهست نیشان‌کردنی کورته‌مه‌کنی سیاستی شو سه‌دهمه‌ی رووسیایه بمرا‌مبهر به کورد، که پاش شورشی ئوکتوبه‌ری ۱۹۱۷ له لایهن میزرو و نووسان و نووسمرانی خویانه‌وه که‌موزو و چاکوخراب هله‌لویست و سیاستی ئیمپراتوریه‌تی رووسیایا - ن به گشتی کولیوه‌ته‌وه و ئه‌ویشی پیوه‌ندی به کورده‌وه هه‌بوبیت شوا ههر و هک گوتمان، جگه له کاره به نرخه‌که‌ی لازه‌ریف تاقو لوق له شوینی دیشدا له چاپه‌مه‌نی‌یه‌کانی سوْقیتی دا بمرچاو ده‌که‌ون. بهر لهوه‌ی بچینه نیو باهه‌تکه‌وه، به پیوستمان زانی که همندیک لهو هویانه‌ش و به‌رچاو خه - بین که پالی به رووسیاوه نا بو خو نزیک کردن‌وه له‌گه‌ل کورد دا، تا به باشی بکارین سیاستی سه‌هتای سده‌ی بیسته‌می ته‌زاره‌کانی رووس بمرا‌مبهر به کورد هله‌لسنگینیین.

ده‌توانین بیزین که بایه‌خ دانی رووسیای قمیسهری به کورد بهر له دوو سه‌دهمه‌ک دهستی بی کرد - ووه و به شیوه‌یه‌کی درووست تر له سه‌هتای سده‌ی نوزده‌دا، که رووسیا ده‌بیویست هیزی چه‌کداری و شه - رکمری هوزه‌کانی کورد بی ممه‌ستیکی ستراتیزی و سوپایی خوی دزی ده‌لمتی و سمانی به‌کاریکی" (۵). به‌تاپه‌تی پاش لکاندنی گورجستان و رۆزه‌هه لاتی ئەرمینیا و سه‌رووی ئازربایجان به رووسیاوه، واته شو و و لاتانه‌ی سه‌ن سوری تورکیا و دراوی کوردستان، که ئەمەش کاریکی وا کرددبوو چاره‌نووسی شه و میللەتانه به یه‌کدی‌یه‌وه گری بدریت، به تایبەتی لهو سه‌دهمه‌دا به‌یه‌کدادانی رووسیا و ئیران و تورکیا و یارمەتی دان و پشتگیری کردنی سوپایی رووس له لایهن کورده‌وه (سەلیم پاشا و بەلول پاشای بایمزید و ئەمین پاشای موش به ئاشکرا هاواکاری سوپایی رووسیان ده‌کرد، به لام میرنشنینه‌کانی هەکاری و خوارووی کوردستان هله‌لویستیکی بی لایمنیان هه‌بwoo) هویه‌کی دی خو نزیک کردن‌وه رووسه‌کان ببو له کورد له سو کاتەش به دواوه هەندیک له زاناكانی رووسیا وهک : خ. ئابو‌قیان و ف. دیتیل و ئی. بی‌ریزین و ۰۰۰ هتد. دەستیان کرده لیکولینه‌وه ممهله‌ی کورد و هک میللەتیکی تایبەتی له رۆزه‌هه لاتی نزیک و نیووه - راست داوه هەر بھو جوره‌ش سه‌هتای کوردناسی له رووسیا رەگی خوی داکوتا (۶).

ھویه‌کی دیکه‌ی بایه‌خ دانی رووسیا به کورد، ئەنجامی ئالۆزبۇونى شو باروودو خه ببو له رۆزه‌هه لاتی نز - يك و ناوجەکانی بەلقان و بۆمباران کردنی ده‌منیلی تورکیا له لایهن ئیتالیاوه، که ئەمەش ببورو لهو - پتر تیکچوون و ئالۆزبۇونى پیوه‌ندی نیوان رووس و تورک.

له لایه‌کی دیکه‌شوه کورد بی خوی ده‌بیویست سوود لهو دژایتی‌یه‌ی نیوان رووسیا ده‌لمتی و سمانی و قاجاری و هر بگری شان به شانی شووهش کورد، ده‌بیویست بیوونی پیوه‌ندی‌یه‌کی ستراتیز - لەگەل رووسیای هاویی دا هەولی دەمدا، به لام ئەم جوره بېرکردن‌وه‌یه کورد به میشکی رووسه‌کان دا نه دەچوو، " له هەموو شەرەکانماندا له بەرمە قەفقاس لەگەل تورکیادا - ئەفریانوو دەبیزى - بەردە

میزونهی نیوان کورد و رو سیا له سه منای سه و هی بیستم فلا

الممالع

بمشی یمهکم

هر له کوتهوه وو لاتانی نزیک و نیوه راستی روزهه لات جی سه رنجی زل هیزه کان (ئینگلتزم و ئیتالیا و فرنسا و رو سیا و ئەلمانیا) ئەو سەردەم بۇون، كە له سەرتاوه له رئی گەرۆكە کانیانه وو له سەدەن نۆزدەمە میشدا له رئی دیپلۆما سی يەکانیانه وە خەریکی لیکۆلینەمە بارودۇخى ژیانیان بۇون و نەخشەو پیلانی داگیرکەرانیان بۇ داناون و بى ویزدانانه چەواندویاننەمە وە یاریان بە چارەنوسس - بان کردو وە پاشانیش بى پەروا نیشتیمانە كەمیان دابەشی نیوان خۇپان كردو وە

بى گومان گرنگى ناوچەكە له رووی سیاسى و ئابورىيەمە ھۆيەكى گەورە بۇون تا رۇز بە رۇز تەمامى تى بکەن و بىکەنە شانۆيەكى تاقى كەردنەمە ھۆيە چەكى كوشندەيان و تا ئیمرۆش ئەو سیاسەتمەيان ھەر بە - رەۋامە گرنگى كوردىستانىش له رووی جوگرافىيەمە چى تر بايەخى لەو وو لاتانەدی كەمتر نەبۇ - وە، و بىگە بە پېچەوانە وەك ناوچەيەكى ستراتىزى كە روزهه لات بە ئەموروپا وە گرى دەدات پتر له ھەر شۆينىكى دى ببۇوه مەلبەندى رەڭدا كوتانى بەرژە وەندى ئەو وو لاتانە وە بىمەكدا دانیان بە درېزايى ھەمۇ ئەو قۇناغە .

جا كورد لەگەل ھەر يەكىك لەو وو لاتانەدا مىژو وەيەكى تايىبەتى ھەمە، كە تا ئىستا وەك پېيۈست لىنى نەكۆلرا وەتەمە، ھەرچەندە لەگەل يەك شۆيندا بە تايىبەتى سیاسەتى داگیرکەرانە ئینگلیز لە كوردىستان دا بەرچا و دەكەون، بە لام ئەوانە تا ئىستا كارى سەرپىسىو لا وەكى بۇون، لەگەل شەوهەشدا ئۆمىد زۆرە كە لە لايەن كورد خۆيەوە لیکۆلینەمە كى با بهتانە خەستو خۇل لەو بارەوە بە بەرھەم بىت .

جا مەسەلەي كوردو روو سیاش وەك ھەمان ئەو وو لاتانە دى بايەخى خۇي ھەمە بىگە كەلەك پتريش، چو - نكە دراوسىيەتى روو سیا و كوردىستان ج وەك دوو ناوچەي جوگرافى و چوھەك دوو مىللەت ھەروا شەتىكى دەستكىرده نىمە بۇ خۇي مىژو وەيەكى تايىبەتى لە پېيۇندى نیوانياندا درووست دەكتات، كە پېيۈس - تى بە سەرنج و توپىزىنەمە .

سەبارەت بە مىژو وى نەتەمە كوردو پېيۇندى بە روو سیا وە لە سەدەن نۆزدەدا تا رادەمە كى باش لە لايەن پ. ئەققىرانوڤ^(۱) ھە نوو سرا وە تاكو ئیمروش بە سەرچا وەيەكى دەولەمەندو بايەخ دارى ئەو سەردەمە دەز مېرىدرى . ھەر سەبارەت بە قۇناغە مىژو وى بى ھەنگەمە لیکۆلینەمە شۇرە كانى كوردو سیاسەتى دەولەتى و سەمانى لە لايەن د. جەلىلى جەلىل^(۲) ھە نوو سراون كە لا وە كىش پەنچەي بۇ سیاسەتى روو

چوارچرا

گەلاویزى / ۱۹۸۶

خاوندى : پروژەى كوردى يە

خويىنمرانى بەرىز

سەرەتا داواى لى بوردنستان

لى دەكەين لە دواكە ئىتنى ئەم

زمارەيەمان . بەلام هەروەك سۆ

- زمان پىداون تا كۆتايى ئەم

سال ھەر شەش زمارەكە چوا

- رچرا بەبەرھەم دېنىن .

دەستەي نووسەران سوپاسى

ئەو براو مەلبەندە كوردىيانە

دەكەت كە سوپاسنامەيان نارد

سووه ئىمەش داواى سەركە

تن و سەرفرازىيان بۇ دەكە

- يەن .

چوارچرا جارىكى دىش دا .

واتان لى دەكەت كە ھەرچى

بەرھەمەيکى فولكلۇرى و هو .

نەرى تان لا دەست دەكمەۋى بۇ

- مان بنىئىن لەكەل سوپاسى

پىشەكىمان دا .

دەستەي نووسەران

چوارچرا

گەلاویزى / ۱۹۸۶

خاوندى : پروژەى كوردى يە

بە درېزايى سالى ۱۹۸۶ ، شەش زمارە لى دەردەچى .

نرخى : ۱۵ كرۇنە ، ۶ ماركە بۇ دەرەوه .

ئابۇونە : ۸۰ كرۇنە لە ناو سويد دا ، ۳۲ ماركە بۇ دەرەوه .

زمارەي بانك : ۱۶۵۶ - ۴

بەرپەسيار : فەردا تۈران .

دەستەي نووسەران: جەمىتىد حىدىمەرى، كەمال عەلى، مالەمىسانىز

دەرھىنائى ھۇنەرەرى : قەزرىن .

چاپ : ئىنتەم ئۆقىتىت .

وېنەي گۇۋارەكە : ھونەرمەندان: بەسى و ئەفتۇن .

ناومۇرۇك

كەرمانچى خواروو :

پىۋەندى نىوان كوردو رووسيا لە سەرەتاي سىدەي بىستەمدا ۵۲ .

چىرۇكى زمارە ۴۳ .

مەحەممەد عەلى كوردى و چىرۇكى دواى سەرخۇشى شىتىي يە ۴۱ .

باچىچە شاعيران ۳۹ .

بارى زيان و كولتۇورى كوردى گورجستانى سۆقىت .

ھەنگاوىكى پراكىتكانە بەرھە زمانى يەكگەرتۇو .

كۇرته مىزۇوبىيەكى كوردناسى لە ئەلمانيا دا ۲۲ .

كەرمانچى ۋۇرۇو :

خەريتا مەحمودى قاشكارى و وەلاتى كوردان .

چەند سترانىن شىخ بزىنبىيان ۲ .

گەرگەرينۈك ئان سوارى بە تەننى ۵ .

عەبدول رەھمان بەگى ساحىقىران (سالم) ۹ .

روژنامەگەرىيە كوردى لە كوردىستا نا باكورو لە تۈركىيا ۱۱ .

چەند وېنەيەكى بەسى و ئەفتۇن ۲۲-۲۶ .

پارس

گوئارنیکی، کولتوری، گشتی یه

گلادوئری ۱۹۸۶

سال ۱

ژماره ۳

